

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
MAKEZANÎSTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



DI XEZELÊN WEFAYÎ YÊN KURDÎ DE RENGVEDANA
TAYBETMENDÎYÊN SEBKA IRAQÎ

LÎSANS A BILIND

AMADEKAR

Ameer Nasih AHMED

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr. Kemal EROL

VAN – 2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

WEFAYİ'NİN KÜRTÇE GAZELLERİNDE IRAK STİLİNİN
ÖZELLİKLERİNİN YANSIMALARI

YÜKSEK LİSANS

HAZIRLAYAN

Ameer Nasih AHMED

DANIŞMAN

Doç. Dr. Kemal EROL

VAN – 2019



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Kemal EROL danışmanlığında, Ameer Nasih Ahmed AHMED tarafından hazırlanan “Rengvedana Taybetmendiyên Sebka Îraqî Di Xezelên Kurdî Yê Wefayî De” adlı bu çalışma, 09/09/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Kemal EROL

İmza: 

ÜYE : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr.Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza: 

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.


09/2019
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ
Enstitü Müdür Vekili

NAVEROK

KURTE	V
ÖZET.....	VI
ABSTRACT	VII
SPASÎ	VIII
PÊŞGOTIN	IX
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEM

SEBKA IRAQÎ

1.1. Serhildana Sebka Iraqî.....	5
1.2. Sedemên Guherîna Sebka Xorasanî Bo Sebka Iraqî.....	7
1.4. Taybetmendiyên Sebka Iraqî.....	13
1.4.1. Di Warê Zimanê Detaybetmendiyên Sebka Iraqî.....	14
1.4.2. Di Warê Fikrî De Taybetmendiyên Sebka Iraqî.....	19
1.4.3. Di Warê Edebî De Taybetmendiyên Sebka Iraqî.....	26

BEŞA DUYEM

MÎRZA EBDURREHÎM (WEFAYÎ)

2.1. Jîyan Wefayî.....	33
2.2. Bernavkên (Mexlesên) Wefayî.....	34
2.3. Berhem û Nivîsarên Wî	34
2.4. Perwerdehîya Wefayî.....	35
2.4. Cihê Wî Di Helbesta Klasîka Kurdî De	37

BEŞA SÊYEM

SEBKA IRAQÎ DI XEZELÊN KURDÎ YÊN WEFAYÎ DE

3.1. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Taybetmendiyên Ziman	40
3.1.1. Di Asta Peyv û Risteyê De Zimanê Xezelên Wefayî.....	40
3.1.2. Nermenezikîya Xezelên Wefayî	41

3.1.3. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Derketina Têgînên Zanistî	42
3.2. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Taybetmendîyên Fikrî.....	46
3.2.1. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Îrfan	46
3.2.1.1. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Fikra Îrfanî.....	48
3.2.1.2. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Têgînên Meqam û Hal.....	51
3.2.1.2.1. Oldarî-Dîndarî (Zuhd).....	52
3.2.1.2.2. Bihev Şadbûn (Wesil).....	52
3.2.1.2.3. Bênfirêhî (Sebr)	53
3.2.1.2.4. Hişyarî (Hezer)	54
3.2.1.2.5. Bedewî (Husn - Cemal)	54
3.2.1.2.6. Bêkêmasî (Kemal)	55
3.2.1.2.7. Coş û Xweruş (Wecd)	55
3.2.1.2.8. Derûn (Nefs).....	56
3.2.1.2.9. Balkêşê (Cezbe)	57
3.2.1.2.10. Tirs (Xewf)	57
3.2.2. Pesindana Pêxember	58
3.2.3. Pesindana Şêx Ubeydulahê Nehrî.....	60
3.2.4. Xemgînî	62
3.2.5. Bêhêvîfî.....	63
3.2.6. Rexnekirina Li Sofîyan	64
3.2.7. Vegera Helbestkar Bo Derûna Xwe.....	65
3.2.8. Esîrbûna Me'suq	66
3.2.9. Aşiq Di Bin Lingê Yarê De	67
3.2.10. Me'suq Di Asta Lehengê Nav Dastanan De	67
3.3. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Taybetmendîyên Edebî	69
3.3.1. Xezel	69
3.3.1.1. Taybetmendîyên Xezela Sebka Iraqî Li Cem Wefayî.....	70
3.3.1.1.1. Nasnav (Texelus)	71
3.3.1.1.2. Redîf	72
3.3.1.2. Kêş	72
3.3.1.2.1. Kêşa Hezece	73
3.3.1.2.2. Kêşa Remel	75

3.3.1.2.3. Kêşa Recez	77
3.3.1.2.4. Kêşa Muzarî`	78
3.3.1.2.5. Kêşa Serî`	79
3.3.1.2.6. Kêşa Besît.....	79
3.3.1.2.7. Kêşa Muctes	80
3.3.2. Di Xezelên Kurdî Yê Wefayî De Hunerên Rewanbêjîyê	82
3.3.2.1. Rohnbêjî (Beyan).....	82
3.3.2.1.1. Hevrenkirin- Wekandin- Mînandin (Teşbîh).....	82
3.3.2.1.2. Xwaza (Mecaz)	84
3.3.2.1.3. Xwastin (Îstîfare).....	85
3.3.2.1.4. Dirke (Kînaye)	86
3.3.2.2. Ciwankarî (Bedî`).....	87
3.3.2.2.1. Hevherf- Regezdozî (Cînas).....	87
3.3.2.2.2. Anîna (Redu'l Aciz ala Sedir)	89
3.3.2.2.3. Dubarekirin (Tekrar)	90
3.3.2.2.4. Têkhilkêş (Tezmîn).....	90
3.3.2.2.5. Cotserwa.....	91
3.3.2.2.6. Rexnekirin-Kertkirin (Teştîrî).....	92
3.3.2.3. Ciwankarêyên Wateyîyên Xezelên Wefayî.....	93
3.3.2.3.1.1. Dijhevîya Ferhengî (Tîbaq el-Îcab)	93
3.3.2.3.1.2. Dijhevîya Naferhengî (Tîbaq el-Selb).....	94
3.3.2.3.2. Beramberî (Muqabelet)	94
3.3.2.3.3. Pêçan û Vekirin (Lef û Neşir)	95
3.3.2.3.4. Xweşbahane (Husnu Tehlîl)	96
3.3.2.3.5. Zêdekirin- Zêderewî (Mubalexe)	97
3.3.2.3.6. Nezanîya Bizanîn (Tecahu'l el-Me`arif).....	98
3.3.2.3.7. Vegêran (Terdîdu).....	98
3.3.2.3.8. Pêncîn	99
3.3.2.3.9. Lêkkirin (Tefrîqa)	100
3.3.2.3.10. Pêkve Guncan (Mura`at el-Nezîr)	100
3.3.2.3.11. Mulemme`i (Mulemeh)	101
3.3.2.3.12. Cihguherîn (Eks)	102

3.3.2.3.13. Bibîranîn/Têlnîşan (Telmîh).....	102
3.3.2.3.14. Rohnvekirin- Şîrovekirin (Tefsîr).....	103
ENCAM.....	105
ÇAVKANÎ.....	108



(Lîsansa Bilind)

Ameer Nasih AHMED

ZANÎNGEHA WAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ÎLON- 2019

DI XEZELÊN WEFAYÎ YÊN KURDÎ DE RENGVEDANA
TAYBETMENDÎYÊN SEBKA IRAQÎ

KURTE

Sebka edeba Farsî, xwedîyê dîrokeke dirêj û qedîme. Bi şaristanî û wêjeya Farsî re derketîye meydanê, bi şeweyekî sîstematîk şopandina berhemên zansitê din bi serdema modern re pêk hatîye. Belavbûna wê ya berfirehîya bi sebka xweyê taybet rasterast bi têkildariya derdora xwe çêbûye. Sebka Iraqê jî bi derketina hêzên dijberê qonaxên dîrokî re berê xwe daye Îranê. Tevlîhevîyên sîyasî û tevlîhevîyên din yê herêmê bûye sedem ku ev sebk ji holê rabe. Sebkên din yê nû derketin bi awayekî xurt ji aliyê helbestkarên navdeng ve hatîye şopandin. Hêma û babetên ku di helbestên her serdemê de hatine bikaranîn û di dibistanên edebîyên Farsî de rengvedane, peywendîya vê mercên sîyasîyê serdemê ve heye. Sebka Iraqê jî her wek ya dibistanên edebîyên Farsî, rengvedane girêdayî mercên sîyasî yê serdemê yê li herêmê bû. Babet û hêmayên di vê sebkê de digel mercên ne li bendêyên Îranê qewmîn re guherîn dibe sedem ku guherîn di helbesta Iraqê de jî çêbe û bandoreke berbiçav li ser helbest û wêjeya helbesta klasîk a Kurd jê çêke, bi taybet li ser Wefayî. Wefayî jî hunerê xwe ew taybetmendîyên ku di nav helbest û wêjeya Farsî de hene bi awayekî serkeftî di helbesta xwe de bikaranîne. Di vê lêkolînê de hewildaneke me wisa heye ku em taybetmendîyên berbiçavên di helbesta Iraqê de derketine pêş û di xezelên Wefayî de reng vedane raxin ber çavan.

Peyvên Sereke: Sebka, Wefayî, Xezel, Îrfan, Qafîye

Hejmara Rûpelan: 112

Şewirmendê Tezê: Doç. Dr. Kemal EROL

(Yüksek Lisans)

Ameer Nasih AHMED

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Eylül-2019

WEFAYÎ'NİN KÜRTÇE GAZELLERİNDE IRAK STİLİNİN
ÖZELLİKLERİNİN YANSIMALARI

ÖZET

Farsça edebîyat üslubunun, özellikle şiirinin eski bir tarihi vardır; ortaya çıkışı Pers uygarlığının ve edebiyatının gelişmesine dayanmaktadır. Bununla birlikte, söyleyiş tarzı, modern bilimlere kadar sistematik ve bilimsel bir şekilde gözlemlenmemiş, diğer bilimlerle olan yakın ilişkisi nedeniyle en popüler bilimlerden biri haline gelmiştir. Bu nedenle, şiirde Irak tarzı, İran'da ortaya çıkan tarzın aşamalarından biri olarak tanımlanabilir. Bunun sebebi, o zamanlar bölgedeki politikacıların ve çatışmaların edebi söyleyişte bir tarzın sona ermesi ve diğerinin ortaya çıkmasına neden olması idi. Eskiden farklı olarak ortaya çıkan bu yeni tarzın çıkışı, o zamanlar ünlü şairler tarafından kullanılmıştır. Bu nedenle, Farsça literatürde, her bir evrenin şiiri, zamanının koşullarını yansıtmaktadır. Fars edebiyatının okullarından biri olan Irak tarzı, döneminin politik durumunu ortaya koymakta, başka bir deyişle, İran'daki ve bölgedeki politik durumu yansıtmaktadır.

Sonuç olarak bu durum, şiiri etkilemiştir. Lirik şiir, döneminin popüler şiir şekli haline gelmiştir. Böylece bu değişiklikler Fars dilini ve edebiyatını da etkilemiştir. Bu kapsamda, Fars edebiyat ve şairlerinden etkilenen klasik Kürt şairlerinden biri de Wefayî'dir. Onun şiirlerinde fark edilebileceği gibi söz konusu sebki-ı Irakî (Irak tarzı) etkilerinin bir özetidir. Bu tez, Wefayî'nin şiirlerinde yeni görülen Irak stilinin özelliklerini ortaya koymayı amaçlamaktadır.

Anahtar Kelimeler: Stil (Tarz), Wefayî, Gazel, İrfan, Kafiye.

Sayfa Sayısı: 112

Tez Danışmanı: Doç. Dr. Kemal EROL

(M.Sc. Thesis)

Ameer Nasih AMEER

VAN YUZUNCU YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES

SEPTEMBER-2019

**REFLECOF IRAKI STYLE CHARACTERISTICS IN WAFAYÎ'S KURDISH
GHAZAL**

ABSTRACT

The Style of Persian literature, especially of its poetry, has an ancient history; its emergence dates back to the development of Persian civilization and literature. However, Style had not been observed in a systematic and scientific manner until modern times, in which it became one of the most popular sciences due to its close connection with other sciences. Therefore, Iraqi style can be identified as one of the phases of style that appeared in Îran. This is due to the fact that the then politicians and the conflict in the region resulted in ending one Style and giving rise to another. The appearance of any other Style was employed by the then renowned poets; therefore, in Persian literature the poetry of each phase reflects the circumstances of its time. Iraqi Style as one of the schools of Persian literature reveals the political situation of its period. In other words, it reflects the political situation in Îran as well as the region. Consequently, the situation affected poetry; lyric became the popular form of poetry of its period. Thus, these changes affected the Persian language and literature. The Kurdish classic poets, especially Wafaye, were influenced by Persian poets and literature. Wefayî is an epitome of such influences as it can be noticed in his poetry. This thesis aims to reveal the characteristics of Iraqi Style in Wefayî'lyrics.

Key words: Style, Wefayî, Ghazal, Irfan, Ryhme

Quantity of Page: 112

Supervisor: Doç. Dr. Kemal EROL

SPASÎ

Di dawîyê de dixwazim bêjim spasîyên xwe yê taybet pêşkeşî serpereştê nameya xwe birêz Doç. Dr. Kemal EROL ra bikim ku serpereştîya vê lêkolînê girtîye ser xwe. Herweha spasîyên xwe pêşkeşî mamoste û seroktîya beşa Kurdî Zanîngeha Yüzüncü Yil bikim ku di heya du sal ê xwandinê de alîkarîya mayîna min û jibo pêşxistina ziman û wêjeya Kurdî kirin û hevkarîya min kirin.

Herweha gelek spasîyên xwe ji birêz mamoste Mela Reşad dikim ku jibo hewldan û wergerandina çavkanîyên Farsî û ‘Erebî ku jibo min xwe westand. Spasîyên xwe raberî mamoste Kazim Şêx û Çawerrê Nî'met û Aram Ehmed dikim ku gelek alîkarîya min kirine ji bo bidesxistina çavkanîyan.

Dîsan spasîya pirtûkxaneya Koleja Perwerdehî ya Zanîngeha Soran dikim ku alîkarîyeke baş ji bo dayîna çavkanîyên pêwîst bi min re kirine.

Di dawîyê de spasîya dê û bavên xwe û hemû wan kesan dikim ku bi her awayekî be di pêvajoya amadekirina name ya min alîkarîya min kirine dikim.

Ameer Nasih AHMED

2019 - VAN

PÊŞGOTIN

Ev lêkolîn ku li jêr navnîşana “Di Xezelên Wefayî Yên Kurdî De Rengvedana Taybetmendîyên Sebka Iraqî” hewildaneke ji bo nîşandan û raxistina çemk û têgîna sebk û taybetmendîyên sebka Iraqî di xezelên Kurdî yên Wefayî de. Ev jî xwe spartina “Têoriya Wesfî û Şerovekirine” ye, li ser bingehê ku lêkolîna me ji sê beşên serekî pêk tê. Bi curekê ku beşa yekê de teorî û dû beşên din ji praktîkî pêk hatîye. Di beşa yekê de bi şêweyekî wesfî me babet anîye pêş çavan û di beşa duyem û sêyem de jî me hewl daye li ser jîyana Wefayî û xezelên Kurdî yên Wefayî bi piranî praktîzeyên taybetmendîya sebka Iraqî bikin.

Naveroka vê lêkolînê ji pêşgotin, destpêk, sê beşên serekî, encam û lîsta çavkanîyan pêk hatîye. Di beşa yekê de bi piranî li ser sebka Iraqî û têgeh û têrmên sebka Iraqê bi cureka puxt û rewan raxsitîye ber çavan.

Di beşa yekê de, tevî amaje pêkirina li ser wan şert û mercên ku bûne sedema guhertîna sebka Xoresanî ber bi sebka Iraqî ve, me behsa serhildana sebka Iraqî kirîye. Di dawîyê de sîmayên cuda yên di navbera sebka Xorasanî û sebka Iraqî de di qonaxa vê serhildanê de wek lîste û zelalkirî me raxist berçavan.

Di dawîyê de me bal kişandîye ser hemû wan babet û taybetmendîyên sebka Iraqê ji alîyê "ziman, hizir û edebî" ve ku di heyama serhildanê de ketine nav helbesta vê qonaxê.

Beşa duyem taybet ji bo helbestên Wefayî hatîye veqandin. Di destpêkê de bi awayekî hûrgulî li ser nav û sala jidayîkbûn û koça dawîya helbestkar û mexlesa ku di helbesta xwe de bikaranîye.

Di beşa sêyemê de bi şêweka giştî em piratîzekirina taybetmendîyên sebka Iraqî di xezelên Kurdî yên Wefayî de dixine ber çavan, di destpêke de taybetmendîyên zimanî û derketina sîma û taybetmendîyên herî girîng ên ziman vê sebkê di xezelên Kurdî yên Wefayî de hatîye şîrovekirin, piştî bi şêweyekî giştî taybetmendîya fikrî û rengvedana babetên pêş çav ê di nav sebka Iraqî de di xezelên Kurdî yên Wefayî de raxistine pêş çavan. Di dawîya vê beşê de me amaje bi derketina taybetmendîyên edebî yên vê sebkê ji ya ji alîyê Wefayî ve hatîyekirin xuyandîye ku ew bi xwe, xwe di bikaranîna nasnav, paşserwa û giringîdana hunerên rewanbêjîyê de dibîne, bi berçavxistin a mînakên pêwîst ji her yek van

taybetmendîyan. Di dawîyê de bi şêweyekî kurt me encama lêkolîna xwe raxistîye pêş çavan tevî listeya çavkanîyan.

Di vê lêkolînê de “Di Xezelên Wefayî Yên Kurdî De Rengvedena Taybetmendîyên Sebka Iraqî” her çi qasî hewildaneke biçûk be jî di derbarê sebka Iraqî di xezelên Kurdî yên Wefayî de, lê tevî vê jî dibe destpêkeke baş tabet ji bo xizmeta helbest û wêjeya Kurdî û hê taybettir ji bo Wefayî. Ji ber ku aşkeraye ku taybetmendîyên sebkên helbesta Farsî û ji wan jî sebka Iraqî ji alîyê piranîya helbestkarên helbesta Kurdî ya klasîkî ve girîngî hatîye dayîn û di helbestên wan de jî rengê xwe vedaye. Ji ber wê li gorî pêwîstî û karîne me hewldaye bi rêya vê lêkolînê ve girîngî û nirxa sebka Iraqî û peyrewîkirina taybetmendîyên vê sebkê ji alîyê Wefayî ve raxine ber çavan ku heta niha lêkolîneke zanistî û hewildaneke pir kêr hatîye dayîn ji bo daxwuyandina babetên bi vî awayî.

DESTPÊK

Zaraveya sebkê bi awayekî bêhempa tê cudakirin ji mijarên din ên edebî, bi vî rengî ku eva rasterast pêwendîya wê heye bi wê sebka edebî ku helbestvan yan nivîskarek di nivîsên xwe de berçav digire ku ew cudahî jî bûye sedem ku destewajeya sebk bo piraniya bîyavên din wekî musîqa, wênekêşî û peykertaşî hwd tê bikaranîn. Lewra hekî em bixwazin bi awayekî hûr li destewajeya sebk binihêrin û ronahîyê bixin ser hemû wan bîyavên ku girêdayîne bi destepeyvê. Eva em dibînin ku di hemû bîyavên rojane û bîyavên hunerî de bi awayekî bikarhatine ku heya gihaye vê astê ku ew destepeyv bûye destepeyveke nû ya di nava biwarê jîyana mirova heyî de.

Yek bûye sedema vê ku sebk di warê giştî de ku edebîyat e, komeke boçûnên cuda li ser peyda bibin, şêwaza cuda ya destepeyva sebk jî di bîyavên cuda de wisa kirîye ku beşeke zêde ji nivîskaran û lêkoleran, boçûnên wan ên cuda hebin li ser bikaranîna sebkê û bi vî rengî jî çendîn zarava û têgehên curbicur bi xwe ve bigre. Bikaranîna destepeyva sebk bo yekem car vedigere bo Rojavayîyan û koka vê peyvê jî peyva “Stylus a Latîni ye û wateya wê cureya alavê dide ku ji bo nivîsandin û hilkolîna li ser textê momê dihate bikaranîn” (Şe`iban Şe`iban Ehmed, 2002: 16), bi vê wateyê “Lêkoler di bîyavê nivîsînê de, bi vê manayê tê ku rêyek ji bo nivîsîn û nivîserî ku di pêxema mebesta xwe ya edebîyatê bi kar tîne” (Bîr Cîro, 1994: 9). Herweha çavkanî qala vê yekê dikin ku ew peyv tê wateya “Pênûsa hesinîn ku Latîniyan wekî hezkirinek ji bo wateya hilkolîn yan şêweya nivîsandinê bi kar anîne” (Pexşan Elî Ehmed, 2009: 13).

Ferhengên Înilîzî jî qala vê çendê dikin ku ew destepeyv a sebk bi çendîn awayan bi kar hatîye ji wan “Style, Manner, Mode For, Expression” ku her hemû jî wateya sebkê didin û alîyê derve ê tiştan dixin rû, lê wekî zanist di zimanê Îngilîzî de dibêjinê “stylistique ku ji peyva Style bi kar hatîye”. Herweha di zimanê Firansî de jî destepeyva “Le Stylistique” tê bikaranîn (Aryana Îbrahîm Mihemed, 2010: 17). Herweha “Heme Nûrî Umer Kakî” derheq destewajeya sebk de dibêje: “Peyva şêwaz style destepeyveke kevn e û her ji destpêka lêkolînê edebî ve hatîye wergirtin. Ji

peyva “style” a Girîkî - Latîni ve hatîye wergerandin, di zimanê ‘Erebî de jî “el-ûslûb” ê bi xwe ve digire (Heme Nûrî Umer Kakî, 2012: 18).

Ferhengên Kurdî jî qala vê çendê dikin ku ev lêkdanewe û şiroveyên curbicur bo destpeyva sebk hatîye kirin û her yek ji wan li vê destpeyvê nihêrî ne.

Mînak:

Di ferhenga “Hembaneborîne” de sebk bi wateya “şikil, terx, rahatin, heyet û qîyam hatîye” (Abdulrehman Şerefkendî (Hejar Mokiryani), 1391: 502). Di ferhenga “Mehabad” de sebk tê wateya “şêwe, reftar, edeb, sîfet, wekî yek” hatîye (Gîwî Mukiryani 2012, L: 314). Herweha di ferhenga “Kurdistanê” de jî “şêwe, selarî, şerm, edeb” li hemberî zaraveya sebk hatîye bikaranîn (Gîwî Mukiryani, 199: 653), ferhenga “Şîrîn” jî peyvên “çoniyetî, reftar, edeb, sîfet, şêwe” li hember de bi kar anîne (Fazil Nîzamedîn, 2017: 318) lê ya ku niha merema me ye di vê mijarê de destwajeya sebk e. Di ziman û edebîyata Farsî de sebk di hemberî peyva style de bi kar tê. Bi şewaznasîyê jî stylistic tê gotin “sebkşinasî” (Zeyneb Celîl Xelîl, 2011: 78).

Lêkolerên bîyavê edebîyata Farsî ji dîtingeha xwe ya şewaznasane ve vê edebîyatê bi ser çar qonaxan de parve dikin, bi navnîşana sebka Xorasanî, sebka Iraqî, sebka Hindî û sebka Qonaxa Veguhastinê, her sê beş jî sebka destpêkê de girêdayî bi edebîyata kevn ya Farsî ne, sebka çarem jî derwazeya nûbûna vê edebîyatê bi xwe ve digre. Di warê dîrokî de serhildana sebka Xorasanî vedigere bo nîwa yekem ya sedsala çarem a Koça Rojî û heya nawerasta sedsala şeş berdeyam dibe û sebka Iraqî jî ji destpêka sedsala heft ve serî hildide û heya sedsala dehem dom dike. Herçi sebka Hindî jî ji sedsala dehem ve dest pê dike û heya îro jî berdeyam dike. Rohnkirina hemû van dem û wextan, demeke zêde dixwaze û bi lêkolîneke kurt bi dawî nahê, piştî jî ya ku di vê lêkolînê de merema me ye “Sebk” a Iraqî ye, lewra emê zêdetir bala xwe bidin ser vê sebkê.

Her di demên kevn de wateya sebk ji aliyê Ewropîyan ve bo fikra edebî bi kar hatîye, bikaranîna vê destpeyê jî rasterast pêwendîya wê bi rexneya edebî û nirxandina deqa edebî ve heye. Bikaranîna vê têgehê jî rasterast pêwendîya wê heye bi rexneya edebî û nirxandina deqên edebî, jiber ku “zanayan sebk bi kar anîne, bona vê ku bahs ji rêbazekê ji rêbazên vekolînên zanistî bikin” (Reyhan Resûl Ehmed,

2017: 4). Lewra bo gihîştina bi pênaseyeke giştîgîr bo têgeh û wateya sebk karekî bizehmet e. Jiber ku çemk û wateya sebkê ji qalibê edebî derketîye û tewahîya leyîzên jîyana rojane ya mirov girtîye ber, bi awayekî ku her mijareke rojane ku tu dest bi dibî, sebkeke taybet bi xwe heye wekî: Nivîsîn, gotardan, wênekêşan, musîqalêxistin û peykertaşî.

Bi hûrbûna ji berhemên helbestkaran ên her serdemekê em wiha dibînin ku sebka taybet bi xwe û ew qonaxa ku têde bûye, berçav dikeve. Sebka bi edeba Farsî weha hatîye pênasekirin: “Sebka pêk tê ji wê taybetmenîya zimanî û fikrî ên edebî ku di heyama qonax û serdemekê de per û baskê xwe bi ser edebîyat û helbesta helbestkaran de dikêşe” (Sîrwan Cebbar Emîn, 2014: 78). Wate digel goran û hatine ser kar a her serdem û qonaxê nû ya edebîyatê jî sebkeke taybet bi vê qonaxê werdigre û helbestkar jî peyrewîyê ji vê cureya sebkê dikin ku digel qonaxê de ser hildaye.

Herweha sebk di edebîyata Farsî de “bi awayek ji awayên zimanê helbest yan pexşanê tê gotin, wate şêweyek e ku nivîskar yan bêjer ji neagayîya wan ve ew mijar çavkanî digrin û di deqên taybetî de jî wateyê diafirîne” (Arbelî Rizayî, 1382: 323). Bi vê wateyê ku alîyê neagayîya mirov rasterast bandorê li ser deqa nivîskar dike, ew jî di warê hilbijartina cureya ziman û ew mijarên ku nivîskar dixê rû, di vir de armanca sereke ya vê cureya edebîyatê, berhevdana xistina ber çavan ya edebî ve nine, belkî armanca ew e ku ew alîyê veşartî yê vî ziman û sebka cura deqa edebî ku pê hatîye nivîsandin nişan bide.

Lewra bi baldan li ser pêwendîya zanistî ya sebk digel edebîyatê de eva ji me re eyan dibe ku wihaye sebknasî “pêk tê ji wê zanista nû ku di taybetmendiyên zimanî yên gotara edebî hildikole û heqîqeta van sebkên jî nişan dide ku nivîskar di nivîsîna deqan de peyrewî jê kirine” (Îdrîs Abdulla, 2013: 11). Li gora vê pênaseyê sebknas li ser çawanîya eyankirin û eşkerekirina garantîya deqa edebî lêkolîn dike, wate bi awayekî ku nivîskar mijarên xwe baş kirin e û peyrewî ji çî sebkeke taybet kirîye. Herweha raxistina ber çavan ya cureya zimanê edebî û alîyê edebî û ew bandorên ku li ser deqan tî xûyakirin, dixê rû. Bi vî awayî “helbestkar û nivîskar bi sedema şêwazê di tewahîya qonaxên nivîsîna xwe de bandora xwe di nava berhemên xwe de nişan didin” (Sîma Dad, 1378: 274). Rewşa ciwannivîsînê pêk tê ji hebûna

deshilata tewaw bi ser mijar û peywendîyê de di navbera bîrkirin û girîngîdana bi fikr û endîşeyê bona vê ku di encamê de em bikarin pêwendîya di navbera ziman û bîrkirinê de bikin bo pêşvebirina bîrkirinê. Bi vî awayî “şêwaz ew rewş e ku kar û bandorê dike ser hiş û hundirê xwîner” (Selîm Reşîd, 2012: 69).

Belavbûna sebkê bo nav hemû mijarên jîyana mirovahîyê bûye sedem ku sebk tenê di bîyavê edebî de nemîn e û bo her derê belav bibe ku bi vî rengî “naveroka peyva şêwaz gellek berfireh dibe, hekî bixin ber ronahîya lêkolînê wekî toz û xalîyê belav dibe bo wateyên cuda” (Şîyaw Resîd Ebûbekir, 2008: 9). Ew yek jî dibe sedem ku pênasayên cuda bo têgeh û wateya sebkê bê kîrin. Koma van pênasayan bo têgeha sebk di navbera sêgoşeya nûser, tekst û xwîner yan dahêner, peyam û peyamwergir, digere. Dawî car sebk li ser pêwendîya di navbera wan sêgoşeyan lêkolîn dike. Bi vî rengî sebk pênasaya curbicur jê re hatîye avakirin û rêkevtin û sekinîn li ser pênaseyeke giştîgîr kareke bîzemet e, lewra em çend pênasayan nişandidin:

“Şêwaz pêk tê ji rêyeke taybet ku nivîskar yan helbestkar ji vê rêyê ve bi dariştineke taybet bi xwe û zimanê xwe bîr û fikrên xwe eşkere dike” (Heme Nûrî umer Kakî, 2008: 26). Ya “Sebek berhema dîtingehe taybetî ya hunermendane ye bo cîhana navxwe û derve ku bi awayekî taybetî di derbirînê de xwe nîşan dide” (Sîros Şemîsa, 1384: 18).

Sebk pêk tê ji rêyeke taybetî ya têgihîştin û derbirîna bîr û fikran bi sedema têkelbûna peyvan û hîlbijartina derbirînan (Sîma Dad, 1387: 274). Di dawîyê de em dikarin bêjin ku sebk pêk tê ji lênihêrîn yan derbirîna taybetî ya nivîskar bo cîhana derve û navxwe û derve ya nivîser bixwe bo wan mijarên ku nîşan dide, lênihêrîn û derbirîna taybetî jî berhema taybet berhem tîne ku cuda dike ji berhemên kesên din.

BEŞA YEKEM SEBKA IRAQÎ

1.1.Serhildana Sebka Iraqî

Yek ji sebkên herî girîng ên edebîyata Farsî sebka Iraqî ye ku di dawîya sedsala şeşem heya sedsala nehem domkir, zêdetir jî li Iraqa ‘Ecem wate Xorasan û cihên din wekî navenda Îran û Fars û Kirman rol hebûye. Bi vî rengî ew sebk di dawîyê de bi sebka Iraqî hatîye nasîn. Bi vî rengî sebka Iraqî bi sanahî di helbest û edebîyata Farsî de berçav dikeve, di vê qonaxê de roleke berçav hebûye. Lê digel vê yekê jî serhildana sebka Iraqî û berfirehîya vê sebkê bi tenê taybet nebûye. Bi Iraq a ‘Ecem, belkî di cihên din de jî bi kar dihat û helbestkarên vê serdemê peyrewî lê dikirin. Herçend ku “Sercem xwendingehên sebka edebîyata Farsî girêdayîne bi serdema paş belavbûna ola Îslamê û gihîştina vê ayînê bi Îranê, lê serdema zimanê Farsî a nû û yekemîn berhemên edebî ên zimanê Farsî ya nû bi helbest û pexşan ve di çarçoveya sebka Xorasanî hatine nivîsandin” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 78).

Polênkirina xwendingehên sebkên edebîyata Farsî “li gora rewşa serdemî û coxrafi dabeş dibin ser sê sebkên de ku li gora rêzbandîya dîrokî pêk tên ji sebka Xorasanî, Iraqî, Hindî” (Mîmint Mîrsadiqî, 1385: 151). Serhildan û hatina qadê ya her yek ji van xwendingehên sebka vedigere bo qonax û serdemên curbicur. Wate “destpêka serhildana sebka Xorasanî vedigere bo nîva yekem ya sedsala çarem ya zayînî û heta nawerasta sedsala şeşem berdewam dibe, sebka Iraqî jî di destpêka sedsala heftem ve serî hilda û heya sedsala dehem dom dike. Her çî sebka Hindî ye jî ji sedsala dehem ve dest pê dike, heya îro jî rengvedana wê berçav dikeve” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 78).

Di sedsala şeşem de sedemên derveyî û navxweyî ên civaka Îranê ku bi sedema wê ve guherînkareyeke girîng di xwendingeha sebkên de rû da, dawî car bi jidayîkbûna sebka Iraqî tewaw bû û pêşveçûn di sebka nû de ku bi bebka Iraqî hatibû naskirin rû da, bi vî rengî helbestkaran bo bahskirin û raxistina ber çavan ya bîrokeyên xwe di cihê bikaranîna peyv û wateyên fermî û sereke, hawara xwe birin ber bikaranîna peyv û destewajeyên nû. Ew yek jî di çarçoveya xezel û mesnewî û çarbirgeyî de bû ku peyrewî jê dikirin. Lewra “helbesta Farsî ya derî bi komeke taybetmendîyan tê gotin ku di şêwaza piranîya helbestkaran di nîva duyem ya sedsala

şeşem heya dawîya sedsala nehem a koçî pêk hat” (Zeyneb Celîl Xelîl, 2011: 20). Jiber ku zimanê Farsî a derî zimanêke bihêz û şokemendîya wê serdemê bû ku Îran û herêm tê re derbaz dibûn. Lê êrîşa Moxolan li ser Îranê û rewşa nebaş a civaka Îranê, ziman jî wekî her alîyeke din ya edebîyatê guherîn bi ser de hat. Em dikarin bêjin ku ziman ji dîtingeha xwînerê vê serdemê ve xweştir e û bikaranîna zimanê Farsî ya resen a kevn kêm bûye, herçend ku çarçoveya ziman heman çarçoveya zimanê kevn e, lê taybetmendîya nû wergirtîye ku wê cuda dike ji sebka Xorasanî.

Herçend ku qonaxa vegeşandina sebka Xorasanî di warê dîrokî de vedigere bo serdema deshîlata Tahîrî, Samanî û Xeznewîyan û basa sereke ya vê sebkê girêdayî ye bi qonaxa deshîlata Samanî û Xeznewîyan, lê eva ku dawî bi vê xwendîngeha “Sebk” anî, êrîşa Moxolan û ew guherînkari bûn ku herêmê bi xwe ve dîtî. Digel koçkirina helbestkar û edîban bo Iraqê û Hindustanê. Herweha lawazîya deshîlata Selcuqîyan û girîngîya bîyavê ferhengî û kulturî û şaristanîyeta wê demê, bîhanîbûna digel ferheng û şaristanîyet û fikr û edebîyat ji alîyê deshîlatdarên herêmê, hatina ser kar a deshîlata Moxolan sedemeke sereke bû bo serhildana sebka Iraqî (Rizgar Adullah Ehmed, 2015: 13).

Eşkere ye ku “Deshîlata Selcuqîyan destpêka guherînkari ên bîngêhîn bû di edebîyatê de” (Rizgar Adullah Ehmed, 2015: 14). Vê yekê jî rasterast bandora xwe hebûye li ser rewşa civakî û sîyasî û aborî ya herêmê ku dawî car guherîna edebî jî bi xwe ve dît, helbest û edebîyat jî di vê qonaxê de encama vê rewşa nebaş bûn ku civaka Îranê tê re derbaz dibû, bi vî awayî guherîn di ziman û edebîyat û fikr de rû da, ji wir şûnda guherîneke nû rû li Îranê kir û civaka Îranê di warê sîyasî û aborî û ferhengî û rewşenbîrî de kete nava qonaxê nû de. Di bin bandore vê qonaxê û rewşa nû de edebîyateke nû jî serhilda ku rengvedana rewşa herêmê bû û cuda bû ji qonaxa sebka Xorasanî û wekî sebka Iraqî bi nav kir.

Lewra em dikarin bêjin ku serhildana sebka Iraqî hevdem e digel êrîşa Moxolan ku bi vê sedemê ve rewşa civaka Îranê li ser yek ji nav çû û bîyavên ferhengî jî ji nav çûn. “Îranîyan di vê serdemê de ku teji ye ji bûyerên curbicur bi qasî hemû dîroka derbazbûyî kul û derd kêşandin” (Zeyneb Celîl Xelîl, 2011: 20). Xembarî û bêhêvîtiyeke zaf rû li herêmê kir. Di hemberî vê rewşa nebaş de zimanê edebî û xwendin û nivîsandin guhertin bi ser de hat û ber bi nûbûnê ve çû. Şê`ir di

bîyavê fikrî de hilgirê peyama wê rewşa sîyasî û civakî bû ku wê herême bi xwe ve girt, mijarên îrfanî û sofîgerî geşe kir û bû sedemek bona nîşandana xem û nerehetîyên xelkê. Di bîyavê edebî de jî helbestê formeke nû wergirt û “Xezel” cihê “Qesîde” yê girt ku pêştir di sebka Xorasanî de cihê girîngpêdana helbeskaran bû. Herwiha helbestkaran bi girîngî ve girîngî dane “Paş Serwa” û bikaranîna “Texelus” ê ku di qonaxên berê de girîngî nedabûnê. Digel veqerxistina şîyana helbestkar di girîngîdana bi “Hunerên Rewanbêjîyê” û rengvedana wan di helbestên wan de, pertûkxaneya sebka Iraqî ji dayîk bû.

1.2.Sedemên Guherîna Sebka Xorasanî Bo Sebka Iraqî

Bi awayekî giştî di şewaznasîyê de faktora sereke ya guherîna sebkekê bo sebkeke din û guherîna civakî û sîyasî û aborî hwd. dibe sedema guherîna jîyan û refar, cara dawî ew yek sedem e bo guherînkari di bîr û lênihêrîn û guhertina fikrê ku bandora xwe heye li ser ziman û çandê û hemû bîyavên jîyana şaristanî ya vê civakê, rastî vê guherînkariyê tê. Eşkere ye ku civaka Îranê jî bêpar nîye ji neqilkirina deshilatê de, lewra bidawîhatina deshilata Xeznewîyan û bidestvegirtina deshilatê ji aliyê deshilatdarên Selcûqî ve faktora sereke ya guherîna sebka Xorasanî bû bo sebka Iraqî. Jiber ku bi hatina Selcûqîyan bo Îranê bîhanîbûna wan bi edebîyat û çand û kultur û şaristanîyeta Îranê ku wê demê bazareke germ ya koma helbestkaran û edebdostan bû, berew nemanê ve çû, ew yek ji aliyekî ve û ji aliyekî din ve koçkirina helbestkaran û nemana koşka paşayê Xeznewîyan bû ku sifreya edebî û korr û civînên helbestkarên wê demê bû û helbestkarên xwedîşîyan helbestên xwe ên carr û dîtingeha xwe dixistin rû û ji aliyê paşa ve xelata bezma helbestên xwe werdigirtin.

Herwekî ku me amaje pê kir, sedema guherînkariya her sebkekê guherînkariya civakî ye, bi vî awayî jî êrîşa Selcûqîyan û bidestvegirtina deshilatê ji aliyê wan ve rewşeke gunçaw û bicîh bo guherînkari di sebk û şewaza çîneyetî de guherî bo sebkeke din. Di navbera du Sebkên de hertim nivşeke perwerdekirî ya berî xwe heye û dibe domdarê qonaxa zêde belavbûyî ya berî xwe ku sebka Xorasanî ye. Bo jinavçûna nivşa kevn û hatina pêş ya nivşeke nû hewce ye ku civak here nav qonaxê nû de û di navbera qonaxa jinavçûna deshilata Xeznewîyan û hatina ser kar ya deshilata Selcûqîyan nêzî du sedsalan sebka Xorasanî berdewam bûye. Êrîşa Moxolan li ser Xorasanê û belavbûna wan bo herêmen din ên Îranê zirareke mezin

gehandine sîstema sîyasî û aborî ya Îranê. Bi vî rengî ferhenga Îranê ket û Xorasan ku kangeha ferheng û xwendin û pirtûkxane bû ji nav çû, beşa herî zor ya zanayan yan hatin kuştin û yan jî revîyan berew Hind û Asyaya Biçûk û ew cihên ku bingeha kom û civînên nivîskaran û helbestkaran bûn ji navçûn. Bi vî rengî guhertina tewaw ya wê rewşa nebaş ya sîyasî û aborî û civakî, rasterast sebka Xorasan di binî de heland û sebka Iraqî jî vegeşîya û nivîskeke nû ya perwerdekirî hate pêş. Helbest û edebîyata Farsî jî kete nav qonaxeke nû de (Zeyneb Celîl Xelîl, 2011: 15). Lewra em bi awayekî kurt sedemên guherîna sebka Xorasanî bo sebka Iraqî di çend xalan de bahs dikin:

1. Tevlîhevbûna Xelkê Xorasanê û Îraqa ‘Ecem

Belavbûna zaraveya Farsî a Derî di herêmên din ên Îranê de, jinavçûna peyvên dijwar û mirî li pey xwe anîn ku zêdetir girêdayî bûn bi herêmên Rojhilat û di bin bandora peyvên bîyanî wekî ‘Erebî û Tirkî de bûn. Digel vê ku Selcuqîyan paytexta xwe ji Xezne wate Xorasanê veguhastin bo Isfahan û Iraqa ‘Ecem, ew yek jî sedemek bû bona têkelbûna du ferhengên cuda (Sîros Şemîsa, 1382: 91).

2. Zimanê Farsî Ya Derî Dibe Zimanê Xwendin û Nivîsandinê

Digel bûna zimanê Derî bi zimanê xwendin û nivîsandinê divîya ku nivîskar û helbestkarên din xeynî Xorasanê hûrgilîyên zimanê Farsî a Derî ji berhemên edebî hîn bin. Ew yek jî di demekê de ku helbestkarên Xorasanê peyv her çawa ku guhdarî dikirin, her wisa jî bilêv dikirin (Sîros Şemîsa, 1382: 92).

3. Vegeşandina Sofîgerêyê û Çalakîya Sofîyan

Di serdema Xeznewîyan de sofî di bin zexta sîyasî û mezhebî ya Îranê de bûn li Xorasanê û girîngîyeke zêde dane sofîgerî û çalakîya sofîyan li çav serdema Samanîyan. Ji ber ku di wê serdemê de Xorasan di bin deshilata Xeznewîyan de bû ku wek yek ji bi firqeyên tundrê ên ayînzaya sûte tê danîn. Lewra şêxê Xeznewîyan li dijî vê deshilata demargîr ya Xeznewîyan dest kir bi darêtina pîlanan û handana Selcuqîyan da ku êrîşê bikin ser Xorasanê. Dema ku Selcuqî hatin ser kar, di cîyê wê hevkarîya sofîyan de, poan dane wan û çendîn tekîya bo wan avakirin ku tewahîya çalakî û bîr û boçûnên xwe tê de belav dikirin (Sîros Şemîsa, 1382: 92).

4. Avakirina Xwendîgehên Olî û Vegeşandina Zanîstên Îslamî

Selcuqî jî her wekî Xeznewîyan bona bihêzkerina deshîlata xwe û rewayîdana bi deshîlatê, naçar bûn ku destê alîkarî û dostatîyê bo xelîfê Bexdayê dirêj bikin ku bi vê sedemê jî dest kirin bi avakirina xwendîgehên ayînî û vegeşandina zanîstên Îslamî ji alîyekî û ji alîyekî din ve jî avakirina vê xwendîgehê û vegeşandina zanîstên Îslamî ku bûne sedema vê ku xelkê Iraqa 'Ecem digel xelkê Xorasanê têkelîyek û dostatîyekê peyda bikin, digel hebûna nasyarîya pêşwext a Xorasanîyan bi zanîstên Îslamî(Sîros Şemîsa, 1382: 96).

5. Jinavçûna Tevgera Şî'ûbîye¹

Di serdema Sultan "Mehmûd Xeznewî" demargirî û sextgirî li ser mijarên ayînî û hewadarên xelîfeyên Ebasî, serhildana Şî'ûbîye kete ber metirsîyê û di encam de di serdema Selcuqîyan de ew serhildan ji nav çû (Sîros Şemîsa, 1382: 97).

6. Girîngînedana Selcuqîyan Bi Helbest û Helbestvana

Selcuqîyan her ji destpêka deshîlata xwe ve girîngî nedane helbest û helbestkaran û zedetir qaliba xezelê dihat bikaranîn. Her ji destpêka bidestvegirtina deshîlatê ji alîyê Selcuqîyan ve wan girîngî dane helbest û helbestkaran. Di vê derheqê de Qesîde ku emrazek bûye ji bo meht û pesnê, paşekêşe kir û xezelê cihê wê girt ku emrazek bû bona eşkerekirina hest û soz û vegeşînê. Nasyarbûna Selcuqîyan digel şaristanîyeta Îranîyan û Sebka edebîyata Îranê û bi hevkarîya wezîrên Îranî ku deshîlata wan hebû karîna cardin qesîdeyê vegeştînin ser rewşa caran (Sîros Şemîsa 1382: 99).

7. Jinavçûna Nivşa Zanayên Pêşîn

Piştî şikesta "Mes'ûd Xeznewî" û cihêlana Îranê berew Hindustanê her çî nivîskar û helbestkarên xwedîşîyan ên wê demê hebûn digel wî koç kirin, yê ku mabûn jî, giriftar bûn û ketin kuncê girtîgehê û koşka Xezneyan berew Isfahanê hate

¹Tevgera Şî'ubiye: Hin kes an grûpeke neteweyî bûn ku bi zalbûna netewên 'Ereb bi ser netewên din yê ne 'Ereb razî nedibûn, hetanî grûpek ji wan bi yeksaniya 'ereb û netewên din yê razî nedibûn. Li gorî wan tenê îman û bawerandin bi Xwedê û pilew pêgeha kesekê din bilindtir diken. Tevgera şî'ubiye di serdema Emewîyan de heta despêka deselatdariya 'Ebasîyan de deselatdar bûn. Lê piştî ra dijatiya wan dihate kirin, bi navê kafribûnê dihatin kuştin û jinav birin (Zeyneb Celîl Xelîl, 2001: 16).

veguhastin û helbestkar hatin meydanê ku tu pêwendîya wan bi Xorasanê ve nebû. Vê yekê jî rasterast bandora xwe hebû li ser guherîna sebka Xorasan bo sebka Iraqî (Sîros Şemîsa 1382: 106).

8. Şerxwazî û Fitne Di Navbera Fermanrewayan

Ji alîyekî mijûlbûna dewletîyan bi xweşderbazkirin û rehetîyê. Herweha gendelî ya kargêrî ya dadwerî û rişwetxorî ji alîyekî din ve bandora rasterast li ser guherîna sebka Xorasanî bo sebka Iraqî hebû (Sîros Şemîsa, 1382: 106).

9. Veguhastina Navenda Kulturî û Rewşenbîrî Ji Xorasanê Ve Ber Bi Iraqê

Piştî êrîşa Moxolan li ser Îranê û bi taybetî Xorasanê rewşa herême bi awayekî kêşe kete nav de ku helbestkar û edîb neçar bûn koç bikin bo Iraqê, bi koçberbûna helbestkar û wêjevanan navenda kultur û ferhengî ya rewşenbîran jî ji Xorasanê ve hate veguhastin bo Iraqa 'Ecem. Di bin vê rewşê de edebeke nû serî hilda ku cuda ji edeba qonaxa sebka Xorasanî wekî edebîyata sebka Iraqî hate nasîn (Rizgar Abdullah Ehmed, 2015: 16).

Serbarê wê rewşa nebaş ya ku piştî êrîşa Moxolan û wê nehamefî û bêhêvîtiya ku pêsîra Îranê girtibû, alîyê derûnî û civakî ya civatgeha Îranê guherîn bi ser de hat. Herçend ku edebîyata Farsî ji qonaxeke xirab de dijîya, lê nivîskar û edebdostên wê demê karîn ku mifahê ji rewşê wergirin û nehêlin ku şaristanîyeta Îranê berew jînavçûnê ve here. Lewra ji kanala hestkirin bi berpirsiyarêyê ve qonaxeke nû ji bo helbest û edebîyatê afirand. Wate helbest û edebîyat birin nava qonaxeke nû û qalibeke nû kirin ber edebîyatê de. Bi vî rengî şakareke nû afirandin. Bi vî awayî carek din geşe bi mîrata kevn ya Farsî dan, xaneqa û medreseyên dînî ava kirin û mijarên zanistî û di nava wan de jî bi taybetî zanistên Îslamê girîngî pê hate dan. Alîyê ruhî a civakê heya radeyekê vegeşîya rewşeke baş û cihgir û îrfan geşe kir, bi vî awayî helbestkarên vê qonaxê helbest û edebîyata Farsî gehandin lûtkeyê ku wê yekê jî, xwe di sebkeke nû de dît ku sebkeke Iraqî bû (Zeyneb Celîl Xelîl, 2011: 19).

Digel êrîşa Moxolan li ser Îranê û bidestvegirtina deshilatê ji alîyê wan ve Îran kete qonaxeke nû de ku bû sedema guherînkareyêke dîrokî ku bi sedema vê, helbest û edebîyat a Farsî pêşketineke nû bi xwe ve dît, komeke bingeh û sîmayên cuda ên nû digel xwe anîn û qalibeke nû bexşîne helbest û edebîyatê. Ew bingeh û

sîmayên cuda ku digel sebka Iraqî hatin nava edebîyatê û bûne sîma û taybetmendîyên ku digel sebka Iraqî hatin nava edebîyatê de, bûne sîma û taybetmendîya dîyar a sebka Iraqî, bûne xala cuda ya di navbera wê sebke û qonaxa sebka Xorasanî. Lewra Guher Rostemî Nejad di lêkolîna xwe de bi navê “Meqayesey Mî û Me’suq Der sebka Xorasanî û sebka Iraqî”, cudahîya sîmaya van sebkan di warê fikrî de bi rohnî hest pê kirîye û em ji weha raxin ber çavan:

J	Sebka Xorasanî	Sebka Iraqî
1	Medh û pesna eqil.	Medh û pesna evîn û hezkirinê.
2	Nermrevîya di meth û pesnkirinê.	Zêdervî di pesnkirinê de.
3	Vegeşandina îrfanê.	Diranemana îrfanê.
4	Bîr û fikra hemasî (qehremantî).	Fikra Xînayî (Lîrik)
5	Xweşî û şadî.	Xemgînî.
6	Gihîştina bi hevdu (wisal)	Cudabûn (firaq).
7	Girîngîdana bi rastî û waqî`i (ketwar).	Girîngîdana bi îde (bîrdozî).
8	Girîngîdana bi cîhana derve.	Girîngîdana bi cîhana navxwe û mijara ruhî.
9	Girîngîdana bi qehremantîy netewewewî a Îranê.	Girîngîdana bi zanistên Îslamê.
10	Hilbijarde û irade.	Qeza û qeder.
11	Ruhmeznî û biheybetbûn (îzeti nefîs).	Xwe kêmezanîn (zebûnî).
12	Bêbuhayî a meqama yar.	Bilindîya pêgeha me`îşûq.
13	Bêbuhabûna zanistan.	Rengvedana zanistê

Eşkere ye ku her di demên kevin de Xorasan bingeha şaristanîyet û ferheng û kultura Îranê bûye. Bi sedema berfirehbûna deshîlata Selcuqîyan û bîrhanîbûna wan digel şaristanîyeta wê demê a Îranê û kêmbuhayîya bîyavê ferhengî û rewşenbîrî ji alîyekî û ji alîyekî din ve êrîşa Moxolan li ser Îranê û navçeyê berbirûyê kawilkarî û wêranîyê bûye. Îran rastî rewşeke necihgir bû û kuşt û kuştareke zêde hebû û her çi zana û edîbên navdar hebûn hatin kuştin û yê jî ku man yan koçber bûn û berew Hindustan û Asyaya Biçûk revîyan, yan jî ketin kuncê girtîgehê de. Bi vî rengî her çi

mamoste û zanayên wê serdemê ku erk û wezîfeya perwerdehîya nifşa nû li stûyê girtibûn, ji nav çûn, jînavçûna van zanayan û edîban ên navdar wê demê û rewşa nebaş ya Îranê rasterast bandora xwe li ser helbest û edebîyatê çê kir. Ew bandor jî bi tenê li ser helbest û edebîyata Îranî nesekinî, belkî bandora xwe li ser edebîyata “Erebî jî danî. Lewra navhînan û serhildana her xwendengehekê ya sebka, pêwendîya wê bi wê qonaxê ya deshilatê ve heye ku eva herêm bi dest ve girtîye (Zeyneb Celîl Xelîl, 2011:167).

Bi vî rengî edebîyata serdema Moxolan tewaw berevajîyê edebîyata berî xwe ye û bi awayekî ji awayan her yek ji van cure edebîyatan xwedîyê sîma û taybetmendîya serbixwe ne ku helbesta wê serdemê pê tê nasîn. Bo mînak helbestên serdema sebka Xorasanî helbestên şadî û pîrr çalakî ne, hilgirê peyama xweşbextîyê ne herweha bas ji jîngeha xanedan û keyf û seyran û bezm û rezman dîkin. Sedema vê yekê jî vedigre ser morala Îranîyan û xweşderbazkirin û pêşketina rewşa sîyasî û aborî û ya serdema Sasanîyan û Xeznewîyan. Xweşderbazkirina helbestkaran bixwe û helbestkar jî sedemeke din a peyameke xweşî û şadîyê bû ku di nava helbest û edebîyatê de reng vedaye, eva helbestkar beşeke zor ji wan ji alîyê paşayan ve bi wan hatibûdayîn. Lê di qonaxa sebka Iraqî de helbest hilgirê peyama xembarî û bêhêvîyê ne ku rengvedana rewşa civaka Îranê nîşan didin ku eva herêm berbirûyê gefên yek li pey yekê ên wê demê bûye û kuşt û kuştare per û baskên xwe bi ser cicaka Îranê de kêşaye. Her çi zana û edîb hene, rastî koçkirinê hatin, yan jî hatin girtin û ketin girtîgehê de.

Herweha helbestkar di helbestên xwe de rengvedana rewşa nava ketwara waqî'a nava civakê dixistin ber çavan, wisa nîşan didan ku helbestên wê serdemê rengvedana jîngeha jîyan û pêwendîya paşa û kilîseyan û êrîşa di şer û pevçûnan de bûye, bi awayekî ku bûyera şer û hêzkêşanê ya wê serdemê di helbestên wan de berçav dikevin, mijara fikr û xeyal girîngî pê nehatîye dan. Herweha helbestkaran nasîyarêyeke tewaw û baş digel zanyarêyên berî Îslamê tunebûn. Di vê derheqê de îşare bi qehremantîya paşayan kirine û girîngîdana bi zanistê kêmbûyê. Bi vî rengî bîr û fikra qehremantîya neteweyî ya Îranîyan bûye rengûrûyê dîyar û xûya a helbesta wê serdemê. Di hember de helbestkarên qonaxa sebka Iraqî jî girîngî dane bîrdozî, îdelojî û bîr û fikra “Xînayî” di helbestên wan de reng vedaye. Zanist û zaravayên zanistên Îslamî bûye cihê baldana helbestkarên wê serdemê.

Herweha mijara eşq û hezkirinê di qonaxa sebka Xorasanî de gelek kê m girîngî pê hatîye dan û me`işûq di helbesta wê serdemê de pêgeheke nizim heye. Bi awayekî ku hertim di wê serdemê de me`işûq gihane hevdu, ne eva ku ji hev veqetîyabin, ew yek jî li çav qonaxa helbestê ya sebka Iraqî berevajî dibe. Bi vî rengî mijara helbest û edebîyatê di wê serdemê de hilgirê peyama evîn û hezkirinê ne. Me`işûq di helbesta helbestkarên wê serdemê de pêgeheke bilind heye û di cihê bi hev gihîştina me`işûq em cudahîya me`işûq dibînin. Digel vê yekê de jî helbestkarên sebka Xorasanî girîngî dan a meht û pesna alîyê aqilî û hevsengîyê, ew yek jî zal bû bi ser hest û soz û mîyanrewbûnê di medhkirinê de. Lê di hemberî vê yekê de eşq û hezkirin mijara serekî ne, di sebka Iraqî de, belkî zêderewî di medh û pesna me`işûq de tê dîtin.

Helbestkarên qonaxa sebka Xorasan jî zêdetir girîngî dan a rengûrûgerêyê “Rewaletgerayîyê” herçend ku baskirina ji berçavtîyê “rewalet, rengûrû” tu pêwendîyeka wê digel derûna helbeskaran nebû. Mijarên helbestên wan pêk dihatin ji şî n û tazîdarêyê û hikmet, şîret û metelan. Di gel vê yekê de jî di mijara bingehîn a medh û wesf û ...hwd, şarezayî û zanyarî ên helbestkar zêdetir di xizmeta qesîdeyê de bû li çav qonaxa sebka Iraqî ku helbestkar bona derbirîn û eyankirina wê xembarî û bêhêvîyê ku hebû, derheq rewşa xirab û nebaş ya ku civaka Îranê tê re derbaz dibû, hawara xwe dibire ber derûna xwe û ji vê rêyê ve êş û azarên xwe eşkere dikirin. Mijara helbesta wê serdemê îrfan û eşq û eşqbazî ye, heta helbestkar di vê qonaxê de xwe ji şîretan bi dûr ragirtine ku di sedsala şeşem de carr bû, mijarên herî girîng ên wekî helbestê ên wê serdemê pêk dihatin ji: Yekîtbûna mijarê, zalbûna eşqê bi ser me`işûq de û piştqahîmîya bi fermûde û ayatên quranê û ...hwd, bi vî awayî edebîyata wê serdemê berevajîyê edebîyata qonaxa berî xwe, guherîn bi ser de hat û digel wê guherîn û berewpêşveçûnê jî helbest û edebîyat jî kete nav qonaxeke nû de. Ew edebîyat jî berî vê ku binihêre asoyê, çavên wê li ser derûn û hundir bûye (Sîros Şemîsa, 1391: 259).

1.4. Taybetmendîyên Sebka Iraqî

Sebka Iraqî wekî yek ji girîngtirîn sebkên edebîyata Farsî tê danîn ku di dawîya sedsala şeşem heya dawîya sedsala nehem dom kir, wate heya sê dehikan berdewam bû, zêdetir jî di Îraqa ‘Ecem û Îsfahanê û gellek cihên din wekî navenda

Îran û Fars û Kirmanê de rol hebûye, di dawîyê de ew sebk wekî Iraqî hate nasîn. Bi vê sedemê jî tewahîya helbest û edebîyata Farsî di bin sîya vê sebkê de berdewam bû ku helbestkar û edebdostan peyrewî ji yasa û rêsayên carr (baw) dikirin. Lewar baldan bi her şeweyek ji şeweyên sebka helbesta edebîyata Farsî eva xwedîyê taybetmendîyekê ne ku wan cuda dike ji sebkên din ên Iraqî. Her ew cudahîya ye jî ku taybetmendîyê dide vê sebkê. “Sebka Iraqî jî xwedîyê taybetmendîyeke serdemîyane ya taybet bi xwe ye û şareza û lêkolerên bîyavê edebîyatê taybetmendî û rûçikên cudaker ên vê sebkê di sê bîyavan de bas dikin” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 80) ku weha ye:

1.4.1. Di Warê Zimanê DeTaybetmendîyên Sebka Iraqî

Ziman sedemek sereke ye bona gihîştina bi hevûdin û derbirîna hest, soz û tewahîya derkewtinên ji kûrahîya derûna mirov, lewra mirov ji vê rêyê ve dikare pêwendîya xwe bi cîhana dervey xwe re pêk bîne, bi vî awayî “ziman made û keresteyên sereke yên edebîyatê pêk tine” (Usman Deştî, 2009: 89).

Ziman wekî yekem bingeha avakirina edebîyatê ye, jiber ku “wekî dîyardeyeke hunerî jî roleke bingehdaner dilîze di heykela helbestê de” (Se`id Faruq Yusif, 3011: 33). Bi vê wateyê ku ziman di deqa edebî de şewazeke girîng ya derbirînê ye û rasterast bandora xwe heye li ser xwîner, lewra “ziman dibe sîmaya serdema xwe hilgire û dûr bikeve ji şewaza serdemî” (Serdar Ehmed Hesên Gerdî, 2004: 65). Ziman her dem pêş dikeve û xwe nû dike, nûbûna ziman jî cureyek ji îstatîkê dibexşe ziman, dawî car bandora xwe dike ser hest û soz û her hest û soz e jî ku biryarê dide li ser şewaza ziman. “Zimanê helbestê peyrewîyê ji hemû yasa û destûrên ziman dike û li gora wê rewşa nû ku di encama yasayên guherîn û vegeşandina jîyanê de rû didin. Ev jî li her serdemekê de wateya nû peyda dike ku digel serdemê xwe rêk bixe” (Perêz Sabir, 2005: 285). Lewra zimanê sebka Iraqî ya wê serdemê jî bêpar nebûye ji wan guhertinên ku bi ser ziman de tên û wan ber bi nûbûnê ve dibe. Ew yek dibe sedem ku li çav serdema berî xwe ku sebka Xorasanî tê de carr bû, tişteke nû ye û di serdema sebka Iraqî de bikaranîna şewezar û destewajeyên kevn kêmtir dîtin. Lê digel vê yekê de jî şîyana wê heye ku bi derbazbûna dem, guhertin bi ser de bê û xwe digel hemû wan rûdaw û pêşatên nû de rêk bixe.

Di bin ronahîya vê fikra serê de û bi baldana bi vê ku di zimanê sebka Iraqî de ku bixwe jidayîkbûyîyê wê rewşa wê demê ye ku Îran û herêm tê re derbaz dibûn, komeke guhertinan bi ser de hat û çarçoveya zimanê sebka Iraqî heman çarçoveya zimanê kevn e. Wate zimanê sebka Xorasanî, bi awayekî giştî gellek ji taybetmendiyên kevn ên xwe ji dest dane û di cihê wan de heya radeyekê taybetmendiyên zimanê nû wergirtine û digel vê yekê de jî hindêk ji taybetmendiyên serdema berî xwe ku sebka Xorasanî ye tê de maye (Sîrus Şemîsa 1382: 258). Em dikarin bêjin ku zimanê sebka Iraqî li çav (pêşberî) sebka berî xwe, cuda ji ya ku li cem xwîner îro zêdetir girîngî pê tê dan û peyva Farsî ya resen a kevn bi giştî kêmbûye û di cihê wan de peyvên ‘Erebî cih girtine. Digel vê yekê de taybetmendiyên fonetîk ên kevn jî guhertin bi ser de hatine, formeke تازه bi xwe ve girtine. Bi vî rengî em dikarin bêjin ku zimanê sebka Iraqî di navbera zimanê sebka Xorasanî ya kevn û zimanê nû ê Hindî li paş e. Zimanê helbestkarên wê serdemê li çav qonaxên berî xwe bi awayekî nûtir berçav dikin. Bi vî rengî peyvên kevn û mijarên dubarebûyî kêmbûnê de hene. Ew mijarên kevn ku kêmtir bi kar dihatin, bi taybetî di serdema Sasanîyan û sedsala pêncem, di qonaxa sebka Iraqî de geşe kir û guhertin bi ser de hat û wisa kir ku beşek ji van mijarên kevn bi dîtingeheke nû ve di helbesta helbestkarên wê serdemê de berçav bikeve.

Êrîşa Moxolan li ser Îranê rasterast bandora xwe hebû li ser guherînkariyên civakî û sîyasî û aborî ên herêmê û bi vî rengî bû ku guherînkariyêke dîrokî li Îranê pêk hat û dawîcar jî bi jidayîkbûna sebka Iraqî berdewam bû ku ew yek bû tewawkerê qonaxa berî xwe di şaristanîyeta dîroka Îranê de. Vegeştin û berve pêşveçûna Îranê û tazeyîya serdem wisa kir ku ziman di vê qonaxê de zimanêke تازه û nû be li çav qonaxa serdema Samanîyan. Wê demê guherînkariyêke tewaw di zimanê Farsî de rû da ku zimanê axavtinvanên tewahîya ser`erdê di bin deshîlata Îranê bû di herêmê de, ew guherînkariyê rasterast di berhemên helbestkaran de berçav diket (Mihemed Xulamrizayî, 1391: 147). Lewra hewce ye ku baldana bi zimanê sebka Iraqî, li ser taybetmendiyên nivîsînan be, ne li ser taybetmendiyên sebka Xorasanî ku bi guherîna çend caran li vê sebkê de tê zanîn. Ew yek bûye sedem ku zimanê sebka Iraqî komeke taybetmendiyên taybet bi xwe hebin ku wê cuda bike ji zimanê qonaxên berî xwe ku ev in:

Yek ji taybetmendî û rengûrûyên sîmayên zimanî ên sebka Iraqî derbazbûn e ji zimanê qonaxa sebka Xorasan û buhagiranîdan e bi nermbûna ziman, zimanê helbestê di vê qonaxê de li çav qonaxên berî xwe bi taybetî sedsala pêncem û serdema Samanîyan zimanek xwezayî û zelal û rewantir e. Bi vê wateyê ku eva di vê qonaxê de zimanê berhemên edebî zimanek nermtir in. Herwisa xwe dûr ragirtîye ji peyvên atîfî û heta zimanê xezel jî ketîye bin bandora vê nermbûna ziman.

Ew yek jî di encama “bawbûna îrfan û zalbûna dîyardeyên derûnî û girîngîdan e bi hastên dil, bê guman bandora xwe ya herî girîng heye li ser nermbûna zimanên vehûnandinê” (Mihemed Xulamrizayî, 1391: 148). Guherîna demê û hatina nav meydanê ya mijarên îrfanî bo nava edebîyatê û girîngîdana bi vê şêwaza ya ziman ji alîyê nivîser û edîban ve bû sedem ku nerimbûna ziman tenê xwe di xezelê de nebîne. Belkî “nerimbûna xezel bûye sedem ku bandora xwe hebe liser qalibên din ên dariştina vehûnandinê, heta zimanê qesîde ketîye bin bandora nerimbûna zimanê xezel” (Mihemed Xulamrizayî, 1391: 148).

Her çend ku zimanê helbestê di qonaxa pêşîn de wate di sebka Xorasanî de zimanek zivir û mukim bû. Herweha di berhemên edebî ên wê demê de ber çav diket, lê digel wê guherînkariya ku bi ser civaka Îranê de hat, bû guhertineke dîrokî bo herêmê. Lewra vê qonaxa nû jî rasterast bandora xwe li ser ziman hebû û peyv ber bi pêşve çûn, wate ziman ji wê şêwaza kevin ku berê bi kar dihat ku zimanek zivir û qahîm bû, bû zimanek nerm û nîyan, heya ku gihîşte asteke baş û bi awayekî berfireh û baştir û zelaltir li dewra hest û soza xwîner digeriya. Heta di wê serdemê de ziman ji wan mijarên li ber dest û madî dîr bû, bi taybet ku zimanê hemaset û meth û pesnkirinê bûye. Lewra zimanê helbestê di vê qonaxê de serbarê nûbûn û kêmbûna peyvên kevin, zimanek xwezayî û zelal û bilind e. Cudahîya wê digel sebka Xorasanî di vir de ye ku şikomendî û mezinahî û qehremanî bi taybetî di qesîdeyê de bikar dihat. Jiber ku peyv mih bûne, bikaranîna peyvên kevn kêmbûye û bi taybetî ji zimanê qaremantîyê dîr ketîye. Digel vê yekê de jî nermîya xezelê zal bûye bi ser ziman de û heta zimanê qesîde jî bandora xwe hebûye li ser zimanê xezel (Zeyneb Celîl Xelîl, 2011: 22).

Zimanê sebka Iraqî zimanek Farsî ye ku têkel e bi peyv û zaraveyên ‘Erebî. Ew yek jî di encama van guherînên dîrokî de bû ku civaka Îranê û herêm tê re derbaz

dibû. Guhertinên dîrokî bûne guhertineke girîng bo nav hemû leyîzên di nava civaka Îranê de û yek ji van guherînkari, ber bi pêşveçûna ziman bû, lewra digel pêşveçûna xwe û vebûna rewşa herêmê ber bi rûyê vê qonaxa nû ku rû li Îranê kiribû. Bi taybet hatina peyv û zaravayên bîyanî bo nav wî zimanî, “têkelkirina zimanê nawerast û bakura Îranê û zimanê ‘Erebî ku di wî sînori de dihate bikaranîn, cudahîyeke tewaw digel zimanê helbesta sebka Xorasanî pêk anîye” (Rizgar Abdullah Ehmed, 2015: 19). Lewra zimanê sebka Iraqî cuda ji zimanê sebka Xorasanî zimanêke têkel e bi peyv û destewajeyên bîyanî ku ew taybetmendîya jî bi awayekî ron û zelal di berhemên edebî ên wê serdemê de berçav dikeve. Xeynî vê yekê jî helbestkarên sebka Iraqî formeke nû bexşîbûn ziman li çav helbestkarên sebka Xorasanî, ew jî bi mifah wergirtina ji wan destewajeyên ku di encama guhertinên dîrokî ên Îranê pêk hatibûn û ketibûne nava ziman de.

Digel vê ku “helbestkarên wê serdemê paşxaneke rewşenbîrî ya Îslamî ya ‘Erebî û Farsî a têkel hebûye. Herweha deshilat û şarezayî di vê zimanê de wisa lê kirine ku hawara xwe bibin ber ferhengoka peyv û destewajeyên wî zimanî, di nava şêwaz û derbirîn û dariştina vehûnandinên xwe de bicih bike” (Usman Deştî, 2009: 97).

Yekek din ji sîma û taybetmendîyên zimanî ên sebka Iraqî girîngî dane bi peyvên ‘Erebî. Bikaranîna peyvên ‘Erebî ji alîyê nivîser û edîbên wê serdemê û zimanê helbestê yê helbestkarên wê serdemê li çav qonaxên berî xwe, gellek cudatir û nûtir e. Peyvên kevn û dubarebûna destewajeyan kêmtir bûne û helbestkar gellek kêmtir guh didan bikaranîna wê şêweya kevn ku di sedsala pêncem de hebû. Ew yek jî bûye sedem ku ziman di wê serdemê de guhertin bi ser de bê û ber bi nûbûnê ve here, di encama “vebûna dergehê helbestê û edebîyatê bi rûyê peyv û zaravayên zimanê ‘Erebî û avabûna zimanêke têkel ku berê hevşêweyê wê nebû, di zimanê Farsî de” (Sîrwan Cebbar Emîn, 2014: 80). Berfirehbûna peyvên di zimanê ‘Erebî de di vê qonaxê de rasterast bandora xwe li ziman û edebîyata Farsî kir, çavkanîya berfirehbûn û hatina peyvên ‘Erebî bo nava zimanê Farsî de pêk tê ji “pêkhatina vê têkelbûna ayîn û kultur ku piştî belavbûna ayîna Îslamê hêdî-hêdî di herêmê de cihgir bû” (Sîrwan Cebbar Emîn, 2014: 80). Bi vî awayî ayîn bû girîngtirîn faktora belavbûna zimanê ‘Erebî û dawîcar bû bi zimanê nivîsandin û xwendinê û heta tewahîya zanistên Îslamî jî her bi zimanê ‘Erebî dihatin xwendin.

Herweha bi fermîbûna zimanê ‘Erebî di navendên xwendinê de bû sedema vê ku ji qonaxa sebka Iraqî şûnda peyv û destwajeyên zanistên Îslamî ku di wê serdemê de girîngî bi wan dihate dan, di nava helbest û edebîyatê de belav bin û bibin sîma û rengûrûyê sebka wê serdemê. ku bi sebka Iraqî hatibû nivîsandin. Carrbûna peyv û destwajeyên ‘Erebî di vê qonaxê de ku bi awayekî gellek zîq berçav dikeve û heta di piranîya mijarên edebî de reng vedide, bi taybetî mijara Îrfanî ku çavkanîya vê mijarê jî ayîna Îslamê ye. Bo bikaranîna peyvên ‘Erebî dibe sîma û taybetmendîya zimanê wê sebkê, heta di piranîya helbest û pexşanên wê serdemê de, ew girîngîdan bandora rasterast li ser zimanê helbestê ya wê qonaxê dadinê. Ew bandor jî rasterast pêwendîya wê heye bi mijara îrfanî, jiber ku îrfan xwedîyê ferhengeke zimanî û peyvên zaravayên taybet bi xwe ye ku helbestkarên ser bi sebka Iraqî hawara xwe birin ber bikaranîna wan zarava û peyvên îrfanî û di berhemên wan de wê yekê reng vedaye.

Digel carrbûna peyv û zaravayên zimanê ‘Erebî bi ziman û helbesta edebîyata Farsî û derketina wê wekî yek ji sîma û taybetmendîyên zimanî ên sebka Iraqî, peyv û zaravayê Tirkî jî pêşveçûn bi xwe ve dît û komeke peyv û zaravayên Tirkî jî hatin nava edebîyata Farsî. Carrbûna peyvên Tirkî jî vedigere bo sedsala heftem û heştem a fermanrewayîya Moxolan di wê serdemê de û têkelawbûna dezgehên îdarî û herweha “rêknebûna sîstema kargêrî ya kevn û bikaranîna sîstema kargêrî ya Moxolan, hejmareke berçav peyvên tirkî tine nava zimanê kargêrî û dîwan û zimanê helbestê ya edebî wekî van peyvên: Ermexan, Soxat, Aqçe, Eyax, Yasa, Perçem, Qerawel, Koç, Îl, Beg û dehan peyvên din ên bi vî rengî” (Zeyneb Celîl Xelîl, 2011: 22). Weha bû ku beşeke zaf ji dezgehên Tirkî weha kirin ku piranîya peyvên îdarî û dîwanî ên Tirkî bêne nava zimanê Farsî de, dawî car her ew peyvane di gotara piranîya bêjerên wê demê de berçav dikevin û bikaranîna wan di zimanê Farsî de berdewam dibe.

Yekek din ji taybetmendîyên fikrî ên sebka Iraqî girîngîdan e bi zaravaya zanistî û rengvedana wê ye li berhemên helbestkarên wê qonaxê de, eşkere ye ku rengvedana zaravayên zanistî û girîngîdana bi wan piştî vê tê ku êrîşên li pey hev li ser Îranê û awarebûna xelkê Îranê bi taybetî bo Îraqê û têkelbûna wan di gel Îraqa ‘Ecem sedemek bû bona belavbûna zaraveya zanistî bo nava deqa edebî. Di nava wan de jî zaraveya zanistên Îslamî. Li rex vê yekê de jî deshilatdarên wê demê ên

Îranê bona rewayîdana bi deshilata xwe destê dostatîyê bo alîyê xelîfeyê Bexdadê dirêjkirin û di vê derheqê de daxwaza hevkarîkirin û avakirina xwendîngeha ayînî kirin. Ew yek jî dibe rêyek bona vegeşandina zanistan û di nava wan de jî zanistên Îslamî ku ew yek ji alîyekî ve û ji alîyekî din ve xelkê Îraqa ‘Ecem û Xorasanê, her di demên kevn de nasyarîya wan bi zanistên Îslamî re hebû, bi vê yekê weha ku “gellek ji peyvên nava zaravayên zanistê bêne veguhastin bo nava helbest û bibin taybetmendîya fikrî ya helbesta qonaxa sebka Iraqî” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 89). Bi vî rengî beşeke zaf ji zaravayên zanistî hatin veguhastin bo nava berhemên edebî ên wê demê de. Ew yek bû sedem ku “di cihê vê de ku xwezaya rasterast û waqî`î bikin naveroka helbestên xwe, lê mijarên zanistî wergirtine” (Sîros Şemîsa 1383: 247).

Nasyarbûna helbestkarên sebka Iraqî bi zaravayên zanistên Îslamî û hatina komeke peyv û zaravayên zanistên giştî bo nav helbestê bûye sedem ku helbestkar bi girîngî ve buhayê bidin zanistê. Lewra ew mijar bûye yek ji sîmayên vê qonaxê ku berê di sebka Xorasan de buha pê nehatîye dayîn.

1.4.2. Di Warê Fikrî De Taybetmendîyên Sebka Iraqî

Sebka Iraqî xwe di xwe de hilgirê komeke taybetmendîyên serbixwe ye ku wê cuda dike ji sebkên din, ên edebîyata Farsî. Herweha yekek e ji sîma û taybetmendîyên herî girîng ên vê sebkê taybetmendîya fikrî. Dîyar e ku fikr û raman digel hebûna hemahengî û yekdestebûna qise ku curek e ji taybetmendîya helbesta wê serdemê, hemû ew yek jî bi xwendina berhemên xwemalî desteber dibin. Lewra fikr pêk tê ji gotina wan tiştan di hundirê mirovahîyê de û dawîyê jî di çarçoveyê madî û berhest de. Lewra ew guherînkari di wê serdemê ya Îranê û herêmê de bûne guhertineke girîng ya di edebîyata Farsî de û bi guherîna sebka Xorasanî bo sebka Iraqî bi dawî hatîye. Ew guhertina edebî jî yek ji taybetmendîyên herî girîng ên fikrî ye. Ji vê dîtingehê ve helbesta sebka Iraqî jî rengvedana guhertineke wê serdemê ye ku herêm tê re derbaz bûye...hwd.

Du nîşanên girîng ên helbesta sebka Iraqî evin: Ya yekem belavbûn û girîngîdana bi îrfanê, ya duyem jî carbûn û girîngîdana bi qalib û çarçoveya xezel di cihê qesîdeyê de. Em dikarin bêjin ku îrfan yekek ji sîma û taybetmendîyên fikrî ên

herî naskirî û carre di sebka Iraqî de, ew taybetmendîya jî “têkelbûna fikra îrfanî ya îrfan e bi cîhana helbest û edebîyatê” (Sîrwan Cebar Cebar Emîn, 2014: 82).

Dîyar e belavbûna fikra îrfan û derkewtina wê di nava deqa helbestê ya wê qonaxê de pêwendîya wê ya rasterast hebû bi avkirina hejmareke zaf ji xaneqa û zêdebûna xaneqanişinan ku bibû dîyardeyeke carr a nav civaka Îranê de. Ew yek jî piştî êrîşa Moxolan li ser Îranê hat û xelk berew valahîyeke derûnî û me`newî û awarebûn û bêhêvîtyeke yekcar zêde ve çûn, êdî bîr û fikra îrfanî vegeşîya çêbû ku ew valahîya derûnî û morala xelkê teji bike û xizmetê bi alîyan bike.

Digel serhildan û bilavbûna bîra îrfan mijarên nû jî hatin nava deqên helbestê, bi vî rengî naveroka helbestê guhertin bi ser de hat ku helbestkarên wê serdemê ji mijarên bêbuha dûr ketin. Digel vê yekê de jî gellek girîngî dan a mijarên me`newî û ruhî, mijarên exlaqî û dînî û heta hemû ew mijarên ku xizmet bi ruhîyeta mirov dikirin, bûne çavkanîya helbesta sebka vê qonaxê (Zeyneb Celîl Xelîl 2011: 20). Piştî êrîşa Moxolan li ser Îranê êdî xelkê Îranê ketin nava qonaxêke cudatir ji berê ku tê de bûn û rastî bêhêvîtyê û herifîna derûnî hatibûn ji dest bêdadîya Moxolan û xirab bikaranîna deshilata wan bi ser xelkê de. Jiber ku xirab bikaranîna deshilatê ji alîyê Moxolan ve digel deb û resm û wê rewşa ku waye xelk tê de bûn li hev nedihat û rêk nedibû. Ew yekek bû sedema vê ku civaka Îranê hewcehîya wê bi van gotaran be ku wisa arambexş in û xizmetê bi dunyaya axiretê dike.

Jiber ku her piştî êrîşên li ser Îranê rewşeke wisa pêk hat ku bawerîhebûna bi qeza û qederê zêde bû, bi vî rengî helbestkar di vê sedemê de gotarên wan zêdetir gotarên şer`î û îrfanî bûn û xizmet bi alîyê ruhî û me`newî ya mirovan dikir. Herçend ku pêwendîya di navbera helbest û îrfanê gellek ji vê hindê kevntir heya ku tu wê girê bidî bi Sebka Iraqî, jiber ku “pêwendîya di navbera helbest û îrfanê ji wê demê ve dest pê kir ku helbesta “erûz hate nav edebîyata Farsî de, digel vê yekê de jî arîf û sofî nasîyarêyeke baş digel helbesta ‘Erebî hebûn” (Sîyêd Mihemed Rastgo, 1383: 48). Nasyarîya helbestvanên wê serdemê bi helbesta îrfanî û sofîgerî a ‘Erebî wisa kir ku bandora rasterast bi ser helbestkaran bixwe de hebe û di berhemên edebî ên wan de reng vede, jiber ku arîf û sofî her ji kevn ve sembola exlaq û ‘edetên ciwan bûn û ew yek jî sedemek bû bona vê ku xelk sersem bin bi exlaq û tîtalên bilind yê sofîyan û bandora wan li ser hebe.

Serdestbûna arif û sofîyan û carrbûna îrfan û rengvedana bîra îrfanî di deqa helbestê û berhemên edebî ên helbestkarên wê serdemê weha kir ku “alîgirên helbest û edebîyatê neçar bûn helbestên xwe heta gotarên wan jî bi edebîyat bihesibîn in” (Meryem Zîbayînijad, 1387: 45). Bi vî awayî her çi alîgir û dostên helbest û edebîyatê bûn, dest kirin bi kêmkirina helbest û gotinên xwe, bi vî awayî helbest kete nava qonaxeke nû de, rûyeke îrfanî û sofîgerêyê wergirt û xizmet bi mijarên ruhî û me`inewî ên mirovan û wê rewşa ku waye civaka Îranê hewcehî pê hebû kir, ew pêngav bû sedem ku ew helbestkarên ku li derveyî cîhana îrfanê bûn, bêpar nebûn ji bandora rewta bîra îrfan li ser helbestên xwe de û rêyek bû bona belavbûn û serdestbûna arif û sofîyan. Herweha bandora tewaw hebûn li ser helbest û edebîyata vê qonaxê, helbest û îrfan pêwendîyeke wan ya mêjîn heye ku ew yek jî digel serhildana sebka Iraqî û carrbûna qalibê xezel di edebîyata Farsî de bihêz bû. Lewra em dibînin ku îrfan û sofîgerî li detspêka sedsala sêyem ya koçî ve bandora xwe li ser helbest û pexşana edeba Farsî de hebû, bo awayekî ku waye mijarên îrfanî û sofîgerî bûne çavkanîya girîng ya helbest û edebîyata Farsî û bi awayekî berçav di wêneyên helbestê ên wê serdemê de berçav dikevin, ew mijar jî bûne îlham û bîra helbestkaran (Zeyneb Celîl Xelîl, 2011: 27).

Herçend ku serdema Moxolan hevdem e digel wê guhertina dîrokî ku di Îranê de rû da, lê dawî car bi ji dayîkbûna sebkeke nû bi dawî hat û ew jî sebka Iraqî ye. Lewra digel serhildana sebka Iraqî mijara îrfan û qalib û çarçoveya edebî jî girîngî pê hate dan. Xezel û îrfan jî ku du derkewteyên girîng in ji taybetmendîyên herî girîng ên sebka Iraqî ne. Jiber ku serdema Moxolan serdema carrbûna îrfan û sofîgerêyê ye di Îranê de, serdema zêdebûna bîr û fikra îrfanî ye ku digel belavbûna bi nav helbest û edebîyatê serdema zorbûna xaneqa û xaneqanişînan, ew mijar û çend mijarên din bandora wan hebûye li ser helbest û edebîyat a wê serdemê de.

Rengvedana bîr û fikra îrfanî di nava berhemên edebî ên wê serdemê de wisa kir ku helbestkarên bi navûbang jî, bikevin bin bandora bîra îrfanî û heta helbesta îrfanî jî vehûnin. Lewra bi hûrbûna ji helbest û edebîyatên qonaxa sebka Iraqî û ew serdemê ku îrfan tê de serdest bû, ew rastîya ji me re eşkere dibe ku ne tenê bîra îrfanî di helbest û edebîyata wê qonaxê de reng vedaye. Belkû rûçik û şeweya arifan û heta reftar û kiryar û Xwedênasî jî îşare pê hatîye kirin.

Serdema serhildana sebka Iraqî serdema hatina qalib û çarçove û guhertina helbestê ye ku tê de xezel serdest dibe, lê nabe ku ew yek ji bîra me here ku digel carrbûna xezel formeke din jî hebûye ku helbestkarên arif, helbestên îrfanî û sofîgerî ên xwe pê vehûnandine ku ew jî çarîne bû, bi vî awayî bo me îsbat dibe ku qalibê zal derbirîna bîr û fikra îrfan berî xezelê çarîne bûye. Helbestkarên arif ên wê demê di nava qalibên helbestên xwe de, di wê serdemê de qalibê çarîne kirine pira gehandina bîra xwe ya îrfanî bi xelkê û zêdetir ji hemû qalibên din ên edebî, girîngî pê dan e. Ew yek jî heya sedsala heftem berdewam bû, jiber ku çarîne “qalibêke helbesta kevn e, gellek nêzî xelkê ye. Ji aliyekî din ve kom û ahengên sofîyan jî bi hemû çînên xwe ve dixemilî û qalibê awaz û çarîneyan digel mosîqayê gellek rêk bû” (Mihemed Xulamriza, 1391: 153).

Bêserûberîya rewşa Îranê piştî êrişê Moxolan li ser Îranê û herêmê bû sedema guherîna sebka Xorasanî bo sebka Iraqî û carrbûna xezel û hatina ser kar a bîr û fikra îrfanî di vê qonaxê de ku mijareke herî li pêşê ya helbesta edebîyata Farsî ye ku têde helbestkarên vê qonaxê li rex helbestên xwe ên evîndarane lénihêrîneke arifane jî hebûn ku bi vî awayî helbest wekî pêwendîya du alî ya van mijaran dihate zanîn di wê serdemê de. (Sîros Şemîsa, 1378: 98). Bîra îrfanî di vê serdemê de dest digre bi ser tewahîya mijarên edebî û helbestkar jî roleke wan ya berçav hebû di zalbûn û serdestbûna îrfan bi ser helbest û edebîyata wê serdemê de. Bi awayekî ku helbestkarên wê qonaxê yê sebka Iraqî digel êrişê Moxolan û girtina deshilatê di Îranê de zêdetir ber bi aliyê mijarên îrfanî û sofîgerêyê ve çûn û berhemên helbestê ên wan zêdetir bo aliyê îrfanê û xizmeta aliyên ruhî û me`newî bû.

Lewra bi jêhûrbûna li helbestên helbestkarên vê qonaxê û hevberkirina wan digel helbesta qonaxa sebka Xorasanî ew yek ji me re derdikeve ku helbestên wan hilkelîyê hest û soz in û zêderewîyeke zêde têde ye, lê helbest di qonaxa sebka Iraqî de mijarên exlaqî û şîretên dînî bi xwe ve digre. Her hemû jî di xizmeta mirovahî û gihîştina bi aramîya can e. Bi vî rengî helbestên Îrfanî di sedsala heftem û digel serhildana sebka Iraqî digihîje lûtkeyê. Di sedsala heştem de helbestkaran bi vehûnandina helbestên xwe mifah ji îrfanê wergirtine û îşare kirine bi rengvedana vê fikrê bi awayên gellek ciwan.

Di gel berdewamîya qonaxa sebka Iraqî bîra îrfanî jî berdewam dibe, lewra em dibînin ku îrfan kamilbûna sedsala heftem û heştem û di tewahîya berhemên edebî ên wê qonaxa ku helbest û edebîyata Farsî tê re derbazdibe, reng vedaye. Di warê bandora îrfan û sofîgerêyê di helbestê de, em dikarin helbestkarên qonaxa sebka Iraqî bi ser sê grûpan de parve bikin:

1-Ew helbestkarên ku tevî xwendingeha îrfan û bîreke îrfanî bûne û dîtingeheke derûnî ya wan heye, made û dunyayê wekî tişteke mecaz û zêde dizanin û xwe di vê cîhanê de bi dûr radigrin. Vê grûpê şeweya “rendî û qelenderî” bi kar anîne û bona gihîştina bi rastîyan û gihîştina bi Xwedê û di berhemên wan de reng vedane.

2-Grûpa duyem ew helbestkar in ku herçend ku arif nînin, lê dîtingeha derve ya helbestên wan madî ne û di helbestên wan de bas ji ciwanîyê dikin, hesta aşîqîyê bi wan ve xuya ye û ew helbestane bi tu awayî wekî helbestên arifî nahên hesibandin. Wekî helbestên Se`idî Şîrazî û beşek ji helbestên Hafîz û ...hwd.

3-Grûpa sêyem ew helbestkar in ku hindêk rengvedana arifane di helbestên wan de têne xûyakirin, lê ne bi awayekî berfireh û helbestên wan dîtingeheke madîyane hene wekî Ubêyd Zakanî (Zeyneb Celîl Xelîl, 2011: 26).

Bi parvekirin û hebûna wan sê grûpên sere de, ew yek ji me re eşkere dibe ku di qonaxa sebka Iraqî de mijara îrfanê zêde carr dibe û helbestkarên vê qonaxê parve dibin bi ser sê grûpan de. Ew parvebûn jî vedigere bo wê rewşa nebaş, ya ku di vê serdemê de rû li Îranê kiribû. Di gel eşkerekirina nerazîbûnê û rexnekirina rewşa civakî ya wê serdemê, ew yek rû li zêdebûnê dibe, ew yek jî di encama zêdebûna gendelîya exlaqî û zulmeke zaf ya deshilatdarên wê demê bûye ku hevdem bûye sedema vê ku helbestkar bi awayekî ji awayan mijara xem û bêhêvîtîyê li cem wan dibe sermesta helbestên wan û ji vê rêyê ve rexneyên tund li deshilatdarên serdema Moxolan girtine. Bi vî awayî guherînkari di komeke taybetmendîyên sebka Iraqî de rû dan ku rasterast bandora wan hebû li ser helbest û edebîyatê û heta li ser derûna helbestkaran. Lewra edebîyat li wê serdemê de berevajîyê sebka Xorasanî, girîngî bi eşq û hezkirinê dide û mijara xem û kovanan dibe sermesta helbestên wan û helbestkar. Hawara xwe dibin ber derûna xwe bo eşkerekirina hest û soza xwe û dev

ji cîhana derve berdidin û di cihê wê de girîngîyê didin xwe (Sîros Şemîsa, 1391: 247).

Yekek din ji taybetmendîyên fikrî ên sebka Iraqî girîngîdan e bi pirsê eşq û meqamatên me`işûq û meqam û pile û payeya me`işûq ji qonaxekê ve bo qonaxeke din, guhertin bi ser tê, jiber ku di helbesta helbestkarên Iraqî de pileya wê bilindtir e, “berevajîyê sebka Xorasanî ku tê de me`işûq pêgeha wê nizm e û di cihê eşqê, meht û pesna eqil cih digre di nava helbestê de” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 83). Ew girîngîdana helbestkaran jî bi eqil, dibe sedem ku evîn bê piştguhixistin û pileya me`işûq jî, nizim be, lê digel serhildana sebka Iraqî û girîngîdana helbestkarên vê qonaxê bi evînê di cihê aqil, êdî pêgeha me`işûq jî guhertin bi ser de tê û evîn cihê eqil digre.

Jiber ku “eşq wek xala berevajî ya eqil lê tê nihêrîn” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 82). Girîngîdana bi eşqê û bilindkirina pêgeha me`işûq di helbesta helbestkarên sebka Iraqî de bi rêjeyeke zor berçav dikeve, herwisa ew bi rûçikeke taybetî e sebka Iraqî tê danîn û wê cuda dike ji sebka Xorasanî. Lewra “piranîya xezelan di mijara eşqê de bi lênihêrîneke arîfane hatine nîşandan” (Mihemed Xulamrizayî 1391: 151). Jiber ku helbestkarên vê serdem hem arif bûn û hem jî pêwendîyeke qahîm ya wan bo alîyê ruhî û me`newî ya wan bixwe û derdorê ve hebû.

Eşkere ye ku rewşa nebaş ya civcaka Îranê ku di vê qonaxê de herêm tê re derbaz dibû, sedema sereke bû bona vê ku xembarî bibe dîyardeyê nava edebîyatê, çavkanîya xembarêyê jî di wê serdemê de vedigereser êrîşa Moxolan li ser Xorasanê ku dawî car belav bû her derê û hemû herêmên Îranê, herwisa zirareke zaf gehande sîstema sîyasî û aborî û çandinîyê û ferhengî (çandî) a Îranê. Bi vî awayî Xorasan ku kangeha çand û şaristanîyeta Îranê bû zirarek ber ket û beşa zaf ya xwendingeh û bingeha şaristanîyeta herêmê ji nav çûn, beşa herî zêde ya zanayan koçber bûn bo Hindustan û Asyaya Biçûk, ên ku man jî, hatin kuştin. Ew yek bû sedema vê ku xelk bikeve nava bêhêvtî de û bêhêvtî be. Herwisa bêhêvtî bibe yek ji taybetmendîyên fikrî ên wê serdemê ye “piranîya helbestên helbestkarên wê serdemê bi awayekî ne ku gellek caran hest dikî ku dîwana van helbestkaran di rastî der xemnameya wan helbestkaran e” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 83). Wate helbestkarên qonaxa sebka

Iraqî li çav sebka Xorasanî ku helbestên wan hilgirê mijarên şadî û xweşîyê bûye, lê wan di cihê wê de, bêhêvtî kirine sermesta helbestên xwe û ji vê rêyê ve bas ji rewşa xirab kirine ku Îran û herêm in tê re derbaz dibû. “Helbet nabe ku ew yek ji bîra me here ku xem beşeke neveqetîyayî ya helbestê bûye di hemû serdemekê de û bi dirêjahîya dîrokê helbest wekî mijarekê bi awayekî rêjeyî di nav helbestê de tê dîtin. Lê di sebka Iraqî de ji vê hindê derbaz dibe û dikeve nava taybetmendîyeke şewazî û helbesta vê serdemê pê tê nasîn” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 83).

Yekek din ji sîmayên herî girîng ên helbesta sebka Iraqî vegeerîyan e bo nav derûna helbestkar û li çav helbesta sebka Xorasanî derdikeve ku helbestkaran hawara xwe birine ber cîhana derve û mifah ji xwezaya rastîn û zindî werdigirin. Lê “ew dîtingeh li cem helbestkarên sebka Iraqî berevajî ye û helbestkar rû li cîhana derve dizivirînin û ji xwezaya rastîn û zindî dûr dikevin û di cihê wê de rû dikin cîhana navxwe ya xwe û girîngîyê didin bi mijara aqilî û abstraktan û bîrkirinên îdeal” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 84-85). Girîngîdana helbestkarên vê qonaxê jî bi derûn û vegeerîyan bo derûn di encama wan bêçareyîyê bû li hemberî kêşe û rûdaw û pêşhatên rasteqîn ên ku serûbinê herêmê bi xwe ve girtibû. Li rex hemû wan kêşeyan û bûyerên ku di qonaxa sebka Iraqî de hebûn, yekek din ji sedemên vegeerîyana helbestkar bo nav derûna xwe, pîrsa eşq û hezkirinê bû, jiber ku edebîyat di vê serdemê de wate serdema qonaxa sebka Iraqî, berevajîyê sebka Xorasanî, girîngîyê dide mijarên îrfanî û eşq û hezkirin û rengvedana xem û nerehetîyê. Helbestkar di cihê wê de ku mijûlî mijarên civakî û giştî be û mijûlî mijarên gelemperî be û mijûlî mijarên xweyî be û ji rêya derûn ve kartîye ku bas ji hest û sozên xwe bike (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 83). Lewra girîngîdana bi mijarên îrfanî û eşq ku bixwe du mijarê wijdanî ne û helbestkar ji rêya helbestên wan ve dîmenên rastîn ên dilê xwe derdixin. Ew yek jî bûye sedem ku hemû ew mijarên ku di qonaxa sebka Iraqî de dixin rû, taybetmendîya sebkê pê dibexşin.

Diyardeya bêhêvtîyê mijareke din ya berçav ya vehûnandina sebka Iraqî ye ku di helbesta helbestkarên vê qonaxê de reng vedaye. Rengvedana vê bêhêvtîyê jî beşeke wê pêwendîya wê heye bi rewşa sîyasî û aborî û civakî û exlaqî ya vê serdemê ve. Ew yek jî digel têkçûna bingegehên malbatê û civakê û jinavçûna zanayan û koça bi zorî ya xelkê û razînebûna wan bi deshilatê û wê bêdadîya ku per û baskên xwe kêşabû ser Îranê û herêmê. Herweha bîndestîya hêzên derekî û yên ku bîhanî

bûn digel kultur û ferhenga Îranê û di encamê de jî ew bêhêvîtiya kire hebûn. Beşa din pêwendîya wê hebû bi mijara eşq û ji hev veqetîyana me`işûq ku sîmayeke dîyar ya helbesta vê qonaxê ye, serhildana bêhêvîtiyê li cem xelkê Îranê û bi taybetî şanda helbestkar û nivîskaran û rewşenbîran weha kir ku ew bêhêvîtiya jî belav be, bo nav edebîyatê û di berhemên helbestkaran de reng vede û bibe sîmayeke cudaker a sebka Iraqî ji sebka Xorasanî ya qonaxên berî xwe.

1.4.3. Di Warê Edebî De Taybetmendîyên Sebka Iraqî

Guherîna sebka Xorasanî bo sebka Iraqî tenê di çarçoveya ziman û fikrê de nema, belkî wê guhertinê bîyavê edebîyatê jî girt. Wate alîyê edebî ya helbesta sebka Iraqî jî guherîn bi ser de hat û çend taybetmendî jê re çê bûne ku bi vê sedemê ve helbesta vê qonaxê pê tê nasîn û wê cuda dike ji helbesta sebka Xorasanî. “Xezel di edebîyata Rojhilat de zêdetir di hemberî Lîrîk a Rojava bi kar hatîye û ji vê dîtingehê ve em dikarin bêjin ku di warê xwezaya janrî ve, helbesta sebka Iraqî xwezayeke lîrîkî heye û li hember sebka Xorasanî de ku xwezayeke dastanî hebû” (Sîrwan Cebbar Emîn, 2014: 84). Ew yek jî vê rastîyê ji me re rohn û eşkere dike ku helbestkar ji rîya helbesta lîrîkî ve hest a xwe ji me re nîşan dide. Xînayî bi wateya awazeke xweş tê û rengvedana bîra Xînayî jî di rastî de bi “nesr” yan helbestê tê.

Di edebîyata Farsî de jî helbesta xînayî bi awayê lawandinê û sofigerêyê û rexne û gazindeyan... hwd. di çarçoveya xezel û mesnewî, çar birgeyî û qesîdeyan xwe nîşan dide. Ew jî yek e ji rûyên herî girîng ên helbesta xînayî, bo mînak medhkirin di helbesta Farsî wekî yek ji wan mijaran e ku wa hilgirê peyameke girîng a civakî ye û çendîn mijarên biçirûsk ên wisa di edebîyata Farsî de berçav dikevin. Peyama sereke ya van mijaran jî rohnkirina rewşa hest û sozê ye û pêwendîya wê heye bi hest û soz, pêwendî heye bi veqetîyan û bihevghîştinê. Her di vê çarçoveyê de helbesta xînayî tevlî hest û soza helbestkar dibe û hemû ew destewajeyên baskirî dibin çavkanîya helbesta xînayî ya ku ji dilê civakê ve serî hildide û hildikele.

Ew cure helbesta wekî yek ji helbestên herî pirralîgir ên edebîyata Farsî di vê qonaxê de tê danîn. Bi awayekî ku em dikarin bêjin ku tu liqek ji helbesta vê qonaxê bi qasî helbesta xînayî buhagiranî pê nehatîye dan, ew cureya helbestê jî mijara mehtkirin, pend, şîret û lorandinê (lawandinê)... hwd, bi xwe ve digire. Xeynî van mijaran jî mijara eşq û eşqbazî, di edebîyata Farsî ya vê qonaxê de girîngyeke zaf

heye û bi awayê xînayî hatîye nişandan. Ew yek jî di encama vê hezkirinê de bû ku helbestkarên wê serdemê, li pey vê rêbazê ketin. Bi rûkirina berçav ya helbestkaran bi nivîsandina helbesta xînayî zêdetir xezel çarçoveya dildarêyê digre xwe, helbesta xînayî û dildarî pêşkevtineke berçav bi xwe ve dibîne, “eşq dibe senter û me`işûq dibe pehewan û koma mijaran li dewrayê wê de dizivire” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 84). Ev cur helbest jî heya sedsala 19an de berdewam bû, lê derketine.

Sefewîyan bûn sedema koçkirina helbestkaran bo Hindustanê. Dawî car mijara helbesta xînayî û hemû ew mijarên ku hilgirê van peyaman bûn ku girîngiyeke kêr bi wan hatîye dan û helbestkar gellek bîr ji vê mijarê dikirin û eva ku dihate dîtîn jî, tenê derfetek bû bo mijara helbesta xînayî. Yek ji qalibên helbestê ên herî carrên sebka Iraqî xezel e ku ew yek li çav sebka Xorasanî ya qonaxên pêştir helbestkaran zêdetir peyrewî ji qesîdeyê kirine. Lawazîya edebîyata Farsî piştî wê dagîrkarêyê têt ku Îran û herêm digel de berbirû bûn ku bi sedema wê rewşa sîyasî û civakî û...hwd herifî û her çî bingehên ferheng û kultura Îranê bûn ji nav çûn. Bi vî rengî helbest û edebîyat di Îranê de ber bi paşve vegeîyan, lê ew yek ne bi wateya jinavçûnê bû. Belkî edebîyat li çav edebîyata pêştir piştî êrîşan zêdetir lawaz bû. Lewra serhildana xezel hevdem e digel ber bi pêşveçûna alîyê ziman û fikr û edeba qonaxa piştî êrîşên yek li pey yekê li ser Îranê, em dikarin bêjîn ku digel serhildana sebka Iraqî qalibê xezelê jî, ji dayîk bû û bû cihê girîngîdana helbestkarên vê qonaxê. “Xezel di qonaxa sebka Iraqî de derket û gihîşte lûtkeyê” (Husên Aqa Husênî, 1390: 3). Bi vî rengî ew bû yek ji sîma û rengên herî dîyar û cudaker ê sebka Iraqî digel qonaxên berî xwe. Jiber ku “form û qalibê carr ê helbesta qonaxa berî sebka Iraqî jî di nava edebîyata Farsî de pêk hatibû ji qesîdeyê, lê digel hatina sebka Iraqî, xezel cihê wê digre û dibe form û qalibê carr ê vê qonaxê” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 84).

Serhildan û carrbûna xezel di vê serdemê de li çav qesîde di nava deqa helbestê de gellek zêdetir e, mirov nikare bêje ku qesîde forma baw ya helbestê bûye di vê qonaxê de (Mihemed Xulamirizayî I: 148). Ew yek tê wateyê ku qalibê heyî û carr ê helbesta edebî a Farsî di vê qonaxê de xezel e. Lê bi vê wateyê na ku helbestkaran bi tenê girîngî dane xezelê, belkî li rex vê yekê jî bi rêjeyeke kêr qalibên din jî bi kar hatine “Xezel di edebîyata Rojhilatî de zêdetir li hemberî Lîrîk a Rojava hatîye bikaranîn” (Mihemed Xulamirizayî, 1391: 148). Bi vê wateyê ku xwezaya helbesta sebka Iraqî, lîrîkî ye û bas ji hest û soz û derûna helbestkar dike.

Herweha xezel di vê edebîyatê de qalib û çarçoveya helbestê ya taybet bi xwe heye û helbestkar peyrewîyê jê dikin. Lê dûr nine ku eva helbestkar peyrew dikin qalib û çarçoveya qesîdeyê be û tenê alîyê stayışî tê de nehatine baskirin, yan jî ew alî ji nav çube, jiber ku helbestkarên Rojhilat naveroka aşiqane di nav qesîdeyê de vehûnandine ku ew yek jî mijareke dualî di navbera qalibê xezel û qesîdeyê ye. Digel vê yekê jî “qesîdeyê dîrokeke dûr û dirêj heye û heya sedsala şeş wekî girîngtirîn qalib û çarçoveya helbesta edebîyata Farsî tê danîn” (Mihemed Xulamrizayî, 1391: 148). Qalib û çarçoveya qesîdeyê jî di vê qonaxê de gellek bicî bû, heya ku helbestkaran bona meht û îrfan û dozvekirin...hwd, her çi naveroka mijarên curbicur bûye, her hemû di çarçoveya qesîdeyê de darêtin.

Eşkere ye ku dereng belavbûn yan serhildana sebka Iraqî jî pêwendîya wê bi rewşa nebaş ya Îranê hebû, her ew yek jî bû sedem ku “helbestkarên sedsala şeşem helbestên xwe bi awayê xezel û qesîde binivîsin” (Sîros Şemîsa, 1382: 202). Wate sedsala şeşem sedsala guherînkari û ber bi pêşveçûna edebîyatê ye, sedsala hatina ser kar ya sebka nû ya helbestê ye. Serdema derçûn û guherîna helbestê ye ji qonaxeke kevn ber bi qonaxeke nû û herwisa xwerêkxistina digel rewşa wê demê ya Îranê. Lewra “xezela vê qonaxê bi awayekî giştî xezela dualî ye” (Sîros Şemîsa, 1: 202). Jiber ku helbestkarên wê serdemê ketibûna nava du helwestên cuda ên qaliba edebî ku ew jî xezel û qesîde ne. Digel du sebkên cuda ên kevn û nû ên Xorasanî û Iraqî. Di vê serdemê de helbestkaran dev ji sebka Xorasanî bernedan û bi sedema pêkhatina rewşa guncaw û bicî, çûne nava qonaxeke nû ya helbestê, da ku şewaza kevn û nû ya helbest û berhemên xwe raxin ber çavan. Helbest di vê qonaxê de wekî helbesta dualî a sebka Xorasanî û Sebka Iraqî tê danîn, bi vê ku helbestkaran peyrewî ji qalib û çarçoveya helbesta kevn kirine ku qesîde bû, hem jî peyrewî ji qalib û çarçoveya nû dikirin ku hatibû pêş, bo guherîna helbestê ku heman xezel bû. “Xezel di qonaxên destpêkî de şeweyeke sade bû” (Sîros Şemîsa, 1382: 202). Jiber ku destpêka serhildana sebka Iraqî û hatina ser kar a xezel, taybetmendîya xezel wernegirtibû, xwezaya xezel a wê serdemê şewe axavtina helbesta Xorasanî ye û zimanê sade û sakar heye “Sade û sakarîya xezel di qonaxên berî serhildana sebka Iraqî weha kir ku xezel nebe qalibeke carr û zal û serdest” (Mihemed Xulamrizayî, 1391:150). Lê serhildana Sebka Iraqî ku hevdem e digel êrîşa Moxolan li ser Îranê û dawî car ji dayîkbûna xezelê bi dawî hat, piranîya helbestkarên serdema Moxolan di

vehûnandina xezelan de xwedîşîyan bûn û karîn ku xezelê bibin bo nava qonaxeke nû, jiber ku sebka xezela kevn, bi awayekî giştî sebka helbesta Xorasanî ye ku qesîde tê de serdest bû. Digel vê yekê jî mijara helbesta vê qonaxê zêdetir eşqa mecazî û madî ye, helbestkaran kêmtir girîngî dane wate û pêgeh û meqamatên me`işûq, heta ew hinda ku girîngî jî danê, di asteke gellek nizm de ye li çav helbestkarên qonaxa sebka Iraqî.

Berfirehîya xezel weha kirîye ku boçûnên cuda hebin li ser çavkanîya xezel, lê eva ku ji alîyê me ve girîng e û maqûl e û pêwendîya wê bi mijara me ve heye ew e ku: Xezel heman “Texazûl” e ku bi sedema basnekirin yan jî jinavçûna mijara medhê ji qesîdeyê cuda bûye. Jiber ku di qesîdeyê de helbestkar helbestên dildarî û navê “memdûh” wekî nasnav bi kar anîne, lê dema ku em têne ser mijara xezel, bereva jî navê xwe wekî nasnav bi kar anîne û meqama me`işûq bilind bûye, ew yek jî di encama girîngîpêdana Selcûqîyan bû bi helbestkaran li çav Xeznewîyan. Ew kêmtir girîngîpêdana jî bûye sedem ku helbestkar rû li xezelê bikin û bi vî awayî hest û soza xwe eşkere bikin. Bi vî awayî qalib û çarçoveya xezelê bû sîmayeke edebî a girîng a sebka Iraqî. Herçend ku qaliba zal di sebka Îraqî de xezel e, lê digel vê yekê de jî helbestkarên vê qonaxê nikarin cura xezel pêkve girê bidin, belkî li pey rêyekê ne, bona baskirin ji mijarên xezelê. Eva ku merema me ye baskirina cureya xezelê ye “aşiqane û arifane” bi awayekî kurt, eva peywendîya wê bi mijara me ve heye, ew nine ku em bîn û bi awayekî berfireh bas ji cureyên xezelê bikin ku mijar gellek hildigire û bi baskirineke kurt em nikarin basê bikin. Lewra em tenê bas ji van du cureyê xezelê dikin ku weha ne:

Xezela Sofîyane: Ew cure xezel “bi awayekî rastbêjane û dirust bas ji hezkirina kûr û bigurr dike ku di navbera du kesan de rû dide,... ev jî hezkirina Xwedê û pêxember û pîr û meşayixan e” (Arî Subhî Ehmed, (?): 22). Helbesta sofîyane demekê çê dibe ku wiha dil sentera eşqê ye û meşûq tê de pehlewane koma mijarên vê cure xezelê li dewra eşqeke rastbêjî û Xwedê û pêxember û şêx ...hwd dizivire.

Xezela Aşiqane: Ew cure xezel li çav xezela sofîyane “pêk tê ji eşq û hezkirineke dûr ji heza cestayî û seksî ku ji vê rêyê ve arambûneke derûnî û canî ya aram dibexşe dilê helbestkar û wê vedigerîne bo demên ciwanîya eşq û jiwanê” (Arî

Subhî Ehmed, (?): 91). Wate her xezelek bi awayekî ji awayan bas ji hest û soza derûnî a helbestkar bike bi awayekî giştî dibe xezela sozdarî û aşiqane.

Helbesta sebka Iraqî xewdîyê taybetmendîya xwe ye ku helbestê cuda dike ji helbesta qonaxa berî xwe. Her ew taybetmendîya ye jî ku wê cuda dike ji sebka Iraqî. Wate em dikarin bêjîn ku yek ji cudahîyên helbesta sebka Iraqî û sebka Xorasanî li rex guhertinên zimanî û fikrî ew guhartin in ku di deqa edebî ya vê qonaxê de berçav dikevin û pêştir di sebka Iraqî de nebûn. Yek ji wan guherînkariyan jî danana xezel di cihê qesîdeyê de ye. Lewra xezela sebka Iraqî jî xwedîyê taybetmendîyên xwe ye û helbestkarên wê serdemê bi girîngî ve buhagiranî danê.

Yekek din ji sîma û taybetmendîyên xezela sebka Iraqî buhagiranîdan e bi “Texelus”ê. Girîngîdana bi texelusê tê wateya “îşarekirina helbestkar e bi navê xwe ê helbestkarêyê di dawîya helbestê de, bi taybetî di xezel û qesîdeyê de” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 86). Bikaranîna texelusê hevdem e digel serhildana sebka Iraqî jî, bi awayekî giştî helbestkarên vê qonaxê di xeta dawîya xezelên xwe de îşare bi nav û nasnavê xwe kirine ku ew yek jî li çav qonaxa berî xwe ku qonaxa sebka Xorasanî ye, tiştêkî carr û zêde naskirî ye û cihê girîngîdana helbestkarên wê serdemê bûye. Cihgirbûna texelusê girêdayî ye bi êrîşa Moxolan ku hevdem e digel peydabûna sebka Iraqî û “di xezela vê heyamê de texelusê cihê xwe girtibû, helbestkar di xeta dawî yan berî dawîyê, îşare bi nav û nasnavê xwe kirîye” (Sîros Şemîsa, 1391:153). Helbest di vê serdemê de çûye nava qonaxê nû de û bi cihgirbûn û çespendina texelusê di dawîya helbestan de taybetmendîyeke nû dida helbesta wê serdemê ku pêştir di helbesta sebka Xorasanî de berçav nakeve.

Di warê “serwa” de jî yek ji taybetmendîyên xezela sebka Iraqî bikaranîna paş serwayê ye ku pêştir di sebka Xorasanî de girîngî pê nehatîye dan. Yan jî hekê girîngî pê hatibe dan jî, eva bi awayekî gellek kêr berçav dikeve. Lewra serwa û pîtên serwa li her du sebkên Xorasanî û sebka Iraqî de berçav dikeve, lewra “serwa û paş serwa li her du sebkên Iraqî û Xorasanî de heya radeyeke zaf hevşêwe ne û ya ku dibe xala hevbeş a di navbera hebûn û carrbûna “Paş Serwa”yê, di sebka Iraqî de ku pêştir ew pêgeh û girîniya tunebû” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 80).

Paş Serwa, taybetmendîyeke girîng ya helbestê a sebka Iraqî ye ku helbestkarên wê qonaxê bona nîşandana hêz û şîyan û behreya xwe, paş serwa ya

curbicur û “Qers” bi awayekî bi kar anîne ku pêştir bi vî rengî buha pê nehatibû dayîn. “Paş Serwa” “peyvek yan destewajeyek e ku piştî serwayê tê, bi heman wateyî dubare dibe û nabe wateya wê ji xetekê ve bo xeteke din bê guherîn” (Hîwa Nûredîn Ezîz, 2016: 176).

Ji dîtingeha vê pênaseyê ve ew yek ji me re eşkere dibe ku eva helbestkar peyvekê yan destewajeyekê wekî serwa bi kar tîne ku dubarebûna wê peyv û destewajeyê ji xetekê ve bo xeteke din bandora wê li ser wateyê tunabe û hekî jî hebûye, guherîna wateya peyv û destewajeyê bi kar hatîye ku ew yek nabe Serwa. Herweha Ezîz Gerdî di pirtûka “Kêşnasîya Kurdî” de derbarê “Paş serwa”yê de dibêje: “Paş serwa peyvek e, yan çend peyvek e, piştî peyva serwa wekî xwe bi heman wateyê dubare dibin” (Ezîzî Gerdî, 2014:277).

Di qonaxa sebka Xorasanî de girîngî dana bi zanistên “Bedî’î û kêşnasî” di bilindbûnê de ye û helbestkaran hawara xwe birine ber bikaranîna hunera curbicurêyê ku tu carî di helbesta qonaxa sebka Xorasanî de tunebûye, jiber ku “kêşa helbestê di sebka Xorasanî de bi sedema wan alozîyên ku jê re çêbûne di encama neguncana zimanê kevn ê Farsî û ew peyvên qurs û giran ku di ziman de hebûne, di warê mosîqayê de, digel kêşa ‘erûz ya ‘Erebî de li hev nahê” (Sîrwan Cebâr Emîn, 2014: 85). Ev yek jî bûye sedem ku xala cuda ya di navbera van du sebkên de, di warê kêş û bikaranîna kêşa ‘erûz a ‘Erebî de hebe û helbestkarên qonaxa sebka Iraqî di helbestên xwe de peyrewî jê dikirin û qalibên xezelên xwe li ser dadirîştin. Yekek din ji sîma û taybetmendîyên edebî ên sebka Iraqî girîngîdan e bi “Hunerên rewanbêjîyê”, wekî dîyar e helbestkarên vê qonaxê, ‘erûz û babetên rewanbêjî li çav qonaxa sebka Xorasanî û pêş xwe zêdetir ber çav digrin ku dibe cihê baldana helbestkarên wê serdemê ku ji rîya wan ve helbestkar şîyana xwe dixin kar, bona vê ku baştirîn û ciwantirîn helbest û berhema xwe bixin rû. Lewra “dîyarîkirina hunerên rewanbêjîyê, di helbesta kesên wekî Se`idî û Hafîzê Şîrazî sebr û hûrbînîyeke zêdetir dixwaze” (Zeyneb Celîl Xelîl, 2011: 23). Jiber ku ew qonaxa, qonaxa vegeşîna mijara Îrfan û Xezel e. Qonaxa girîngîdana bi hunerên rewanbêjîyê ye ku digel xwe de, mijarên dînî û exlaqî û felsefî û herweha mijarên fikrî û herweha mijarên fikrî anîne nava helbesta vê qonaxê de. Ew yek bû qonaxeke nû derheq edebîyata Farsî û dubare rabûna helbest û edebîyatê piştî dagîrkirina Îranê ji aliyê êrişên derekî ve.

Eşkare ye ku helbestkarên qonaxa sebka Iraqî bi anîna mijarên zaf bo nav edebîyatê û piştgirêdan û girîngîdana bi hunerên rewanbêjîyê karîn ku edebîyata Farsî bibin nav qonaxeke nû, peyv û destwajeyên nû bînin nava deqên edebî ku hewcehî bi hûrbînîya zêdetir heye bo têgihîştin û cudakirina huneran ji yektir. Bi vî rengî “komeke huner û teknîkên helbestê di vê qonaxê de vegeşandibûn û bûne beşek ji sîma û taybetmendiyên edebîyata qonaxa sebka Iraqî” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 85). Ew yek vê rastîyê dibêje me ku li qonaxên berê û belkî heta di serhildana sebka Iraqî de “ew hunerane hêşta jî di nav edebîyata Farsî de bi tewahî serî hilnedane û di pêngavên piştire jî sade ye û kêmtir rengvedana wan di nava helbestê de heye” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 85).

Serhildana sebka Iraqî û carrbûn û girîngîpêdan bi hunerên rewanbêjîyê di vê qonaxê de bûye cihê girîngîpêdana helbestkarên vê qonaxê û bi awayekî ku her helbestkarî şîyana xwe bi kar dianî bona zêdetir ciwankirina helbestên xwe û bikaranîna hunera rewanbêjîyê tê de, jiber ku “rewanbêjî şêwazeke hunerî ye û rêyek e bona xizmetkirina edebîyatê û liqeke pevgirêk e di navbera nivîskar û xwîner” (Selîm Reşîd Salih, 2005: 33). Bi vî rengî helbestkaran bo nîşandana wêneyeke zeq ji aliyê xwîner ve girîng dane van cureyên hunerê, da ku ji rîya gotûbêj û axavtinê ve her tim bi awayek zindî bimîne, mana vê zindîbûnê jî peywendî heye bi ziman ve jiber ku her zimanek alaveke zindî ya taybet bi xwe heye, bo avabûna şêwaza taybet û cuda ku wê cuda dike ji zimanên din. Zimanê sebka Iraqî jî digel serhildana wê, pêşveçûn bi xwe ve dîtîye, bi awayekî ku helbestkar di vê serdemê de afirandinên nû kirin di deqên edebî de. Li rex girîngîdana bi rûçik û rengûrûyê zimanî û fikrî, girîngî dane sîma û taybetmendiyên edebî jî û şîyana xwe tê de bi kar anîne ku kîjan helbestkar ciwantirîn deqa edebî pêşkêş bike. Helbestkarên sebka Iraqî bi awayekî girîngî dane ciwankarî a helbestê û hunerên rewanbêjîyê, heya vê qonaxa ku hunera rewanbêjîyê anîne nava edebîyatê ku berê di nava helbestên helbestkarên berî qonaxa sebka Iraqî berçav nakeve. Lewra em dikarin bêjin ku yek ji taybetmendiyên cudaker ê sebka Iraqî digel sebkên berî wê, ew buhagiranîdan e bi hunera rewanbêjîyê. Jiber ku “ew şêwaz a girîngîpêdanê ji qonaxa sebka Xorasanî û qonaxên berê de nehatine dîtîn” (Sîrwan Cebar Emîn, 2014: 85).

BEŞA DUYEM MÎRZA EBDURREHÎM (WEFAYÎ)

2.1. Jîyan Wefayî

Navê rastîn yê helbestkar Ebdurrehîmê Mela Xefur kurê Mîrza Nesralah e: Di nav gel de wek Mîrza Ebdurrehîm navdengîya wî derketîye, di mijara cihê jidayîkbûna helbestkar hemû belgenamê nîşanê bi wê dikin ku Wefayî li Sablaxê (Mehabad)ê ji dayîk bûye. Lê di derbarê sala jidayîkbûn û koça dawî ya helbestkarî de nêrînên cuda hene, ji ber vê yekê destnîşankirina hatina dinyayê û malavaya şair ji dinyayê ne kareke hêsanê ku em bidin xuyakirin. Elaedîn Seccadî di pirtûka “Mêjûy Edebî Kurdî” de sala 1838 ji bo sala hatina dinyayê û sala 1889 jî jibo wefata helbestkar Wefayî destnîşan kirîye.

Herweha Mihemed Elî Qeredaxî jî di pêşgotina “Dîwana Wefayî” de bal kişandîye ser sala jidayîkbûn û koça dawî ya Wefayî û dinivîse ku Wefayî di sala 1844an de ji dayîk bûye û di sala 1902an de jî çûye ser dilovanî Xweda. Dîyare Mihemed Elî Qeredaxî jî ev salên hanê ji hejmarê 1303 a rojnameya Jîn wergirtîye û wek belgeyeke sala hatina dinyayê û koça dawî ya Wefayî destnîşan kirîye. Bi vî hawî Marûf Xeznedar jî her li ser dîtina Mihemed Elî Qeredaxî bûye, ango ji bo destnîşankirina sala jidayîkbûn û koça dawî ya Wefayî balê dikişîne ser wan salên ku Mihemed Elî Qeredaxî destnîşanî kirîye. Her ji ber vê minasebetê Giwî Mukrîyanî û Seydîyan amaje bi wê dikin ku Wefayî di heyama navbera salên (1844 - 1914) jîyabe. Bi hişyarî li ser wan zanyarêyên li ber destê me de ne, hemû ew zanyarî û çavkanîyên balê dikişînin ser sala hatin dinyayê ya Wefayî, hemû li ser vê nêrînê yek fikrin ku helbestkar Wefayî di sala 1844an de li taxa Wênce ya bajarê Mehabadê ji dayîk bûye. Herweha li ser mijara koç û xatirxwestina Wefayî heta niha jî xirecîrek li ser heye. Lêbelê Dr. Osman Deştî di pêşgotina “Dîwana Wefayî” de ku lêkolîna herî dawî ye li ser helbestên Wefayî ye, berfirehtirîn zanyarî di derbarê jîyan û serpêhatîya helbestkar de bi belgeyên raber kirine. Osman Deştî bal kişandîye ser ku Wefayî di sala (1902)an de koça dawî kirîye. Dîyare wî jî pişt bi wan zanyarêyên ku di pirtûka “Yadî Merdan” a Mela Abdulkêrîm girê daye û ev dîtina Abdulkêrîm kirîye belgeya tomarkirî li ser koça dawî ya Wefayî. Eşkere ye ku Mela Abdulkêrîmê Muderîs yek ji wan çavkanîyên cihê bawerêyê ne ku salên naverasta heştêyan in û

balê dikişîne ser helbestkar Zêwer ku yek ji endamê wê desteya ke li ser daxwaza Sultan Ebdulhemîd bi yawerîya Şêx Se'îd di sala (1901)an de diçine Stenbolê û li koşka Mabeyn de dibin mêvanê Sultan Ebdulhemîd, piştî ku sê mehan li wir dimînin bi şûnde, ji cem Sultan Ebdulhemîd vedigerin. Di rê de ev destê dibin dû beş û beşek ji wan vedigere Silêmanîyê û beşê din jî ji bo merasîmî bicihanîna Hecê bir ê dikevin û êdî Wefayî di wê rêwîti û rêya Hîcazê de mirîye. Herweha di rojnameya jîn de jî hatîye nivîsandin ku Wefayî di sala (1902)an de le çola Şamê wefat kirîye û hevalên wî, li wê deşta dêm de ew spartine axê. "Rojnameya jîn" hejmara 1303an ev jî weke çavkanîyeke din wek belge nameya koça dawî ya Wefayî raber kirîye ('Usman Deştî, 2019: 103).

2.2. Bernavkên (Mexlesên) Wefayî

Navê rastîn yê helbestkar Ebdulrehîmê Mela Xefur kurê Mîrza Nesralah e. Di nav gel de wek Mîrza Ebdurehîm navûdengîya wî derketîye, ji ber ku Şêx Ubeydulahê Şemzînî wek Mîrza gazî wî kirîye, ev jî bi vê me ronî dik ku Wefayî melatî tamam kirîye, lê melatî nekirîye.

Li ser bernavkirîya wek Wefayî jî ku Mîrza Ebdulrehîm weke mexles ji bo helbestên hilbijartîye. Eyûbiyan balê dikişîne ser ku Mîrza Ebdulrehîm maxles Wefayî be, behre ji mexlesa zanayê navdar Ebul Wefa El-Kurdî² wergirtîye.

2.3. Berhem û Nivîsarên Wî

Her çiqasî, hetanî dawîya van çend salên dawîyê jî tu agahîyek li ser berhem û nivîsarên Wefayî li berdest nebûn. Ew ên li berdest jî bûn, tenê helbest û honanên wî bûn. Bi hewl û koşîna wan kesên ku di xema netêkçûna dîrok û wêjeya Kurdî de bûn, di van heyamên dawîyê de dikarîn gelek berhem û nivîsarên Wefayî zindî bikin, beyda bikin. Em jî di vir de balê dikişîn ser berhemên wî ku ev in:

1. Dîwana Wefayî Ya Kurdî: Ev dîwan wek beşa yekemîn a dîwana Wefayî tê zanîn û ji komek xezel, qesîde, parçe, melemmeh, pêncîn, pênc xiştayî, musemmet û tercî' bend pêk hatîye.

² Navê wî Şêx Ebdurehmanê kurê Ebulwefayê kurê duyemîn ê Şêx Sîracedidîn e (1253 -1285). Di destpêkê de bûye cihgirê bavê xwe û di îrşad û rênişandana misilmamanan de ji bo rêya şerî'et û terîqetê. Ji bilî rêberîya terîqet û oldariyê herweha şa'irêkî mezin û payebilind ê serdema xwe bûye (Mela Abdulkerrîm Muderîs, 1983: 199an binêrin).

2. Dîwana Wefayî Ya Farsî: Ev berhem jî bi heman şêwaza dîwana wî ya Kurdî ye ji xezel, qesîde, parçe, melemmeh, pêncîn, pênc xişteyî, musemmet û tercîf bend û mesnewîyat pêk hatîye.

3. Tehfetu'l Murîdeyîn: Ji bîranînên Wefayî pêk hatîye ku behsa salên xwe yên ronîbûnê yên li derwêşxaneyê (tekîye) Nehrî dike, tevî birrek behs û xwastên taybet ê keramet û xelîfeyên Neqşebendî.

4. Seferinameya Wefayî: Ev nivîsar jî ji serpêhatîyên jîyan helbestkar pêk tê ku behsa zîyareta Wefayî ya duyemîn ji bi hevdîna Şêx Ebdulqadir û bicihanîna rê û resma Hecê pêde diçe.

5. Mektubatî Wefayî: Ji komek name û tomar û nivîsarên Wefayî ku ji bo Şêxên Nehrî nivîsandine pêk tê.

6. Kîfayetul Îslamî Wefayî: Eyûbîyan bal kişandîye ser vê tiştê û dibêje ev cuda ye, lê her ew bixwe jî dibêje ku ew nivîs nedîtiye.

7. Aheng û Awazên Wefayî: Ev jî komek hewa û awazan pêk tê ku ji bo xezelên xwe lêkirine. Lê ev aheng û awaz jî bi şêwazê sema'î û pişt hev de guhertine, lê hetanî niha bi şêweyê zanistî kar li ser nehatîye kirin ('Usman Deştî, 2019: 143-144).

2.4. Perwerdehîya Wefayî

Serborî û pêvajoyên perwerdeh û jîyana Wefayî hê ji zaroktîyê ve dest pê dike, ango salên jîyan û despêkirina xwendinê ye her weku hemû helbestkarên din ê Kurd xwe dispêre serdema zaroktîyê. Di temenekî pir zû de li cem bavê xwe dest bi xwendinê dike û piştê jî li mizgeft û derwêşgehên (tekîye) Mehabadê de feqîtiyê dike û xwendina xwe didomîne. Eyûbîyan dibêje: Wefayî di temenê şeş salî de li cem bavê xwe dest bi xwendinê kirîye û bi rêya pirtûk û namîlkeyên taybet li ser zanista îslamîyan xwendîye, tevî van serf û nehî jî xwendîye. Piştê ji bo ku xwendina xwe berdewam bike li herêmên wek Şarezûr û Silêmanî û Musilê digere û ji wir jî berê xwe dide Bexdayê û diçe derwêşgeha Ebdulqadir Geylanî û xwendina xwe didomîne. Wefayî bi çûna xwe ya pêvajoya her asta nû ya xwendinê de, xwendawariya asta zanistî ber bi pêşve dice, wisa pêşve diçe ku bi awayê baş şarazayîya wî li ser fîqh û şer'iyat û luxetê 'Erebî û 'Ecem û bîrkarî û stêrknasî û dîroka wêjeyê çêbûye ku ev

mijarên li jorê gişt mijarên serekî yên dersê bûne di xwendina feqîfîyê de û li mizgefta Hebas Axa û mizgeft Sûr a Sablaxê û li deverên din xwendina xwe domandîye.

Wefayî piştî ku diçe li Bexdayê derwêşgeha Ebdulqadir Geylanî, êdî dest bi xwendinê dike û derbazî asteke nû ya zanistê dibe û perwerdeyeke baş peyda dike û zanistên Îslamîyan dibe, piştî ji domandina xwendina xwe vedigere Mehabadê û li wir li cem melayên navdar yê vî bajarî yên weke Mela Abdulla Pîrebab û Mela Ehmedê (Sedril Ulema) xwendina xwe didomîne.

Wefayî, di derbarê zanista Îslamîyan de xwedî zanebûnek bilind bû, ligel vê ji bilî zimanê Kurdî zimanê Êrebî û Farsî jî baş dizanî, eşkere ye ku ‘Erebîya wî bi qasî melayekî zana pêş ketîye û bi rêya xwendina olî fêr bûye. Zimanê Farsî jî bi rêya xwendina helbestên helbestkarên Fars û wêjeya Farsî re fêr bûye. Bi vî rengî bi tamamî şarezayîya wî li ser dîroka wêjeya wê serdemê çêbûye, hê di wê serdemê jin xwestîye û bi Zara Xatûn ji Mehabadê re jîyana zewicîye û bi hev re mal danîne. Serdema navdengî û têngiştina Wefayî çî ji alîyê civakî û kesayetîyê ve çî ji alîyê asta fikrî û edebî û olî ve xwe dispêre serdema ku helbestkar li cem Şêx Ubeydulahê Nehrî helbest hûnandine, ev jî belgeyeke piştirastkirinê ye ku Wefayî bi xwe di bîranînên xwe de bal kişandîye ku bi salên dirêj li derwêşgeha Nehrî, li cem Şêx Ebdulahê Nehrî jîyana xwe domandîye û bûye yek ji mirîd û vebêstên Şêx Ebdulahê Nehrî ku di helbestên Wefayî de hogirî û girêdana wî ya bi Şêx Ebdulahê Nehrî re bi awayeke eşkere reng vedide (Mihemed Heme Baqî, 2010: 39).

Dostî û girêdana Wefayî bi Şêx Ebdulahê Nehrî û mala wan re pêvajoyeke giring di jîyana helbestkar avakirîye û di helbestên xwe de jî rengê vê daye der, bi şêweyekî, Wefayî di wê serdemê de gelek helbest û metnên têkildar bi dostî û girêdana xwe ya bi vê malê û şêx re dinivîse. Ev helbest û metn jî di çarçoveya wesf û stayaşa şêx û şîngirtin û lorandinê nivîsandine ku beşeke giring ên helbestên Wefayî girtine nav xwe, lê bi serhildana şoreşa Şemzînanê a sala 1880an û çendîn caran têkbirina şoreşê ji alîyê dewleta Osmanî ve, êdî Wefayî bi destûra şêx ji bo ehwalpîrsîna xizm û malbata xwe vedigere Mehabadê. Êdî her wisa dike ku Jareke din Wefayî nikare were dîtina Şêx. Sedemê vê jî ji ber şer û pevçûnên herêmê bûn, ji ber vê yekê jî Wefayî naçar debe her li Mehabadê bimîne, bi vî hawî dikeve navbera

du beraşê ecêb û nêzîkbûna xwe ya derwêşane ku bi vê mijûl bûye, ji alîyêke din ve jî debara jîyana xwe û malbata xwe medreseyek di mala xwe de ava dike û xizmetî ji zarokên wê deverê re dike. Bi damezrandina wê medreseye re, ne tenê zarokên bajêr, axayê gundên dewrûber jî zarokên xwe dişînin cem Wefayî, ji bo xwendinê û sûd ji berhemên Wefayî bigrin. Wefayî tevî fêrbûn û xwendinê û xweşnivîsandinê kur û keçên herêmê fêrî destûrên helbest û edebê kirine û huner û awazê helbestê jî nîşanî wan daye (Mistefa Seyid Mîne, 2008: 230).

Wefayî sê caran çûye Hecê û merasîma zîyareta Hecê bicih anîye, cara dawîyê di dema bicihanîna merasîma Hecê û di veşartî de bi desteyek mirîd hevrêwîyan re Wefayî yekcarî malavayîyê ji jîyanê dike û di rêya Hîcazê de tê veşartin (Umêd Aşna, 2009: 40).

2.4.Cihê Wî Di Helbesta Klasîka Kurdî De

Wefayî wek nûner û şagirtê dibistana Nalî yê Mukrîyanê tê zanîn. Bi vê jî dibe serdesteyê nevîyê yekemîn ê helbestkarên qonax helbesta klasîk a Kurdî a herêma Mukrîyanê wek helbestkarê herî mezin ê Mukrîyanê tê navnîşankirin ku karîya di nivê duyemîn ê sedeya nozdehemîn de dibistana helbesta seretayî ya sedeya nozdeh a kumancîya jêrîn ku wek dibistana Baban hatîye naskirin biguhêze Mukrîyanê. Bi vî hawî ji bo pêşkertina helbesta Baban û damezrandina dibistana vê dibistanê di Rojhilatê Kurdistanê de roleke xwe yê mezin hebûye (Mistefa Seyid Mîne, 2008: 230).

Bandora helbestkarên Fars û helbestkarên klasîkî yê Kurdî bi ronî li ser dîyar e, bi taybetî ji bandora Nalî, Kurdî û Mehwî, bi vê girêdayî di gelek deveran de bandora Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran li ser helbestên wî de xwuya dibin. Bandora Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran jî xwe dispêre jîyana helbestkar li herêma Hekarêyê û mayîna li derwêşgeha Nehrî. Heyameke dirêj li wê deverê dimîne û dibe mirîdê Şêx Ebdulahê Nehrî, lê di nav wan hemû helbestkarên ku bandoreke rastewrast li ser Wefayî kirine û ev bandor jî di helbestên Wefayî de reng vedaye di serî de Nalî ye. Hingî bandoreke berçav bi ser Wefayî de hebûye, ji ber vê jî fikra Nalî bi şêweyeke berbiçav di helbestên Wefayî de rengê xwe vedaye. Wefayî yekemîn helbestkarê klasîkî yê Kurdî ku karîye di asta helbesta Nalî de helbestê binivîsîne. Piştî Nalî di pileya duyem de Mistefa Begê Kurdî ku bi pileya duyem de ji wan helbestkara ye ku

rasterast bandora wî di zimanê helbesta wî di helbestên Wefayî de tîn dîtin. Ast bilindî û berhemên Wefayî wisa dike ku bibe serdesteyê rêberên helbestkarê Mukrîyanê. Bi cureyekî helbestkarê mîna Şêx Ehmed Korî Mukrîyan, Mela Salih Herîqî û Mîsbahuddîwanî Edeb... û çendîn helbestkarên din ên navdeng ên deverê bibin şagirden Wefayî û di medreseya wî de fêrî darsa destûrên helbest û edebê bibin (Osman Deştî, 2019: 114). Bi vî hawî behredariya Wefayî û xwuyabûna helbestên wî yek li pey yekî, Wefayî û astbilindîya helbestkar wisa dikin ku Wefayî bibe yek ji şehsiwarên meydanî helbest û di edeba Mukrîyanê dihête dîtin.

Ji ber vê yekê heke em bixwazin ronîyê bidin ser dibistana helbesta Mukrîyanê, hingê divê em di destpêkê de balê bikişînin ser zîrektîya Wefayî ku serdeste û şehsiwarê meydanî helbesta Mukrîyanê ye û wek bingehdanêrê vê dibistanê ye ku alîyê Îranê tê naskirin û her li ser destê wî jî her du helbestkarên mezin ên wek "Herîq³ û Edeb⁴" li Mukrîyanê bingehê helbesta Kurdî wek çand peş ket û zeliqî. Eşkereye ku van helbestkaran jî bi rêya helbest û berhemên xwe di dawîya sedsala nozdehemîn de karîne cureyek ji ferheng û keltûrê bînin meydana helbest û edebê, ev ferheng û keltûr jî di dewraneke wisa de bû bingeha helbest û edebîyata devera Mukrîyanê û em dikarin bêjin bi dibistana helbesta Mukrîyan hat naskirin. Ji ber wê wexta behsa helbest û edebîyata Kurdî ya li alîyê rojhelatê Kurdistanê tê kirin, pêwîste rasterast behsa Wefayî were kirin, ji ber ku, ji bilî Wefayî kesek nayê dîtin ku bi vî hawî û bi vê berfirehîya Wefayî bi ser zimanê Kurdî de psqijî be. Ji ber vê "heke Wefayî di meydana dibistana helbesta Kurdî ya Mukrîyanê de pêş karwanê rêçikên be, wisa tevî vê jî di bin çavdêriya wî û li ser destê Herîq rêbaza helbesta Kurdî belav bûye û pêş ketîye ku yek ji şagirtên Wefayî

3 Herîq: Yek ji şa'irê mezin ê xwediyê helbestên klasîkî yê nîveya duyemîn sedeya nozdehemîn û seretaya sedeya bîstemîn. Navê wî Salihê kurê Nesrulah e, di navbera salên 1856- 1909-an de jiyaye. Di nav mela û mîrza û rewşenbîrên kurd de wek Mela Salih navdeng bûye û bernavkê xwe jî wek Herîq ji bo hebestên xwe bikaranîye.

4 Edeb: Navê wî rastîn Ebdal Begê kurê Ehmed Begê kurê Rustem Begê kurê Baba Umerê Seyfeddîn e, bernavkê wî helbestê jî Edeb e, di navbera salên 1859-1916an de jiyaye û leqeba Misbeheddîwan ji aliyê Mihemed Elî Şahê Qacar ve lê hatiye kirin û li Tewrêzê niştecih bûye. Di nav civaka xwe ya kurdewarî de wek Ebdulah Begê Misbeheddîwan û Edeb navdengiya wî derketiye.

tê danîn û di medreseya Wefayî de fêrî hunerên helbest û edebê bûye" (Refîq Hilmî, 1988: 119).

Bi vî hawî em dikarin Wefayî wek rêber û serdesteyê helbestkarên helbesta Mukrîyan bi nav bikin ku helbest û edebîyata Kurdî li ser destê wî gihiştîye lûtkeyê. Di vê qonaxê de helbest û edebîyat ji alîyê naverokê ve li dora babêtên cihê cihê dizivire û be şêweyekî berfireh babetê olî li xwe digre "munacat û ne't û soffizim" tevî vê jî helbestkaran giringîyeke zêde dane helbesta 'îşq û ewîndarî û weke babeta serekî helbestkarên wê serdeme ecêbmayî hiştinê, di vir de ji bilî helbesta stayiş û wesf û felsefik di helbest berhemên helbestkarên wê serdemê de beşêweyek zelal dikeve berçav, ji ber ku ronî xistine dîwana Wefayî vê babeta olî û soffizimîyan û 'îşqê beşêke zêde ji helbesta vî helbestkarî dagir kirîye, beşêke zêde ji şî'îrên xwe jî li ser stayîşa Xwedê û pêxember û şêxan nivîsîye û tevî tevî vê jî dîwana wî di çaroveyeke Kurdî de tê dîtin ji bo ferheng û nivîsîn û wergirtina bêjeya Kurdî ji helbestên wî, bi vê jî Wefayî dikeve nav rêza wan helbestkarên ku di xema zimanê xwe de bûne, bi coşîn berê xwe dane ferhengû keltûra xwe û resenîya peyvên Kurdî di hebestên xwe de bikar anîne (Mihemed Elî Qeredaxî, 1984: 34).

BEŞA SÊYEM

SEBKA IRAQÎ DI XEZELÊN KURDÎ YÊN WEFAYÎ DE

Bi serhildan û hatin ser kar a sebka Iraqî ve birrek taybetmendî helbest û edebîyata vê qonaxê ku helbest û edebîyata vê qonaxê pê tê cihêkirin ji helbest û edebîyata qonaxa sebka ya Xorasanî û qonaxa berî vê sebkê. Ew taybetmendî jî ji taybetmendîya “Ziman, Fikr û Edebî” pêk tên ku her yekî ji van taybetmendîyan jî sîma û xasîyetî xwe ya taybet hebû. Helbestkar Wefayî jî ji bandora helbestkarên Fars û rewşa herêmê re derbaz bûye û helbestên xwe nivîsandine û peyrewîya taybetmendîyên sebka Iraqê kirîye.

3.1. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Taybetmendîyên Ziman

Zimanê helbesta klasîk a Kurdî, zimanêkî giran e, giranîya zimanê wî jî ji têkilkirina bejêyên bîyanî, bi taybetî ji zimanê Farsî û ‘Erebî tê. Ev têkilkirina bêjeyên bîyanî li zimanê helbesta klasîkî ya Kurdî, em dikarin wek ji sîma û taybetmendîyên zimanên sebka Iraqê ve têkildar bikin. Ji ber ku yek ji sîmaya herî berbiçav a zimanê sebka Iraqê giringîdana bêjeyê bîyanî ye bi taybet bêjeya ‘Erebî û Farsî ku helbestkarên vê qonaxê bikaranîne. Helbestkarên Kurd jî şarezayîyeke wan a baş li ser zimanê ‘Erebî û Farsî hebûye. Herweha zimanzanê baş bûn, di encama hevsnorîya wan bi dewleta Fars û dewletên ‘Erebî re hebûye, bandorbûna wan jî xwe dispêre helbestkarên bi ser wan zimanan ji ber wê e Wefayî jî weku tevahîya helbestkarên din ên klasîka Kurdî bandora zimanê Farsî û ‘Erebî li ser çêbûye. Ev bandor jî di helbestên wî de reng vedane. Wefayî her çiqasî beşa piraniya helbestên xwe bi zimanê Kurdî nivîsîne jî, lê digel vê jî giringîyeke zêde daye Farsî û ‘Erebî. Ev giringîdana Wefayî jî ji çarçoveya bêjeyê derketîye û gihiştîyê wê radeyê ku Wefayî beşeke pir ji helbestên xwe bi zaminê Farsî binivîse. Di peyde jî giringî daye zamanê ‘Erebî û çend perçe helbestên xwe jî zimanê ‘Erebî nivîsîne û têkelî helbestên Kurdî kirine.

3.1.1. Di Asta Peyv û Risteyê De Zimanê Xezelên Wefayî

Zimanê Helbesta Wefayî weku hemû tewawî helbestkarên di ne bêbeşe di bêjeyên bîyanî de, ev giringîdayîna Wefayî ya ji bo zimanê bîyanî di pişt zimanê Kurdî de ji çarçoveya bêjeyê derdikeve û gihiştîye wê astê ku helbestkar hêz û

deshilatîya xwe di asta wî zimanî de bikar bîne ku bêje jê wergirtine ku gelek helbestên xwe pê binivîsîne. Ji ber wê balkişanda li ser helbestê helbestkar ji me ron dibe ku helbestkardi pişt zimanê Kurdî de ku zimanê wî bi xwe ye girîngîyeke zêde daye bêjeyên ‘Erebî û Farsî û bi vî hawî têkileyeke pir zêde ji bêjeyên Kurdî, Farsî û ‘Erebî di helbesta wî de xwuya dikin. Ku dibêja:

*Girye û xendey zor û kem bê, sozî sîney demAdem bê
 Şadîy şîwen, xoşîy xem bê, sax û kwêrî sîrr û 'elen
 Cergî hemû cêy neşter bê, xwênî cergî ke bê derbê
 Heta heşrê xwênî her bê, sewdaser û xwênîn kefen
 Seyrî afaq û enfusî, behsî le sefhey dill nûsî
 Ga bethayî ga quddûsî, rehrrew bêpê, xoş xû bêten
 Fî çîqet eşbahuna saret yehwa erwahuna
 La yefterîq ecnahuna kelgeyru yeşwa lîlwegnî
 Xozgem bewey sewdayîye, serxoşî şîn û şayîye
 Pîr û şêx û Wefayîye sakin sallêk leher weten
 Yaêahî fenzur haleke mîn malîke mîmma lekî
 Teqwa we îlla we eleke we eba leke mîn el'eden*

Wefayî: 178

3.1.2. Nermenezikîya Xezêlên Wefayî

Yek ji taybetmendîyên sebka Iraqê kû ji helbesta sebka Xorasanê cuda dike, nermenazikîya zimanê wî ye. Bi wê wateyê ku helbestkar di helbestên xwe de bi zimanekî nermenazikîyê mûsîqaya helbestên xwe dihûnîne. Ev nermenazikîya zimanê helbesta sebka Iraqê peywendîya xwe ya rasterast bi têkçûna warê derûnîya xelkê Îranê ve hebûye. Ji sedema tehdîdên yek li pey yekî li ser Îranê hebû. Ji ber vê pêwistîya gel bi xîtabeke arambexş û zimanekî nermenazikî hebû da ku bi vê rêyê ji wê girêya derûnî rizgar bibe. Ji ber wê helbestkarên bi ser sebka Iraqê bi rêya helbestên xwe ve û bi bikaranîna zimanê nermenazikî û dûr ji tundutîjî û zorî xîtabên xwe pêşkeş dikir. Ji ber we helbestkar Wefayî jî di bin xem û rewşa herêmî û qewmînên bêhejmar yên erdnigarîya jê dayîk bûyî, di bin bandora helbestkarên Fars de bi awayekî helbestên xwe nivîsîne ku rasterast li ser derûnîya xwîner yaxud bîser bandor çêdikir. Ev bandor jî peywendîya wê bi nermenazikîya zimanê helbest û mûsîqaya helbesta Wefayî re hebû. Ji ber ku Wefayî yek ji helbestkarên herî jîrek e

ku helbestên wî nermenazik û mûsîqî ne, ew bi xwe jî awazdanerek bihêz bûye, tevî vê jî gelek helbestên xwe bi strandin nivîsandine.

Pê mîllê gullî beharîm le to ta be key cuda bim?

Werewe, be şertî caran, rojî sed car fîda bim

Xallî çaw û goşey ebro, dû dînyan kirdim Leser to

Ya bimke pîrî meyxane, ya murîdî xaneqa bim

Serekem fîdat 'ezîzm, were zîz mebe Leser dill

Sere payebendî toye, dille mallî xote ta bim

Şew be tay zulfî şewandim, roj le tawa detsûtandim

Çi xuda le to helldegrê be şew û be roj 'ezabim?

Nefesê molletê bde 'umrim, bidbînim zulfeket bigrim

Be kemendî towe bmirm xoştre tawekû reha bim

Le nêw menzerey dûderî xoşe seyrî mewcî behrî

Were ser çawm 'ezîzm, çi dekey le dlley kebabim?

Xemzedey nazî çawt bim meylî ebroy to qet nanê m

Min ke hat û qîblem gorrî, yaxuda kafr bê celabim!

Wefayî: 197-198

3.1.3. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Derketina Têgînên Zanistî

Yek ji sîma û taybetmendiyên zimanê helbesta sebka Iraqê giringîdayîna têgîn zanistan e. Bi taybetî têgînên zanista îslamîyan, ev jî ji ber sedema ku peywendiyên qayîm yê helbestkarên wê serdemê bi derwêşgah û mizgeftan ve heye. Wefayî jî weku şaîrekî Kurd ku di helbestên xwe de bal kişandîye ser birrek bêje ku dikevin navqalibên têgînên zanistan. Ev giringîdayîna helbestkaran jî, bi taybetî Wefayî bi têgînên zanistî û zanistên îslamîyan, di bin bandora helbestkarên bi ser sebka Iraqîyan ve çêbûye. Ji ber ku giringîdayîna têgînên zanistî û îslamîyan di helbesta Îranê ya wê serdemê de wek sîmayekî taybetî ya helbesta sebka Iraqê tê qebûlkirin ku ji helbesta qonaxa sebka Xoresanê û qonaxa berî xwe cuda dike. Ji ber wê em hatina têgînên di helbesta Wefayî de bi çend nimûneyan radixin pêş çavan:

Rengvedana têgînên bijîjkî yê destpêkê bi şeweyekî giştî di helbestên helbestkarê klasîk de tînin ku ev qonaxe pêşveçûneke girîng bû di zanista bijîjkî de, Wefayî jî weku helbestkarên din di helbestê xwe de bal kişandîye ser têgînên bijîjkî. Ew têgînên ku helbestavanî bal kişandîye ser, li gor serdema ku helbestkar tede jîyaye şitêkî nû û pêşketî bû di warê zanista bijîjkî de, ev jî xwe dispêre zîrektî û

pisporîya Wefayî ku wisa hay jê heye, ji bo çareserîya derdê rewşa xwe di helbestên xwe de bal kişandîye ser.

Neşterî çawî hebîbim dê be sînemda deçê

Merhemî nazî tebîbim bo dillî xwênîn deba

Wefayî: 75

Bikaranîna wan têngînên ku Wefayî bal kişandîye ji bo serdema xwe zanîyarêyên baş û hûrgil û destpêkeke baş bûn ji bo zanista bijîjkî, rengvedana têngînên bijîjkî di helbestên Wefayî de jî xwe dispêre Xwedênasî û pisporîya helbestkar di mijarên cuda cuda de.

Meger mujganî neşter bû, hekîmî çawî dilber bû

Ke xwênî dilmî pêderbû, nexoşî xoy mudawa kird

Wefayî: 75

Di helbestên Wefayî de gelek têngînên bijîjkî tên dîtin ku helbestkar di wexta beyankirina rewşa derdê de anîne ziman û di helbestên wî de jî, bi awayekî ron û eşkere tên dîtin. Herweha Wefayî, ligel qalkirina têngînên bijîjkî, di helbestên xwe de qala têngînên pîşesazî û kîmya û fîzyayî jî kirîye û di helbestên wî bi eşkereyî mirov pê dihese.

Karga xakî beser, westa berru û sîne û birot!

Nirxî qaqum, qedrî xez, bazarrî sincabî şka

Wefayî: 44

Di vir de helbestkar bal kişandîye ser têngînên “karge, qaqum û xez sincabî”ê ku dikevin nav qalibe têngînên pîşesazîyan û di bazara wê demê de têngîn jî li gor kar û barên bazirganî û guherînên bazirganîyê bikar hatîye, ji ber wê Wefayî jî wek sûd dîtîye û di rewşa wê serdemê de ev têngîn di nav hebestên xwe de bikar anîne. Herweha helbestkar dibêje:

Heta key qelbî min bê ey îksîrî xakî min?

Le xakî kwî muqîmî pêm billê? Qurbanî ew xakem!

Wefayî: 144

Di vir de helbestkar bal kişandîye ser têngînên “Îksîr” ku “gewherekî helîner e ku tenekeyan diguhere û hê baştir çêdike, weke cîwaye dîke zîv û sifîrê dîke zêr û her tişte kêmpêyda ji sûd wergirtinê” (Sîrwan Cebâr Emîn, 2014: 176). Bikaranîna

têgîna “îksîr” zêdetir diçe nav qalibê têgîna îrfanîyan, ji ber wê helbestkar bi sûd wergirtina ji wê têgînê mirov vedigerîne ser bûna resenenîya xwe û dibêje:

Heta keyi dil û derûnî min şêwa û perêşan bê

To ke wek (îksîr)î û minîş wek xak detwanî bimgorrît

Wefayî: 219

Helbestkar mebesta wî bê giringîya xwe, xwe bi xwe ye ku tu sûd û feyda wî nemaye. Ji ber wê dixwaze ji kesekî bê qîmet û bê feyde bibe kesekî bi sûd û jibo hemûyan hêja be.

Wefayî di helbestên xwe de bal kişandîye ser têgînên fîzyayîyan jî ku bi pêşveçûna asta zanstî û me’rîfî ve Wefayî şarezayî ji zanista fîzyayê peyda kirîye. Ji ber wê di serûbendîya koça Şêx Ubeydulahê Nehrî û durxistina wî bo welatê Hîcazê, gazindan ji gel û dewranê dike, bi wê malwêran be, ji ber ku meclîsa mestanî têkdaye ku serdemekî derwêşgeha şêx cihê civat û civîn û saz û mey û heyheya mirîdan bû û Wefayî nizane behsa çî serêşîyan bike ku ji ber şêx hatîye serê wî. Wek mînak:

Şika pişt pişt û dillî min yo wefatî pîrî meyxane

Be çerxêkî felek way kird ne camim ma ne mînakem

Wefayî: 144

Wefayî lebal kişandîye ser wê tişte ku çawa pişt û dilê wî şikestîye ji ber wefat û dûrxistina şêxên wan û gazindan ji dewran û çerxa felekê dike tişte wisa di serê wî de anîye. Ji ber vê sedemê ne şûşeya şerabê û ne cama meyê maye. Di ciheke din de jî:

Felek -xane xerabê - bezmî mestanî weha têkda

Nema darî Leser berdî, be derdî ser çî awakem?

Wefayî: 143

Wefayî di vê helbesta jorê de jî bal kişandîye têgîna fîzyayî “Felek”, gazindan ji dewranê dike, bi wê çawa malwêranî kirine û meclîsa mestanî serê wî de anîne xwarê, tevî wê jî nizane behsa çî derd û baleye bike, gazinda şa’êr ji dewranê peywendîyen rasterast bi têkçûna mesken û meclîsa Şêx Ubeydulahê Nehrî ve heye dema ji tê dûrxistin û ji ber vê sedemê jî mirîd û endamên derwêşgeha şêx rastî derbederî û koçberêyê dibin.

Ast bilindî û pêzanîna helbestkar gihiştîye wê radeyê dibe ku zanîyarêyên Wefayî di derbarê zanistên din de jî hebin, bi awayekî Wefayî karîye giringîyeke

zêde bide zanista felsefeyê û têngînên felsefîk. Di helbestên wî de, ev giringîdayî Wefayî ji bo têngînên felsefî û navanîna feylesefeyên Yunanî di helbestên wî de bi ron û eşkere tîn dîtin. Ev jî astbilindî û jîrektîya helbestkar tê ku di heyama temenê xwe yê xwendinê de kariye, di derbarê zanîstan de pêş bikeve û bi vî hawî jî xwe di lûtkeya helbestkarên arif û pir zana yê nav edebîyata Kurdî de bibîne.

Ba hîcabêkim nemênê lade tarî zulfekan

Ta bekeyi dil namuradî wehdete lew kesirete

Wefayî: 210

Wefayî bi balkişandina ser têngînên “wehdet û kesret” ku du têngînên kevn ê felsefî ne û wehdet ji bo tevahîya bûneweran hatîye bi wacibu’l vucûd û mumkînu’l vucûd cudahîya zahîrî ast û payeya bûyîna wan de ye. Bi kesretê re ku dijî wehdetê ye û bi berfirehî ji bûneweran bawer dike. Herweha Wefayî dibêje:

Roj daye qelbî minayî, dêwane bû sîfestayî

Muşkîl kare napenayî, ya xewsî sanî hîmmetê

Wefayî: 314

Herweha helbestkar di vir de bal kişandîye ser sofîstan ku komek ji cedel û munazere, piştî xwe bi tiştên dûr ji rastîyê û bê bingeh ve girê daye ji bo li hember serdest bin. Wefayî pisporêyeke xwe mezin hebû di hîlbijartina bêje û têngînên zanistî de ku bingeha helbesta xwe li ser van avakirîye, mezinbûna helbestkarî jî vedigere ser wê tişte ku helbestkar di pişt dersên olî de giringîyeke zêde day e zanistên dini jî. Pisporêyeke xwe ya baş hebûye û di çend deveran de têngînên “Kelam” ê jî tîn dîtin, ev jî diselmîne ku Wefayî weku hemû zanistên din li ser kelimê jî şareza bûye. Wek mînak:

Bemînhacî xelîlî heq, bemî'racî resulallah

Debê her bêtecê emir û îradey heqte'alakem

Wefayî: 150

Di vir de helbestkar bal kişandîye ser “Emr û Îrade”yê ku têngînên ehlê kelimê ne û du tiştên cuda ne. Xwedê emir dike û Ebucehel bibe misilman, lê îradeya Xwedê li ser misilmanbûna Ebucehel tuneye, ya Xwedê emir dike Ebûbekirê Sedîq bivê û herweha îradeya wî li ser wê ye ku bibe misilman... Yan helbestkar dibêje:

Xudawenda! Rehîma! Qadira! amu rizgarî xom

Kerîmu, heyîyu xeffaru, qedîmu ferde yektakem

Wefayî: 151

Di vir de Wefayî, bal kişandîye ser têtîna “Qedîm” ku têtîneke kelamîye, wucûda selmandîye ku her qedîm e. Yan helbestkar dibêje:

Gull 'etrî xoy billaw kird, dunyay pirr le gullaw kird

Lallbû zabanî bulbul kuştay zatu sîfatim

Wefayî: 113

Di vir de jî, bal kişandîye ser têtîna “Zat û Sîfat” ku du têtînên ehî kelamê ne ku ev jî Xwedê be zat û sîfatê xwe ve ezêlî ye. Zat û sîfata Xwedê jî bi zat û sîfata însan naçe, bi vî hawî Wefayî bal kişandîye ser gelek têtînên curbicur yê zanistên herî ber bi çav yê serdema xwe. Di helbestên wî de jî ev destnîşankirin bi têtînan bi awayeke eşkere tê dîtin.

3.2. Di Xezelên Kurdî Yê Wefayî De Taybetmendiyên Fikrî

Di helbestên klasîk de bi awayeka berçav taybetmendiyên fikrî ya sebka Iraqî tê dîtin, ew rengvedan jî bo sedema vê yekê ku helbesvanên Kurd bi ser mektebên edebî yê Farisî parve bibin, ku di rewîş û qonaxên cuda berhemên xwe pêşkêş bikin, bandora helbestvan û mektebên edebî yê Farisî bi ser helbestên Kurdî û taybet jî helbestên Wefayî bi awayeka berçav tê dîtin. Bikaranîna taybetmendiyên fikrî yê sebka Iraqî, Wefayî wek yek ji van helbestvanan ku di çarçova taybetmendiyên helbesta vê qonaxê helbestên xwa binvîse, lewra bi awayake hur taybetmendiyên sebka Iraqî û rengvedana wan taybetmandîya di helbestên Wefayî de bo vî awayî didin nîşan:

3.2.1. Di Xezelên Kurdî Yê Wefayî De Îrfan

Îrfan û belavbûna tesewîfê û bîra îrfanê wek yek ji taybetmendiyên fikrî yê herî giringê sebka Iraqî tê qebûl kirin. Bi cureyekî ku di beşa herî mezin a vê qonaxê ve rûdêmeke îrfanî pêve xwuyaye, tew ew helbestên ku behsa me’şuqa mecazî jî dikin ji ber vê cihêkirina wan helbestan ji nav îrfanî û ne îrfanî dibe kareke zehmet ji wan kesên ku dixwazin di vê derfetê de xizmeta helbesta Kurdî bikin.

Ji ber wê di pişt îrfanê de babeta herî sereke sebka Iraqî ye, babeta stayîşkirin û giringîdana eşq û hezkirinê de datînin pêşberî sebka Xorasanî. Eşkereye

ku berî serhildana sebka Iraqê, helbestkarên kevn û ew ên ku di derbara helbest û babetên wêjeyî de xizmeta wan di wî warî nirxdar dikir û bi aqlê wan dinihêrîn û awaza kirîye bingehê serekî yê her tiştî, lê bi guherîna lezgin a civaka Îranê û serhildan û derketina sebka yek din li meydana, êdî ev giringî dayîna aqil û awaz jî ber bi nemanê ve çû. Helbestkaran di şûna vê de giringî dane eşq û xoşewîstîyê, tew di stayışkirinê de jî zêdeçûneke yekser dixwuyê. Giringî dayîneke bi vî rengî ji bo stayışkirina eşq û xoşewîstî û zêdeçûn kirin di stayışkirinê de dibe rûdêma herî berbiçav ya cudanebûna wê ji sebka Iraqê û sebka Xorasanî. Ev cihêbûna wê jî bi şêweyekî eşkere di berhemên wê demê de xwuya dibin.

Wefayî jî weku helbestkarek sebka Iraqê di bin bandora helbestkarên navdeng ên Fars de helbestê xwe nivîsandine. Ji ber vê wek encam ji helbestên wî ev tişt ji me re ron dibe ku giringîyeke pir zêde daye eşq û xoşewîstîyê. Beşeke zêde ya dîwana wî li ser stayışkirina Pêxember û Şêxê Nehrî pêk hatîye. Tew wisa lêhatîye ku ew ên ku li ser helbestên wî rawestane, kirine çend beş: Bi ya hineka şa'irekî helbestkarê dildarêyê ye (Kerem Şareza, 1984: 55). Bi ya keseke din jî jê re dibêjin, piranîya helbestên wî di ximeta ol û stayışa şêxan de ye, tew Marûf Xeznedar jî ilmîyeya xwe bi wî kirîye ku dinyaya helbesta wî wextekî eşqa heqîqî û wextekî jî eşqa mecazî bûye (Mihemed Elî Qeredaxî, 1984: 33). Tevî vê jî çavkanî amajeyê li ser vê dikin ku ji zimanê Pîremêrd neqil kirine ku gotîye hemû helbestên xwe ji bo stayışa Pêxemberan nivîsandine (Mistefa Seyid Mîne, 2007: 343). Lê bi lêhûrbûnê, helbestên wî ji alîyê me ve ron dibe ku beşa herî zêde ya helbestên wî helbestên îrfanî ne û li ser sitayışa pêxember û şêxê Nehrîyan e, ji ber ku ew bi xwe mirîdekî serhişk ê terîqeta “Şêx Ubeydullahê Nehrî” bûye û beşek jî ji bo stayışa xoşewîstîyê bûye.

Ew çavdêrêyê li ser ku bi ya wî şa'irekî helbestê dildarêyê ye li ser bingehê çavkanîya xwe girtîye ku beşa herî zêde ji helbestên wî lîrîkî ne û be awaz û stranî hatine nivîsandin. Eşkereye ku lîrîk jî weku mebest pêk hatîye ji rengvedan hest û nestîya nav û hundura tekane ya şair di asta rastîyên jîyan û hebûna wî (Osman Deştî, 2013: 120). Bi vî hawî bikaranîna ziman û ferhengê ji alîyê wî ve şêwazêkî evîndarene ye û beşek ji dîwana wî vegirtîye. Heke na eşq li cem wî dê biba nêrandina bi du quncikan ve lê temaşekirin bûya. Ji ber ku eşq li cem wî xweşikîya xwezayê û jîyanperwerêyê ye. Eşq dildarî û xoşewîstî ye, eşqa wî heqîqî ye û Xweda

çavkanîya eşq û hemû xweşikîyaye, xweşikîya wî di hemû tiştî de rengê xwe vedaye û beşeke ji wê...hwd.

Di vê rengvedanê de piranîya lêkolînerên wêjeya Kurdî li ser vê hemfikirin ku divê bi du goşeyan ve lê were meyzandin. Ji bo vê yekê ku xezelên wî hem îrfanî ne û hem jî ji bo mebesta îrfanê nivîsîne. Lêbelê tevî vê jî wek yek ji arif û murîdên Şêx Ubeydulahê Nehrî tê qebûl kirin. Ji ber vê mirov dikare bêje piranîya helbestên wî helbestên îrfanî ne û naveroka helbestan jî hilgirê bîra îrfanî ya sofîgerêyê ne û li ser eşq û xweşikîyê hatine gotin. Serkanîya eşq û xweşikîyê li cem wî eşq û xweşikîya Xwedê ye. Tevî vê jî serkanîya hemû xweşikîyên dinyayê bi xweşikî û besna Xwedê vegotîye ku wexta dibêje:

Le'ekî şoxuşengêke, cihan gullgull beçengêke

Her ewraqî lerrengêke, beyanî husnî yekta kird

Wefayî: 73

Di vê helbesta xwe de sibehê dike yektayî Xwedê ku bi vê her çî xweşikîya gerdûna yekbûyîya xweşikîya Xwedê derdihe pêş. Xweşkagîya me'şuq bi awayekê tevahîya cîhanê ji xweşkahiya wê tije bûye. Her pelek bi dengê ye û sibehan xweşkîya yektayîya Xwedê pêşkeş dikin.

Ev jî rîya şarezayîya wî bi xwe pêk hatîye, ji ber ku li ser quran û hedîs û zanistên din ên olî gelekî şareza bûye. Bi vê rêyê heqîqet û xweşikî, xweşikîya Xwedê bi çavekî arîftî bi cureyekê lê kirîye ku xwîner di dema xwendina helbestên wî de hîs dike ku helbestên wî tijene ji eşq û xweşikî perestin, tije ne ji gotinên îrfanî ku cara dawîyê di xizmeta eşqa heqîqî de diqedin.

3.2.1.1. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Fikra Îrfanî

Heke em bi hûrgilî helbestên wî binêrin vê dibînin ku bi şêweyekî giştî bîra îrfanî di helbestên wî de reng vedaye, bi awayekî ku dil navenda hemû wan fikr û dijatîyan e ku di helbestên wî de kom bûne. “Serkanîya wan hemû fikran jî eşq û xweşikîya Xwedê ye, ji ber ku arîf bi rêya keşf û şuhûd û îşraq ê ve têgihan û dîtina Xwedê hîs dike û bi ser xweşikîya Xwedê ve dibe, ev jî destketa berhema eşqê ye, di vir de eşq dibe zemînesazê pênaseya îrfanî” (Kazim Şêx Huseyn, 2018: 203). Ji ber vê yekê babeta eşq û xweşikîya Xwedê jî wek yek ji babetên herî serekî yên bîra îrfanî tê qebûl kirin ku ke helbestkarên bi ser sebka Iraqê di helbestên xwe peyrewîya

wan kirine û wek babeta serekî ya nav helbesta vê qonaxê de jî tê hesibandin. Bi ya wan ku babeta eşq û xoşewîstîyê mirov digihîne armancê. Helbestkar jî weke helbestkarekî klasîk bi peyrewîkirina bîra helbestkarên vê qonaxê de bîra îrfanî di helbestên wî de reng vedaye û dilê xwe kirîye navenda me'suq ku Xwedê ye, ji ber ku dil serkanîya pênaseyê ye û di îrfannasîyê de jî dil berpîrsê wê erka bi ser me'suq de tê. Bi vê sedemê eşq bi rêyê wek rola serekî tê dîtin ji bo serhildana pênaseya îrfanî. Bi vî hawî babeta bîra îrfanî li cem wî ji dil ve dest pê dike, wexta ku dibêje:

Ey dil were hoşyar bibe haza terîq l 'aşiqîn

Mehwice mallîyar bibe haza terîq l 'aşiqîn

Wefayî: 179

Eşkereye ku serkanîya bîra îrfanî li cem wî ji dil ve dest pê dike, ji ber ku “îrfan ji alîyê bêjeyî ve ji wateya nasîn û agahîyê tê û ji alîyê têgînê ve jî navê yek ji zanistên îlahî ye ku babet û naveroka wê nasîn û heq û nav û sifata xweşikîyêye” (Yasîn Nadir, 2019: 55). Babeta serekî di îrfanê de nasîna xwe û yekbûnîya hundur e “dil”, ev jî bi rêya birêxistinên mirov e bi xwe bi xwe û dewrûberê xwe ye. Ji ber vê jî gazî dil dike ku hoşyar be li pêşberî cemala me'suq ku Xwedê ye, bi awayekî ku dil ji nehişyarêyê hişyar dike ku bi vê nehişyarîya zehmet bigihê me'suq. Ji ber vê rênîşanîyê dike ji bo ku bigihije me'suq pêwîste dil me'rîfeya xwe hebe û hişyar be. Ji ber ku rêya gihiştina e'suq ku Xwedê tê de bilind e, pêwîstîya wî bi hişyarîya me'rîfeyê heye. Me'rîfe bi wateya ku Xwedê bi navê sifaten xwe tê naskirin û tesdîqa hemû kiryarên wî dike, Xwedê bi çawdêrî hay ji kiryarên wî heye û xwe ji hewa û arezûyên xwe yên nefîsî dûr dike da ku bi vî rengî bikare di cemala me'suq de ku Xwedê ye, bihelê. Rêya gihiştina me'suq bi dilê neagah û tije xew jî de rêyeke kurte li pêş aşiq.

Rêya eşqê û gihiştina me'suq li cem wî rêyeke asê û dijwar e û tije astengî û nexweşîye, tevî vê jî adab û rê resmên wê yê taybet hene ku divê aşiq wan derbaz bike da ku bigihêje me'suqa xwe, ji ber ku aşiqbûn, gihiştina me'suq hêz e di têkçûnê de, ev rê jî li cem wî gihiştin û hêzê di wî de, têgihiştina cemala me'suq e ku Xwedê ye, tew di helbestên xwe de amaje bi vê tiştê kirîye ku ji bo gihiştina me'suq, divê di destpêkê de dil ji neagahî xefletê ve bibe xwedî agahî û xweşikî û hebûna me'suq hîs bike. Di hebûna wê de bihelê, ev rê jî pêwîstîya wê bi me'rîfeya îrfanîyê heye,

pêwîstîya bi qurbanîdana ji xwe heye bi navê gihiştina me'suqa bilind. Di beyteke xwe ya din de dibêje:

Beser mestanî badey saxîrî 'ehdîyelest tikey

Beqetirêkî necatmdey ledes tuxom rrû le deryakem

Wefayî: 151

Her weku berî niha jî me amaje kirî, eşkereye ku serdseteya bîra îrfanî di helbestên wî de xwe dispêre şarezayîya wî ya babetê olî û girêdayî oldarîya wî ye wek serkanîyekî ji bo gihiştina heqîqeta Xwedênasîyê, bi vî hawî helbestkar di beyta xwe ya jorîn de amaje bi ('Ehdê elest) kirîye ku peyman navbera Xwedê û bendeyên wî ye, di dîn û edebîyata îrfanî de jî elest û 'ehdê elest "Ehdîyelest", weke peymana navbera Xwedê û zarên Adem de lê tê meyzandin, ji ber wê amaje bi ayeta surata (Araf :172) "الست بربكم قلوبى" ku peymanî razîbûna mirove bi serdestîya Xwedê û bendeyîya mirov e, ji ber vê jî di helbestên jorê de vegeyîyaye ser wê peymana ruhyetî ya di navbera mirov û Xwedê de heye, bi çavekî arîftî berê xwe dide Xwedê, lava dike û dibêje: Weke ku çawa ji ezelê ve can di ber zare Adem e û peymana serdestîya bi ser bendayetî de heye, bi heman şêweyî dilopek ji rehma ji bo min bibexşe da ku rêya eşqa te peyda bikim û di deryaya eşqa te de bihelêm. Helbestkar li ser bîra xwe ya îrfanî de, di domîne û dibêje:

Disan leser'ehdîy elest, came lecanan bigire dest

Her ta ebed mexmûru mest, bibe haza terîqul 'aşiqîn

Wefayî:181

Rêya gihiştina Xwedê, rêya mestbûnê ye di eşqê de, rêya peymangirêdanê ye, peyman bi wateyêye ku di îrfanê de ji wê peymana ku Xwedê ji zarê Adem wergirtîye pêk tê û gotine tu Xwedê yê me yî (Îbrahîm Ehmed Şiwan, 2010: 74). Ev jî tê wê wateyê ku Xwedê zarê Adem çêkirîye û peymana wê daye ku her ew bi xwe Xwedê yê bendeyên xwe be û her 'aşiqî wî jî bin û wek Xwedêyê xwe bizanin. Ji ber wê arîfan jî ew girêdana xwe ya ruhî di navbera mirov û zarê Adem de heye soza dirêdana xwe ya bi peymana ruhî didin, serkanîya eşq û me'rîfeya wan jî Xwedê be, xwe bendeyê Xwedê bizanin. Ji ber vê jî di bin van ronahîyan de di meyxaneyê aşiqan de peymana elest bi me'suqê xwe ku Xwedê ye girê dide û li yektayîya Xwedê dinêre û dibêje: Were û li ser peymana elest a Xwedêyê ku di ruh dayî bedena Adem vir ve pê re hatîye girêdan camê ji wê badeyê werbigre û bînoşe, da ku hetahetayê di eşqa Xwedê de mest û mehû dibî û rêya gihiştina me'suq peyda dikî. Herweha di

çend deverên din de jî balê dikişîne ser îrfanîyên di derbara peymangirêdana navbera benî Adem û Xwedê û radixe pêş çavan û bi vî hawî bîra xwe ya îrfanî di helbestê xwe de jî reng dayîyê. Serkanîya hemû bîrên wî yên îrfanî jî şarezayîya xwe û pişt girêdana helbestkar bi kelama Xwedê û pêxember û zanistên olî bûye, zaniste dînîyekan buy e.

3.2.1.2. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Têgînên Meqam û Hal

Ev têgîn wek yek ji bingehên helbesta sofîgerî û îrfanî tên qebûl kirin ku helbestkarên bi vî rengî her ji ber xwe ve di nav xwe bi zimanekî hişk û bikaranîna komek têgînên tije simbol û raz nivîsandine ku zêdetir ji hemû babetên din ên di nav helbest û wêjeyê de ronîkirin jê re pêwîst e, ji ber ku helbestên vî rengî gelek têgîn li xwe girtine ku ji wateya pêşçav cudane, wateyek kûr li xwe bar kirine. Pêwîstî bi zelalkirina wan heye da ku xwîner bi hêsanî karibe ji remz û simbolên wan têgînan fêhm bike. Ji ber vê yekê Wefayî jî, weke hemû helbestkarên sofî yên serdema xwe ku di lûtkeya helbesta sofîgerî û îrfanî de bûn, dikarîye di helbestên xwe de birek têgînên îrfanî bikar bîne ku hêjeyî giringî û helwêst li ser werinkirin, ji ber vê jî bi vê meyzandinê re li gor pêwîstî navnîşana nirxandina me dîyar dike ku şeweya sebka Iraqê ye û îrfanî jî babeta serekî ye, di nav helbesta vê qonaxê de çend mînakên ji têgînên hal û meqam wek şewaza xwarê em raxin ber çavan:

Payeyên Meqam wek yek ji bingehên herî sereke yên tesawifê tên danîn, ji ber ku rêborê vê rêyê tê de bi cih dibe “meqam ji wê berdewamîya rêya tesawifê re tê gotin ku Xwedêyê mezin bixwaze ew kesê ku amadeyî û qabilîyeta wî ya meqamêkî bilindtir hebe” (Ebdulhemin Bêlaf Berizncî, 2019: 364) Ango pile û payeya bende li cem Xwedê bi rêya Xwedê pêwîstîyek rasteqîne ya berdewam û serdestî bi ser nefse de bidest tê. Ev jî pêwîstîya wê bi zanista me'rîfeyê heye ji bo bende bikare ji meqamekî bo meqamekî din biser keve, ji ber vê yekê di encamê de di helbestên wî de ev ji me re zelal dibe ku di rêxistina helbestên xwe de birek remz û têgînên taybet ê girêdayî wî hene ku xwe di çarçoveya meqamên tesawifê de dibînin.

Têgînên Hal: Ev hal e ku bi ser dilê aşiq de tê û guherîne pêre çêdike. Ji ber vê yekê em dikarin bêjin serkanîya navlêkirina hal ew guherîne ku din yek astê de namîne, li cem rêbor, hin caran berdewam dibe û hin caran jî namîne, lebelê heke şaşî berdewam û bi cih bûn hingê ji çarçoveya têgîna hal derdikevin û dibin meqam.

“Hal weke têtînekî tesawifê ji vê çawanîyê re têt gotin ku bi ser rêbor, ango “salîk”ê rêya tesewifê têt” (Şêx Emîn Şêx Elaedîn Neqşibendî, 2015: 190). Têtînen hal wek yek ji bingehên helbesta sofigerî ya îrfanî têt danîn û helbestên Wefayî jî ji van têtînan ne bêbeş in. Ji ber vê yekê me jî li gor pêwistîya vê nîrxandinê ku sebk û îrfan babeta herî giring e ewqasî têtînen meqam û hal li cem wî têt dîtin, raxin ber çavan ku mînakên wê jî li jê re ne:

3.2.1.2.1. Oldarî-Dîndarî (Zuhd)

Ji dijminahîkirin û berê xwe ji dinyayê guhertin û giringîdayîna ji bo roja dawîn pêk têt, berê xwe ji dinyayê guhertin û dijminahîya wê kirin bi wateyê ye ku hewlnedaneku ji bo destveanîna sermayeya dinyayê ye, awayek devjêberdan û piştguhkirina dinyayê ye bi navê bidestveanîna axretê ye, yan jî bi awayeke din em dikarin bibêjin “Zuhd” “têgihîştina dil e ji wê ti wê tiştê ku jidest çûyî” (Îbrahîm Ehmed Şîwanî, 2010: 177). Ev cureya zuhdê dibe sedema gihîştina dil û paqijbûna wî, ji ber ku heta dil ji guneh û tawanana paqij ne be nagihîje mebest û miradê, Wefayî jî di vê derbarê de dibêje:

Saqî çawit binwêne, zuhd û teqwam bistêne

Qurbanî camêk mey bê, hemû sewm û selatim!

Wefayî: 112

Emin çî û zuhdî softiyane! min û goşêkî meyxane

Bequrbanî nîgahêkit hemû sewm û selatî min

Wefayî: 165

Wefayî di vir de, ji bo bigihîje Xwedê dixwaze li alîyê mestbûnê xwe bigre û dest ji her çî ya ku berjewendîyên dinyayîyan têt de heye berde, tenê ji bo bigihîje Xwedê... bi awayekê helbestkar naxwaze li pey şopa zuhda softiyatîyê bikeve, ji ber ku li gor wî gihîştina bal Xwedê di mestbûna wî de ye. Mestbûnek ku mirov bi wê sedemê haydar dibe ne ku mestbûneke ku mirov ber bi bêhayîyê ve bibe, ji ber wê helbestkar her tem rêya mestbûnê hildibijêre ji gihîştina bal Xwedê.

3.2.1.2.2. Bihev Şadbûn (Wesil)

Ji pevguhîştina ‘aşîq bi me’suq û li îrfanê de me’suq her tem Xwedê ye û ‘aşîq ji bilî heq tu tişteke din nabîne, wesil yekîtiya heqîqetê ye, yekîtiya heqîqetê jî bi Xwedê ve girêdayî ye, bi awayekî ku nefis ji xwe bi xwe dîr dikeve û agahîya wê ji

tu tiştî naminê ji bilî Xwedê. Ji ber wê di îrfanê de ku me'suq her tim Xwedê ye û 'aşiq ji bo gihîştina bo me'suq amade ye hemû rêyên êş û azarê bide ber xwe ku di vê rêyê de tîn pêşberî wî. Wefayî jî di vê biwarê de dibêje:

Wesll û gîryan qurb û hîcrane terîqî 'aşiqî

Fesllî gull boye Leser çawan û weha naw dête xwar

Wefayî: 84

Wefayî wisa dizane ku rêya eşqê, rêya wesil û hîcran e, dîyar e nêzîke û hevdiştî 'aşiq û me'suq jî nerîteke berbiçav a rêwîtiyê ye û rewşek e taybet e. Ev jî, ji nêzîkî û gihîştina bende ya bo Xwedê pêk tê, ev piştî hingê tê ku dil û nefis bi yekcarî pak dibe. Wefayî jî her di vê nihêrtinê de gihîştin û nêzîkbûna bo Xwedê de xwe wek şermezar dibîne ku wek tê xwestin dil û hundurê wî pak nebûye. Herweha di deverekê de bi ya wî wisa ye ku nêzîkî û gihîştina bi me'suqa xwe mirovên mezin ji nexweşî û derd û belayan dûr dixê ku ji ber xwestekên dinyayî bi ser wan de tîn. Her weku di dibêje:

Tabî serî kullmît bû kewa zulfî bebada

Ya rrojî wîsalit şewî hîcranî welada?

Xallî demte ya megesî huqqeyî şekker

Yaxo hebeşîzade lenêw abî beqada?

Wefayî: 25

3.2.1.2. 3. Bênfirêhî (Sebr)

Razîbûn û aramgirtina beranber wan musîbet û nexweşîyên ku mirov rastî wan tê, razîbûn e beranber bi wê nebûnê û wê beşe ku Xwedê dayîyê bendên xwe. Mezinbûna vî meqamî ji wê derê serkanîya xwe girtîye ku xwegirtina bende ye beranber bi wan musîbet û nexweşîyên ku ji aliyê Xwedê ve bi ser mirovî tîn, ji bo wê Wefayî dibêje:

Heta negrîm nerrwa sebrim, damanî yar kengê bigrim

Leber 'emirî qumirî bîmirm, serwî lenêw kenarî girt

Wefayî: 60

Eşkereye ku helbestkar di vê helbesta xwe ya jorê de rasterast sebr wek meqamekî bikar anîye û amaje bi wê kirîye ku hemû vî derd û musîbetên nexweş ên bi ser de hatine wek beşa Xwedê zanîye. Bênfirêhî ya Wefayî jî bi navê gihîştina Xwedê ye û amade ye ji bo me'suqa xwe jî ku Xwedê ye qurbanî bide, ew qurbanîdan jî bi canê xwe canê wî bi xwe be.

3.2.1.2. 4. Hişyarî (Hezer)

Têgîneke îrfanî ya sofîgerî ye û ji vî meqamî re tê gotin ku yektaperstî û îstîqameta rêwîtîya rêya Xwedê bi ser hemû tiştî re ye, vegêrîna bo hemû tiştan, mestbûne di eşqa Xwedê de. Di îrfanê de hişyarîya bende girêdayîye bi mestbûn û windabûna bende di rêya eşqa Xwedê de, Wefayî di hişyarîya îrfanî de dibêje:

Demt bêne dillim meşkêne destim bigre ewcareş

Behoşyarîm deyê saqî, ke nerrjê camî sehbakem

Wefayî: 151

Eşkereye ku helbestkar her du têngînên “mestî û hişyarî”yê wek têngînekî rewş bikar anîye û dixwaze di wê hişyarîyê de bimîne ku gihştîyîyê, hişyarêyek ku di mestbûnê de ye, mestbûnek ku ji rewşekî bêhayîyê ve helbestkar hişyar dike, nek mestbûneke ku helbestkarî ber bi bêhayîyê ve biribe. Bi vî jî Wefayî tikakare ji saqî weha hişyarêyê bide mestbûna wî da ku şûşeya şeraba wî neşkê û her di mestî û hişyarîyê de bimîne.

3.2.1.2. 5. Bedewî (Husn - Cemal)

“Cemal derkerê kemala dilberê ye ji alîyê bênîyazîya dilberê ve” (Îbrahîm Ehmed Şiwan, 2010: 94). Ji ber wê cemala Xwedê di bişîrîn û letîfîyê de ye. Bi giştî têngîna cemal ku rewşeke rêwîtîya rêya heq e, ji dil vê tê kirin û ji celalê hatîye, her kesê ku perwerdeyê celal û kemalê be, hingê celala Xwedê cemal dibe û cemala Xwedê jî celal dibe. Wefayî jî, ji vê nihêrtinê ve dibêje:

Men'im meke mestim ke be tefsîrî cemallit

'Aşiq eweye bê sîfet û perrtewî zat bê

Wefayî: 308

Di vir de helbestkar di celala Xwedê cemalîyetî û ‘aşîqê xwe bi xwe ye ku heq e, neku sîfat û zatê xwe, bi vî awayî rêya eşqê li cem Wefayî ewe, ‘aşîq divê me'şuqê xwe be her weku heye qebûl bike ne ku ji ber zat û sîfatên wê. Herweha helbestkar di devereke din de dibêje:

Ke degrîm bo cemalî to dîyare eşk û ahî min

Le xurşîdî dedatin dem, starey şamî yelldakem

Wefayî: 142

Di vir de helbestkar digihîje pileya gihiştîyan, cemala Xwedê bi dil dibîne, bi awayekî ku dikare cemala ezel di dilê xwe de geş bike, dîyar e bi dil dîtina cemala

Xwedê di demekê de ye ku çav, pêşîya vê dîtîne nagire, cemal beşeke nûra bilind e û berê wê li dilê bende ye û rêwîtiya rêya heq dike, bi vî awayî serkanîya her xweşkahîyekî ku rêwî hest pê dike û vedigere cemal a heq... helbestkar Wefayî ji vî alî ve bi ya wî ku Xwedê awêneya rênîşandera hemû xweşikîya ye û her xweşikîyeka ku hest pê dike wî vedigerîne cemala Xwedê ku serûbinê dilê wî vegirtîye û ji eşqa wî meho bûye wexta ku dibêje:

Xoşa bew weqte to mîratî dilber bûy be dîldarîm

Ewêstaş mehwî dîdarî cemalî roje "hîrba" kem

Wefayî: 142

3.2.1.2. 6. Bêkêmasî (Kemal)

Ewqasî bi tamamî bê kêr û kurtîye di tiştêkî de, bi wê wateya kemala bêgunehbûnê de sîfet û şopên xwe de. Ji ber wê kemalî Xwedê ji mahîyeta Xwedê pêk tê, ev mahîyet jî mebest û dawîya wê tuneye û naşibe mahîyeta bendeyên wî. Bi vê dîtîne re Wefayî kemala Xwedê ji hundur ve dibîne ku ev jî derketina Xwedê di nefsa xwe û dîtîna wî di nav tiştên ku afirandî ne (Îbrahîm Ehmed Şiwan, 2001: 348). Wextekê dibêje:

Ey çiray zullmetkedey dill, ey celay nûrî beser

To û cemallî bakemallît, aftarî ya qemer?

Wefayî: 90

Wefayî di wê helbesta xwe ya jorîn de derdixe holê ku çawa dilê wî bi agirê eşqa Xwedê ronî bûye, bi awayekê ku cemala Xwedê û kemala wî di dil û hundurê wê de ye û bi awayekî cemala Xwedê ber bi alîyê celalê de birîye û bi vê sedemê jî dil û hundurê wî bûye xwelî.

3.2.1.2.7. Coş û Xweruş (Wecd)

Yek ji rewşan e di îrfanê de ji rewşekî xoş bi ser bendên xwe de tê, ra jî di encama derketina her veşêrêyekî ji esrar û me'newîyê ku Xwedê bixwaze ji bo bendeyên xwe eşkere bike, vî rewş jî wisa dike ku bende ji rewşa siruştî derdixe û tê guhertin, bi vê guherîne jî dil coş dibe, helbestkar Wefayî jî bi wê nihêrtîne re û weke rêwîyekî rêya heq bi wê xweşîyê dihesa û bi ya wî ev xweşî ji xeybê jê re hatîye her weku dibêje:

Çi xoşe wecdî serw û gull, be dînî qumrî û bulbul

Demêk şeyday qed û ballat, demêk şêti dehanit bim

Wefayî: 101

Di wê helbesta xwe ya jorîn de amajeya wî ya zelal heye, Wefayî jî rastî vê rewşa lihev hatî bibe, ev rewşa rasthatinî ya helbestkar jî serkanîya xwe ji fikra ji bo Cemal û eşqa Xwedê digre ku Xwedê bi ser mexlûqên xwe de barandîye, Wefayî wisa dizane ku sewdayî û 'aşiqbûna bo me'suq cureyek ji dilxweşiyê jê re hatîye bexşandin ku gelekî ji eşqa û sewdaya qumrî ji bo sewl û bilbil ji bo zêdetir e.

3.2.1.2. 8. Derûn (Nefs)

Nefs vî axwax e ku rêwîyê rêya heq bi ser de rawestaye, ji ber wê karê her ji pêşînên rêya gihîştina heq, ji xwedîyê kiryarên xwe û rahênana nefse li ser paqijbînê ye bi şêweyekî hertimî ji bo gihîştina cem Xwedê ye, ji ber ku pakbûna nefse ji her çi gunah û tawanên karê herî mezin yê rêwîyên vê rêyêne, heta nefis pak nebe bende û rêwî nikarin serkeftî bin di gihîştin ji bo miradên xwe de. Wefayî jî bi vê nihêrtinê re, bi ya wî serkeftin û gihîştina rêya heq serwerbûn e bi ser nefse de, her weku dibêje:

Ew nefsi bêhewayî min, serkeş bû bêrezayî min

Camî cîhannumayî min, serzede bû xubarî girt

Wefayî: 61

Wefayî di vir de serkeftin û gihîştinê, be razê dil li serkeftin û serwerî bi ser dil de dibîne, bi ya wî neserwerî û pak nebûna dil yan jî bi cureyeke din li pey hewayê nefse ketin bandorê bi dil û hundura mirov we dibe û mirovî ber bi tarî û dilreşî û gunahbarêyê ve dibe. Ji ber ku di îrfanê de nefis cihê hewa û madî ye û dilêş cih û mekanê eşqa Xwedê ye, Wefayî li ser dîtinên xwe yê îrfanî di derbarê nefis û dil de wisa dibêje:

Demêk nefis bigrewe, wedûy dillî xot kewe

Bizane rroj ya şewe, xewt neye heste kar

Wefayî: 80

Di wê helbesta xwe ya jorîn de dubare peywendîya navbera nefis û dil de derdixe ber nîqaşê û bi ya wî gelek caran pêwîst dike hewa û nefis didin alî û li pey dil biçin ku nevenda eşqa heqîqî ye, li pey xewa xefletê nekevin hetanî şev û roj li eyan ne be.

3.2.1.2.9. Balkêşê (Cezbe)

Pêkhatîye ji rakêşana bende bi alîyê Xwedê, nêzîkîya bende ber bi alîyê Xwedê ve ye li gorî daxwaza Xwedayê xwe yê mezin, heke bende di wexta hatina ser hişê xwe de, dest bi jixweçûnê kir vî digihêje cezbe ya heq, cezbe bilindbûna dil e bi nihênî û esraran, eşkere ye ku heqîqeta cezbe ya dîtina tecelaya Xwedê ye di tiştan bi xwe de ku bi vê rêyê li pey rêwîtiya rêya heq dikevin, gihîştina rêwî jî bi vê pileyê ve heye, bêyî hewl û têkoşan û murşîd têdigihê, bende jî heye bi rêya murşîd re bigihêje û têbigihê, ji ber wê eger bi nihêrtinê re em li Wefayî binêrin, em dibînin gihîştina helbestkar bi rêya murşîd ve ye ku dema dibêje:

Cezbey nîgehit xoşîy nehêştîm be biroy to

Qiblem çuwe ta mestî meyî pîrî muşanîm

Wefayî: 126

Di wê helbesta xwe ya jorîn de ronîye hîs bi wê tê kir in ku murşîd û rênîşanderê Wefayî hebûye ji fêhmkirina veşêrî û esraran, bi awayekî ku heqîqeta tecelaya Xwedê di çavê “pîrê muşan” ve dîtîye û hîskiri ye.

3.2.1.2.10. Tirs (Xewf)

“Têgîneke sofîgerî û rewşa îrfanîye ku rastê rêwî tê û ji ber serwerîya tirsê ya ji fermaneke Xwedê, yan jî bi rêya dengê xeybî” (Îbrahîm Ehmed Şiwan, 2001: 351). Ev meqam dibe ku rewş be, piştî bi rêya bicihbûnê bibe meqam, ji ber wê têgîna tirs beranber hêvîyê ye, bi vî awayî hêvî beranber rehmet e û tirs jî beranber cezayî radiweste, ji ber wê mirov divê ji Xwedê bitirsê û hêvîya wî pê hebe. Tirs li cem Wefayî hingê dibê dest pê dike, her weku dibêje:

Be bedmestî detirsê bête Dîwanî xuda feryad!

Kesê wek min şehîdî çawekanî nîktezanîbû

Wefayî: 188

Helbestkar di wê helbesta xwe ya jorîn de ku rasterast balkişandîye ser têgîna “Tirsê”, tirs helbestkar di bedmestîyê de ye. Tirs wî di wê tiştê de ye ku çawa di roja axretê de û bi çî rûyî hawara bibe cem Xwedê, eşkereye ku mestbûn di eşqa Xwedê de ji bo hişyarîya bende ye da ku bi wê rêyê bigihêje heq, lêbelê mestîyê, helbestkar di vir de ber bi ew naagahîyê birîye û bi vê rêyê jî rastî guneh û tawanê bûye, ji ber wê tirs helbestkar ji cezayê Xwedê heye.

Wefayî ji bilî van têtînan li jorê gelek têtînan din ên curbicur ên di derbarê sofîgerî û îrfanîyê de bikar anîye ku pêwîstî bi lêkolîn û hûrbûnê li ser divê ji bo nîşandana van zareveyan, lê ya ku me di vê lêkolînê de raxisyîye pêş çavan li gor pêwîstîyê me yên bi vê lêkolînê tenê çend mînakên pir hindik ji nav helbestên Wefayî ne. Mebest ji vê raxistina van têtînan jî tenê pratîze kirina babeta îrfanî û bikaranîna hin têtînan e. Ji ber ku îrfan û giringîdana têtînan zanistî û îrfanîyan babeta serekî ya helbestên sebka Iraqê ye. Ji ber wê me jî ku bi ya me wisa ye ku Wefayî jî weke helbestkarekî Kurd û di bin bandora helbestkarên klasîk ên Kurd û helbestkarên Fars û ew ên bi ser sebka Iraqê ne, helbestkar kariye bi şeweyekî serkeftî û taybetmendiyên sebka Iraqê di helbestên xwe de pêk bîne û peyrewîya wan bike. Helbestkar kariye bi şeweyekî pêzanîn giringîdayîna têtînan sofîgerî îrfanîyan di helbestên xwe bikar bîne; weke “Tewbe, Pîr, Zahîd, Dîn, Dil, Sîrr, Nehan, Bende, Me'den, Reqîb, Mehu, 'Edem, Wicûd, Peyman, Qudret, Muhebet, Wehdet, Reza, Xeyb û Hazir...hwd”.

3.2.2. Pesindana Pêxember

Beşeke zêde ya dîwana Wefayî ji pesn û stayışê pêk hatiye. Wefayî wek mirîdekî rêya terîqetê hemû stayışên wî stayışî rohî ne û ji bo mezinahî û xoşwîstîya pêxember û şêxê Nehrî nivîsandîye û di pişt van de jî stayışa me'suqa xwe kirîye. Eşkereye ku babetî stayışkirina pêxember û rengvedana wê di nav helbesta şa'îran de piştî serhildana îslamê peyda bûye û bi rewşên curbicur re babeta edebî jî di nav helbesta helbestkaran de berdewam bûye. Berdewamîya babeta stayışkirinê di qonaxa sebka Iraqê de gihiştîye lûtkeyê. Helbestkarên vê qonaxê jî bi giringî li wan nihêrîne û kirine babeta helbestên xwe, bi vê rêyê aliyê xwe yê rûhanî û girêdana xwe bi rê û rêbaza pêxember dubare kirine. Wefayî jî di dîwana xwe de sê helbestên ku ji bo stayışa pêxember nivîsîne li jêre ne:

Ey (îmamîl murselîn, şemsul huda, behrul hemîm)

Ey (şefî'î elmujenbeyn, xeyrulwera, mewlel ne'îm)

Ey nesîmêkî gullî zar û şu'a'êkî ruxt

Şewqî roj û bedrî taban 'etrî gullzarî îrem

Ey le şewqî cennetî rût enbya û ewlya

Roh Leser lêwn wekû perwane bo dîdarî şem

*Ey dem û xendet delîlî de'ûyî bûn û nebûn
Ey bro û ballat beyanî me'nîy nûn û qelem
Asman pîr bû le daxî xetî rûy to roj û şew
Sed çray hellkird û neybû wa sewadî yek reqem
To bîy û teşrîfî lewla û sîrrî mazaxel beêr
To û meqamî lî me'e alle, to bîy û nûrî qîdem*

Wefayî: 153-154

Wefayî di vê helbesta jorê de, di dema bicihanîna ferîzaya Hecê de nivîsîye wexta ku cara sêyemîn di sala 189an de berê xwe dide Hîcazê. Helbest ji 18 malikan pêk hatîye. Helbest tev ji bo stayış û meznahîya pêxember hatîye nivîsandin, tevî vê jî Wefayî helbestek din jî di heman salê de nivîsîye, helbest ji 12 malikan pêk hatîye û dibêje:

*Rohim be fidat ey gullî gullzarî medîne
Lutfit hebê rû wa bke meqsûdî me, dîne
Bew cêge bûyte şeref û qurb û meqamt
Lutfit bbê bimbexşe were curmê mebîne
Derman meke, hatûme hekîmî hemû derdan!
Derman bke cergim ke hemû konebrîne
'Umrêke denallm be umêdî gullî zart*

Carêkî bfermû ke çi haware? Çi şîne?

Wefayî: 266

Ji bilî van du helbestan, Wefayî helbesteke din jî, ji bo stayışa pêxember nivîsîye, helbest ji 12 malikan pêk hatîye, wexta dibêje:

*Ya Resûlellah dexîlek rûm nîye bême huzûr
Wek dîzan gerdenkeç û şermende wêstawm le dîr
Gerçî sermayem nîye xo musteheqqî rehmete
Rengî zerd û rûyî reş, mûyî spî û firmêskî sûr
Wek le goşey bêşeda mel bête tûşî dam û daw
Tûşî nefî û tûşî şeytan bûm xerîb û bê şu'ûr
Musteheqqî rehmetim, ey mestî heq! Ey destî heq!
Destî min bigre le nar û bimxe nêw deryayî nûr
Roh Leser lêwm nefesgîre, le nêw xewf û reca
Çawerrêy fermanî toye: çête der, ya bête jûr*

Wefayî: 186

Wefayî di vê helbesta serwe de hawara xwe dibe cem pêxember û ku ji ber guneh û sûçên xwe rûyî wî tune ku biçê rûye wî û rengqermîçî û rûzerbûyî li paşîyê rawestayê, tew bal kişandîye ser vê jî ku çawa roja qîyametê wî jî li rex qencan be, daxwaza bexşan û rehmete ji pêxember dike. Helbestkar di kom behsekî di helbesta xwe de behsa gunehbarî û halê xwe yêperîşan dike û daxwaza rehm û dilovanîyê dike da ku bi vê sedemê bigihêje nav deryaya ronahîyê û ji guneh û sûçên kirîn rizgar bibe. Naveroka helbestê vê ji me re dibêje ku wî helbest jî weke helbestên din di rîya Hecê de nivîsandîye û helbestkar ji sedema tawan û hîskirina gunehbarîya xwe nikarîye biçê zîyareta pêxember. Di dawîya helbestê de Wefayî hawar û gazîya xwe dibe ber pêxember û sond dixwe bi zatê navê ezîm ê Xwedê bi hawara wî ve bê û ji cezayê gorê û agire dojhê were parastin, carekî ji bo min lava ji Xwedê bike da ku rehmeta xwe bi ser min de bibarîne û min efû bike.

3.2.3. Pesindana Şêx Ubeydulahê Nehrî

Tevî ku yekdengîyek li ser helbestên wî tunebin jî. Wefayî yekalîkirina wan ku helbestên wî olî ne yan evînî ne û ji bo stayaşa pêxember û şêxan nivîsandine. Lê tevî vê jî ji bo balkişanda ser helbestên helbestkar ji me ve ronî dibe ku Wefayî di pişt hebesta olî û sofîgerêyê de giringîyeke taybetî daye helbesta stayaşê û di nav sitayîşên xwe de jî pirranî helbestên xwe li ser pesindayîna ji bo Şêxê Nehrî nivîsîne. Ya ku eşkere ewe ku giringdayîna helbestkar ji bo medh û senaya şêxên Nehrî. Ku ev jî dide nîşandan ku helbestkar yek ji mirîd û peyayên şêxê Nehrî bûye û çardeh salan di xizmeta wan de maye û wek nivîskar xizmet ji şêx re kirîye.

Wefayî ji bo ku nivîskarê taybet ê Şêxê Nehrî bûye, di heman demê de peywendîyekî rûhî û qayî bi malbata wan re hebûye û tim di xizmeta wan de bûye, peywendîya rohî û xoşewîstî ya Wefayî jî ku ji bo şêx û malbata wî hebûye wisa kirîye ku Wefayî di dîwana xwe de bi çend helbestan medh û stayaşa wan bike û şanazayî pê bike ku yek ji peya û mirîdê Şêxê Nehrî ye. Wefayî di stayaşa Şêx Ubeydulahê Nehrî de dibêje:

*Wek "Nehrî" çaw û meş'eleyî dill brro be taw
Bo ew dillbere ke gullbere peyxamî dill bere
"Nehrî" ke cêgeyêke hemû xakî sûrmeye
"Nehrî" ke cennetî gull û gullawî kewserê*

"Nehrî" xubarî 'etre buxarî buxûrî rût
Xakî terrî ke wişke hemû mîşkî ezferre
"Nehrî" wehaye "ba" le gullaw û gullateşî
'Enberifroşe xakî le kewser muxemmere
"Nehrî" ke xulde nehrî rewan selsebîlye
"Nehrî" ke pakî dar û dewen pakî 'enbere
"Nehrî" ke xakî qîbleme gullzarî gullbere
"Nehrî" ke şarî dîdeme cêrrawî dillbere
Dillber be lutfî hezretî barî metîbe

Gullber be nûrî rehetî daver munewwere

Wefayî: 224 225

Ev helbesta Wefayî ji 35 malikan pêk hatîye, helbestkar di vê helbesta serwe de li pey şopa helbestkar Nalî çûye di guherînên nameyên helbesta navbera Nalî û Salim de. Wexta helbestkar Nalî helbesta “Qurbanî Tozî Rêgetî Ey Badeyî Xoş Mirû” ji dûrî û xurbetê de ji Salim re dişîne, Wefayî jî bi heman şeweyê ev helbest ji bo Şêx Ubedulahê Nehrî nivîsîye û tede tayîşa bêdawîbûn a Şêx Ubeydulah kirîye. Digel ve jî stayîşa wesf û ax û warê Nehrî kirîye, bi vê jî weke buhuşt û ava kewserê êxistîye ber çavan. Herweha Wefayî di helbesteke din de dibêje:

Hicrî to rohan dekêşê, wesllî to rohan deda
Ey fîday zulf û ruxt bim! To mesîhayêkî dî
Min be çaw û gerdinî to teşne û xwênîn dllim
Awrî min danamrêne cam û mînayêkî dî
Qîblegahî 'arîfan kes wek 'ubeydilla nebû
'Almêkî wa debê bo xewsî bexdayêkî dî?
Her le teqdîrî Wefayî bû şewî dî meyfiroş

Heyfe bo to her deme deyr û klîsayêkî dî

Wefayî: 315

Wefayî di vê hebesta serwe de tayîşa Şêx Ubeydulayê Nehrî kirîye û tu kes weke Şêx Ubeydulayê Nehrî nebûye qibleya arif û Xwedênasan, ji ber wê dûrî ji cudahîya bi şêx re jîyana ji canê dikişe û bi wesl û gihiştina dîtina xwedanasekî weke Şêx Ubeydula, jîyan pê de tê, bi ya Wefayî ku Şêx Ubeydulayê Nehrî dike Mesîheke din be, yan Xewsê Bexdayekî din be di nav cileke din de. Di dawîyê de Wefayî hîs dike ku zilm lê hatîye kir in, ji bo ku meyfiroşekî xedarî lê kirîye, wek bêwefa navî bilêv kirîye û her carê di cihekê de xwe de digre.

Wefayî beşeke zêde ji dîwana xwe bi taybetî ji bo stayışa şêxên Nehrî veqetandîye, ev stayışkirin jî tenê di çarçoveya şêx de nemaye, ji ber ku hebestekî de sitayışa Şêx Ebdulqadirê kurê Şêx Ubeydula jî dike, tevî vê jî stayışên Wefayî çarçoveyeke berfirehtir girtîye nav xwe hetanî gihiştîye malbat û ax û cihwarê Nehrî jî girtîye nav xwe. Wefayî wextekî ji Şêx Ubeydula dûr dikeve û şêx jî ji ax û nîşitmana xwe tê sirgun kirin, ji dûriya ji şêx nerihet dibe û helbestekê dinivîse û dibêje:

Le baxan ah û nallîn dê, dellên şay nêw gullan royî

Le meyxanan seday şîn dê kewa pîrî muxan royî

Dellêy dewrî qemer, seyri felek, mîzanî gorrawe

Kewa gull zerd bû, sunbul têk çû, rengî erxewan royî

Leber çawî cihan bînim cihan tarîk bû nemzanî

Ne nûrî çawekanim çû, ne xurşîdî cihan royî

Le dûrî toye sûr bû çawekem bew girye me'lûme

Şefeq dê, kewkebîş helldê, ke mîhrî xaweran royî

Wefayî: 333

3.2.4. Xemgînî

Xemgînî weke yek ji taybetmendiyên sebka Iraqê ye li beranber babet “şadgerayî” ya ji nav helbesta sebka Xorasanî tê ku weke yek ji sîmaçêkerên helbesta sebka Iraqê tê qebûl kirin li hember helbesta sebka Xorasanî, êşkere ye ku xemgînî rasterast peywendîya xwe bi eşq û me’suq û wê rewşa nalînbar ve heye ku mirov di nav re dice, serdema serhildana sebka Iraqê jî peywendîya wê bi rewşa newekhev ve heye ku komek Îranî nav re derbaz bûne û bandoreke rasterast li ser derûniya şexsî ya civakê hiştîye.

Wa fîgar û rencerrom kafr be hallî min nebê

Bêqerar û eşkbar û, dûr le yar û derbeder

Wefayî: 91

Weku perwane degrîm û desûtêm dûr le zulfî to

Heta key min le daxî to herîqî aw û awr bim?

Wefayî: 107

Tevî vê jî dinyaya helbestkar tijeye ji gelek çîrok û serpehatiyên navbera aşiq û me’suq de, tijeye ji gelek cudabûn û pevgihîştinan, xweşî nexweşîyan, ji ber vê

xemgînî weke babetekî di nav helbesta Kurdî de peywendîyeke rasterast bi van babetan ve heye û vê jî wisa kirîye ku di helbesta Îranî ya wê serdemê de reng ve de.

Ji bo vê xemgînî li cem Wefayî ku di nav helbestên wî de bi şêweyek eşkere tîn dîtî, bingeha wan hemû guherînên bi ser dinyaya helbestê de hatîye, ji ber vê sedemê bûye babeta nav helbestên wî, xema Wefayî xema veqetîn û negihîştina me'şuq e, xema beşekî jî peywendîya wê bi dûrîya ji şêxê Nehrî ve heye.

Emin şayîm be to bû, çunke şahî xemrewênim bûy

Ke min şayîm le dill royîwe, îdî dill bekê şakem

Wefayî: 145

3.2.5. Bêhêvî

Diyardeya bêhêvîyê babeteke berçav e di nav helbesta Şa'îrên qonaxa sebka Iraqê de, eşkere ye ku ev bêhêvî di nav helbesta wê qonaxê de jî bi şêweyekî giştî hin peywendîyên wê yên rasterast bi rewşa sîyasî û aborî û civakî û exlaqî ya wê erdemê ve heye ku civata Îranê di nav de derbaz bûye. Hinek din aliyê peywendîyê bi babeta eşq û cudabûna ji me'şuqê ve heye, ji ber ku helbesta vê qonaxê tijiye ji çîrokên eşq û dildarê yê, tijeji çîrokên cudabûn û pevgihiştinê, vê jî bandora xwe ya rasterast li ser bîra her şexsekî civakê hebû û ji cureyên bêhêvîyê bikar dianîn, ji bo vê yekê babeta bêhêvîyê bû babeta nû nav helbesta sebka Iraqê. Sîmaya taybetî ya vê sebkê ji sebka Xorasanê cuda dike.

Bêhêvî li cem Wefayî bi şêweyekî giştî peywendîya xwe bi babeta eşq û cudabûna ji me'şuq ve heye, bi eşkere be eşkere bêhêvîyên bi vî rengî di helbestên wî tîn dîtî. Wek mînak; helbestkar dibêje:

Sed rrohe ger fîdakem nagem be xettuxallit

Min naomêdu mehrûm hîndû le gullşenitda

Wefayî: 29

Di vê helbesta serwe de bêhêvîya helbestkar peywendîyeke rasterast bi wesl û pevgihiştina me'şuq ve heye, helbestkar bêhêvî ye li hember ew ên ku kafir û zîrek in û dihêlin me'şuq û şad in, tevî ku eger helbestkar sed caran jî xwe bike qurban û qurban ji xwe re ji bo gihiştina me'şuq, bextê wî jê re ne yar e ku bigihê dîtina me'şuqa xwe û wî qebûl bike. Wefayî di helbesteke din de dibêje:

Wa têmege 'ezîzim kuştimitu naomêdbûm

Di vir de Wefayî bêhêvî li hember negihîştina me'şûqa xwe, ji ber wê berê xwe dide yarê û dibêje, wisa têngihêje bi guhnedanê min dikujî û bêhêvî dikî, eger destê min jî negihê te û nebim hêjayû qebûlê li cem te, razî me bi xwîna qurbanî bidim û bi navê gihiştina me'şûq û xwîna min bi gerdena te. Bi vekolîn û lêhûrbûn li ser helbestên Wefayî ev ji me re zelal dibe ku bêhêvîtiya helbestkar bi giştî peywendîya xwe rasterast bi babeta eşq û negihîştina me'şûq ve heye, bi awayekî ku helbestkar nikarîye bibe cihê qebûlê li cem me'şûq, lê liberxwedana Wefayî û qurbanîdan bi navê yarê, vê ji me re dibêje ku bêhêvîtiya Wefayî ne hetahetayî ye û bi ya wî rojek dê were dikare cihê xwe li cem yarê çêke û bidest ve bîne. Wek mînak, wexta ku dibêje:

Şewêke tarîk, rrêyêke barîk

Her beomêdî çiray cemallim

Wefayî: 122

Helbestkar tevî ku bêhêvîye li hember cudayî û negihîştina me'şûqa xwe, lê di heman demê de jî çavê tim li rêye, bi hêvîtiya ku cemala me'şûqa wî derkeve û wan hemû derd û nerihetîyan jibîr bike ku dinya lê tarî kiribûn. Ev jî bi wê wateyê ye ku tekane hêvîya helbestkar ew e ku bigihêje yarê li cem me'şûqa xwe were qebûlkin, beyî hebûn û qebûla wê, bêhêvî û perîşan e.

3.2.6. Rexnekirina Li Sofîyan

Rexine li sofîyan kirin babeteke din a dîyar e di nav helbesta helbestkarên klasîkî ya Îranî de. Bi şeweyekî giştî di helbesta helbestvanên qonaxa sebka Iraqê de jî xwuya dibe ku, helbestkarên vê qonaxê rexneyên xurt li sofî û zahîdan dikin, bi mebesta bidestxistina hinek pere û malê dinyayê û gihiştina meramên xwe, helbest û pênuşa destê xwe xerc kirine. Ji ber wê Wefayî jî di bin bandora heman ramanên helbestkarên sebka Iraqê de rexneyên li sofîyan kirîye, ji ber riheke pir dirêj û fereh ji bo durûtîyê li dûv xwe hiştine, ji bo gihiştina meramên xwe bîra alozîyan vekirine. Bi vê mebestê jî helbestkar di dîwana xwe de tenê di cihekê de qala vê tiştê kirîye û dibêje:

Rîşêkî gêju wêj bê, berrîya dûrudrêj bê

Muşkle û pûşe wişke, bêtemayeyi necatim

Wefayî: 112

Rexneyê tund li wan kesan dike û ji wan re dibêje berdan riheke dirêjû pehn feydeya wê çîye ku we ji bo durûtî û dinyaya xwe dirêj kirîye. Helbestkar ji vê têgihîştîye ku berdan riheke pehn û dirêj ji alîyê hin piranîya sofîyên zahîd ve ne tenê ji bo vê dinyayê, tew ji bo roja axretê jî tu feydeya wê çênabe, ji ber wê dibêje ez ne ji wan kesan im ku ji bo malê dinyayê û gihiştina meramên xwe kareke wisa bikim. Ji ber ku helbestkar dilrihete ku dîndarîya pêşçav nabe rizgarkerê helbestkar di roja axiretê de.

3.2.7. Vegera Helbestkar Bo Derûna Xwe

Vegera bo nav dilê xwe û derbirîna hestan bi rêyê wek yek ji taybetmendiyên fikrîna sebka Iraqê tê qebûlkirin ku ji alîyê sedem ve helbesta helbestkarên vê qonaxê ji hev tîn cudakirin ji qonaxa berîxwe û helbesta sebk Iraqê, girîngî dayîna xwe û vegera helbestkarên vê qonaxê di wê wateya girîngîdayîna dinyaya nav hundurê helbestkar û perawêzistina dinyaya derveyî ya helbestkar e. Ango helbestkarên vê sebkê ji bo agahîdayîna bîr û hestên xwe vegeerîyane nav dinyaya xwe ya hundurîn û bi vê rêyê agahî û agahîyê ji rewşê û guherînan dane ku di dewrana wê demê de hêj cihê têrraman bûye, ji ber wê yeke em balê bikişînin ser helbestên wî vêya dibînin ku bi awayeke eşkere ji bo derbirîna bîr û hestên xwe di piranîya helbestên xwe de vegeerîyaye nav dinyaya xwe ya hundurîn û bi wê rêyê agahî di derbarên qewmînen ku çêbûne pêşkeş kirine ku rastî wî hatine. Wek mînak, wexta ku dibêje:

Hênd leber awrî fîraq û îştîyaqit mamewe

Bûbe koyz û xall derûnim, bûbe xwên can u ciger

Wefayî: :83

Yan jî di helbesteke dinde dibêje:

Tebîbêkm nîye derdî derûnim bê mudawaka

Heta mawim be omêdî şîfa her çawerrêy mawim

Wefayî:132

Babeta eşq û îrfanê ku wek du babetên herî berbiçav di nav helbesta sebka ya Iraqê de tê qebûlkirin, helbestkarên vê sebkê jî bi rêyê helvbestên xwe kirine awêneya derxistina babete wijdanîyan û ji bo vê mebestê jî xwe avêtine ber stara

hundurê xwe ji agahîdana li ser vê babetê. Ji ber wê lêhûrbûna li ser her du beytên jorê ji me re zelal dike ku dinyaya helbestkar tijeye ji çîrokên eşq û eşqbazîyê, tijeye ji cudahî û tamezroyên gihştina hev. Ji ber vê helbest dîyardeya wê ne ku helbestkar di nav birrek rewşên dijwar û asê re derbaz bûye. Ev hemû dijwarî û zorî ji ber maşûqa wî ye ku di encamê de hemû endamên bedena wî wisa şewitîye û rastî nalînê bûye, ji ber vê sedemê nikare hawarê bigihîne tu bijîjkekî û ji wê nerihetî û zorîya jîyanê wî rizgar bike. Helbestkar di ciheke din de dibêje:

Degrîm û legell ahî derûn sozî dillim dê

Wek berqî beharî ke le 'eynî zullmat bê

Wefayî: 307

Di vir de helbestkar bi rêya derdê dilê xwe agahîyê li ser wê rewşa dijwar dide, vê rewşê jî bi me'suqa xwe ve girê dide, me'suq li cem wî çavkanîya hemû derdû kulan e, ji ber wê tem di nav giryan û fixanê de agirê eşqê mîna birûskên ewrên biharê hemû canê dişewitîne.

3.2.8. Esîrbûna Me'suq

Wek ji taybetmendîyên hizirmendên helbesta sebka Iraqê tê qebûl kirin, peywendîya pir bilind û bi paye bi me'suqê ve heye, bi wê wateyê ku dema aşiq dibe esîrê me'suq, ew encama mezin dîtîne ye û me'suqe di asta nizmîya wî de ye, Wefayî jî peyrewîya vê hizrîyeyê kirîye û di çend helbestên xwe de bi şeweyekî ron û eşkere dibe esîrê me'suqeyê, wexta dibêje:

Ey saqî xerabatî, qetrêk awî heyatî

Aman destî minit daman! sûtawî nêw zullmatim

Wefayî: 112

Wefayî di vê helbestê de bûye esîre me'suqa xwe û daxwaza alîkariyê jê dike ku dilopek ji ava heyatê bidîyê û ji wê tengîniya tarî rizgar bike, her ji ber vê sedemê helbestkar rojên dijwar derbaz dike. Herweha di devereke din de helbestkar bûye esîrê li ber deriyê me'uşq de, tika jê dike û dibêje:

Bequwey cazîbey diltan Wefayî destu damane

çi nabê ger le sayey êwe qet'î (ma swî alle)kem

Wefayî: 152

Di vê helbestê de Wefayî li ber deriyê me'suq de tikaxwaz e û lava jê dike ku ne ji bo xatirê helbestê, ji bo xatirê mirovçakan û ewlîyayên me û ew ên ehlê rêya

gihiştina me'suq in efû bike û bixe jêr siha xwe, da ku bi vê sedemê bibe kesekî rohanî û biçê nav rêza mirov mirovçakan û ewliyayan. Di devereke din de zelîlî û şa'ir ji me re zelal dibe ku bê çawa ji ber yarê rastî bêlayê hatîye, wexta ku dibeje:

Eger zulfî wekû min 'aşqî ruwî to niye boçî

Serapa têk çuwe kewtote berpêt dest û damane?

Wefayî: 255

Di vir de helbestkar bi dest û ling esîr ketîye ber lingê yarê û balkişandîye ser wê tiştê ku bê çawa aşiq berê wî li yarê ye. Wisa dikeve ber lingê yarê, dibêje:

Newek min bellku zulfî me'suq xoşî eger

Weku min destewdamani ruwî to bêt

Wefayî:125

3.2.9. Aşiq Di Bin Lingê Yarê De

Babeteke din jî di nav helbesta helbestkarên sebka Iraqê de heye, bi qurbanî dana şair bi xwe ye, bi hawayek ku helbestkar amadeye bi ax û xwelî li ber derêyê yarê. Wefayî jî di çend deveran de bal kişandîye ser vê tiştê ku beranber qebulkirina ji alîye me'suq ve, amadeye ne tenê bibe ax û xwelî li ber derêyê yare ku yar bixwaze ew dibe kûçikê ber derêyê yarê û şev û rojê dorevanîyê bike. Bi rengêkî li bin lingê yarê û dorevanîkirin li ber derêyê maşûq ji her xweşî û xweşkîya li ser rûyê dinyayê heye giringtir û pîroztir e.

Axir segî xakî derî to bûm becudayî

Mirwetine bû tîxt Leserî seydi heremda

Wefayî: 34

Di vê helbestê de xwuya dibe ku Wefayî jixwe ne bi xwestekî weke dorevanîya ber derêyê yarê kirîye, xizmet kirîye ji ber ku tîxa maşûq li serê wî kertîye û naxwaze ji me'uşqî cuda bibe, tew bi qasî çirkeyek jî be. Herweha helbestkar di helbestek din de dibêje:

Muqîmî xakî derkey to herîmî ceninete cêgay

Be lutfî to çkem nabê minîş rrîzey seganit bim

Wefayî: 102

3.2.10. Me'suq Di Asta Lehengê Nav Dastanan De

Giringîdayîna helbestkarên sebka Iraqê li me'suq û bilind lê nihêrîn li yekî din wek babetekî ya nav helbestên sebka Iraqê de tê qebûlkirin, ji ber ku helbest di

qonaxa vî sebkê de hilgirê babetên curbicur e, ew babet tev di çarçoveya eşq û didarêyê de xwe dibînin. Me'şuq di helbestên helbestkarê wê serdemê de bi berawirdîya serdemê berî bingeh û asteke xwe ya bilind heye û bi çavekî bilind li me'şuq hatîye nihêrîn, bilindîya bingeh û asta me'şuq jî di vê serdemê de bi cureyek ji cureyên di asta pêlewani de di nav çîrokan de tê dîtin, ev jî li ser wê bingehê hatîye avakirin ku eşq di nav çîrokên navdeng de, bi navê gihiştina me'şuqê amade ye canê xwe jî gorî bike. Ev jî bi çaveke bilind me'şuqê nihêrîne di çavê aşiq de, helbestkarê vî rengî yên vê qonaxê bi sûd wergirtina wan bingeh û astên me'şuq ê di nav çîrokên navdeng de helbestên xwe dariştine û me'şuq kirine babete herî serekî û di serê helbestên xwe bingeh û asteke bilind veqetandine. Ji ber wê weke helbestkarekî Kurd ku bi ser sebka Iraqê amaje bi bingeh û asta bilind a me'şuq kirîye, bi rengê wisa giringî dayîye ku me'şuq li cem helbestkar di asta pêlewaniya di nav çîrokan de û tew ji wê jî bilindtir e; wek mînak, dema dibêje:

To çunke le leyla gelê şîrîntirî boye

Mecnûnî deru deştîm u ferhadî zemanîm

Wefayî: 125

Di vê helbestê me'şuq heman navdêrî û pileya ji bo Leylayê hatîye dayîn kar anîye, tew ji ya wê jî zêdetir pesn nîşan daye û xwe jî anîye şûna Mecnûn û Ferhad, bi şêweyekî berê xwe dide me'şuq û jê re dibêje: “Dezanî bo mecnûn asa deşt û derim girtote ber û weku ferhade zimanîm?” ji ber ku tu gelek ji Leyla şîrîntir î. Bi vê jî helbestkar karîye cih û meqamê me'şuqa xwe bi ser Leyla ya Ferhad re deyne. Tevî vê jî helbestkar vê jî eşkere dike ku nabe loma ji 'aşq werekirin, di her bizavekî ku bi ji ber me'şuqê tê pêşîya wî, me'şuq jî di kiryar û gotinên wî de di asta me'şuqa di nav destanên folklorî de be.

Ruhmtpêmdanehatşîrînxudagîrbî

Rohîbotodana ferhadî mîskînt

Boç her Wefayî bû şet bû wekêwan kewt?

Sed xusrew ferhade bo lêwî şîrînt

Wefayî: 71

Herweha di vir de helbestkar me'şuqa xwe di asta Şîrîna nav destana folklorî ya Şîrîn û Ferhad de danîye, dibêje nabe lomeyan ji min bikin ku weku Ferhadî, ji bo gihiştina me'şuqa xwe bi çîyan ketîye. Li cem helbestkar pir hêsayî ye, ku ji bo

gihîştina me'şuqa xwe berê xwe bide çîyayan. Tew vê jî dibêje heke sed weke Xesro Perwîz aşiqê lêvê Şîrîn bin, divê weke Ferhad rîya çîyayan bidin ber xwe, ji ber wê pêwîst nake bi dîv qedera Ferhadê bikevin heke ji ber lêvê Şîrînê bibe şet û şeyda.

3.3. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Taybetmendiyên Edebî

Guhartina sebka Xurasanî ji bo sebka Iraqî tenê di çarçova taybetmendiyên zimanî û fikrî de nayê dîtin, belkî ew guhartin form û ruxsara helbesta vê qonaxê jî dixwe digire, ew guhartin jî wek êk ji dîyartirîn taybetmendiyên helbesta vê qonaxê tê hejmartin û qalba helbestê di vê qonaxê de dibe xezel. Lewra di dîwana Wefayî de ev yek behtir xuya dibe ku helbestên Wefayî yên kurdî, ji xezelê pêktên û bikaranîna taybetmendiyên sebka Iraqî dihête dîtin, ku em jî bivê awayî didin nîşan

3.3.1. Xezel

Guherîna sebka Xorasanî bo sebka Iraqî bû xaleke guherînê di dîroka edebîyata vê qonaxê de, ew guherînkariya jî bi tenê di çarçoveya edebîyata Farsî de nema, belkî cîhan bi tewahî dagirt, eşkereye ku ew guherîna ku bi ser helbest û edebîyata vê qonaxê de hat, tenê guherîna navnîşana Xorasanî nebû bo Iraqî, belkî tewahîya form û rûxsar û naveroka helbestê bi xwe ve girt û guherîna qalibê qesîde bû bo qalibê xezel. Ew yek jî di encama vê rewşa nebaş de bû ku civaka Îranê û herêma herêma Mukiryânê di bin bandora helbestkarên vê qonaxê û hilketiyê herêma Mukiryân helbestên xwe vehûnandine û piraniya helbestên wî jî li ser qalibê xezel nivîsandin, ew yek jî li çav helbestkarên din ên Kurd di pêşengiyê de bûye. Digel vê yekê de jî pişka herî zêde ji helbestkarên Kurd nabe ew yek ji bîra me here ku pişka herî zêde ya helbestkarên klasîk ên Kurd bi awayekî berfireh xezel û qesîde û parçe helbestên navdaran tevî helbestên xwe kirine ku ew yek jî bi tenê bo derxistina hêz û deshîlata wan bixwe bûye bi ser helbest û edebîyatê de. Wefayî jî bêpar nebûye ji vê test û ceribandîna û mînakek bilind bûye di asta helbest û xezelê de ku mînaka herî berçav ya vê têkelkirinê jî xezela navdeng ya Hafîzê Şîrazî ye ku dibêje:

Baxewanî xuld, perwerdey menîcey kirduwe

Fêrî sed naz û nyaz û şerm û îşwey kirduwe

Her be şîrey canî şîrîn perwerîdey kirduwe

*Gullbunî qeddit le qubbey sîne xunçey kirduwe
Xunçe bem şîrînîye qet neyşeker neykirduwe
Zulfî to, dû roje pencey ba be şaney kirduwe
Çawî to ahûy perre şermî le surmey kirduwe
Pisteket emro ke her wek xunçe xendey kirduwe
Nexlî ballat newbere taze şkofey kirduwe
To ke boy şîrt le dem dê em memet key kirduwe*

Wefayî: 119

Ew xezela Hafîz Şîrazî rengvedana tewaw bi ser helbestên helbetsvanên Kurd de hebûye û di helbestên wî de bi eşkere derdikeve ku bi vî rengî wan deshilata xwe bi ser xezel û di asta helbestkarên navdar ên Fars ceribandîye, keynî vê yekê ku Wefayî bandora rasterast ya Hafîz Şîrazî bi ser de heye û di çend cîyan de jî îşareyê dike ku di bin bandora helbestên Hafîz Şîrazî de helbestên xwe vehûnandine, yan perçe helbesteke Hafîz Şîrazî tevî helbestên xwe kirine û di heman demê de Wefayî yekemîn helbestkarê herêma Mukiryan e ku bi awayekî nazik û zelal karîye xezela Nalî wergire û bi vî rengî karîye ku mil bi milê Nalî here pêş dema ku dibêje:

*Ela ey saqîy mestan! Be heqqî pîrî meyxan e
Be gerdiş bêne camî mey be yadî çawî canan e
Eman ey mutrîbî meclîs be heqqî tarî rohanî
Blla bê nexmekey sazt ke awî awrî hîcrane
Eto ey rohekem saqî, eto ey 'umrekem mutrîb
Peyapey lêde çeng û ney, demAdem bêne peyman
Be tîrî xemze bimlawênewe zulfîm le gerden ke
Beser hatûme meydant, be dill bot bûme nîşane*

Wefayî: 253

3.3.1.1. Taybetmendiyên Xezela Sebka Iraqî Li Cem Wefayî

Xezela sebka Iraqî xwedîyê taybetmendîya xwe ye û wê cuda dike ji sebkên din û xwe li “paş serwa, texelûs û peyrewkirina hunera rewanbêjîyê” dibîne. Wefayî ê helbestkar jî ku bi pêşengê helbestkarên herêma Mukiryan tê zanîn, karîye ku peyrewîyê ji taybetmendiyên xezela sebka Iraqî bike bi vî sedemê ve jî, hêz û deshilata xwe bi ser helbest û edebîyata Kurdî de biceribîne û peyrewîyê bike ji taybetmendiyên sebka Iraqî ku pêk tên ji ên xwarê:

3.3.1.1.1. Nasnav (Texelus)

Îşarekirina bi navan nasnavê helbestkar di dawî xeta helbestan yan misre`a dawîyê de, wekî yek ji sîma û taybetmendîyên edebî ên dîyar ên xezela sebka Iraqî tê danîn. Helbestkar bi girîngî ve lê dinêrin û di deqa helbesta vê qonaxê de reng vedaye, wekî eşkere ye helbestkarên Kurd jî bi taybetî ewên ku ser bi sebka Iraqî ne û taybetmendîyên vê sebkê di vehûnandina helbestên xwe de berçav girtine, ew bê par nînin ji bikaranîna “texelus”ê di dawîya xezel û helbestên xwe de. Ew yek jî bi sedema nêzikîya cihê coxrafî û bandora helbestkarên Fars bi ser wan de, lewra di çarçoveya vê taybetmendîyê de Wefayî jî, wekî helbestkarekî naskirî yê Kurd û hilketîyê herêma Mukiryar perwerdeyê jîngeha bin deshîlata Îranê bû û bandora rasterast ya vê jîngehê bi ser wan de dîyar e ku temenek tê de buhurandîye û di bin vê bandorê de jî helbestên xwe nivîsandine û di beşa herî zêde ya helbestên xwe de îşare bi navê xwe kirîye. Wefayî di dawîya xezelê de îşareyê bi navê xwe dike û dibêje:

Wefayî bo guleke serûbala şê û şeydaye

Weku qumrî denalênê weku bulbul xezelxane

Wefayî: 335

Wefayî wekî “Texelus” îşare bi navê xwe kirîye ku bejna evîndê weha ew şê û şeydayê xwe kirîye ku xwe kirîye hevrenge qumrî û bulbulan û qumrî çawa jê re dinale, yan jî çawa bulbul evîndara bax û gulistanê ye, jê re dixwîne, ew jî bi heman şêweyî ji bo bejn û bala yar, kar û pîşeya wê bûye ah û nalîn û xezelxwendin. Herweha di helbesteke din de îşareyê bi halê perîşan ê xwe dike ku çavkanîya vê bêhalîyê jî vedigere bo yara wî.

Xoşxanî meclisî gul, bênewe coş ruh u dil

Bêhal e zor Wefayî, fîday deng û sewdatim

Wefayî: 235

Herweha helbestkar di cihekî din de îşareyê bi navê xwe dike ku yara wî gotîyê, hekî tu ji dil li min hez dikî, eva bo min bigrî. Jiber ku lêwên min mercan in û nirx û buhayêke bilind heye, bo bidestxistina mercanê jî tenê rondikên te ne ku bikarin bigihîjin nirxa vê mercanê lewra dibêje:

Çi wek Wefayî bendeye lew baxî dill gull xendeye

Bew came xizrî zîndeye "haza terîq û l'aşqîn"

Wefayî: 182

3.3.1.1.2. Redîf

Bikaranîna hunera paş serwa û girîngîdana bi wê li cem helbestkarên sebka Iraqî berçav dikeve û wekî yek ji taybetmendiyên vê sebkê tê hesibandin. Paş serwa "pêk tê ji hatina peyvekê yan zêdetir û paş serwa di dawîya hemû xetekê de dubare dibe û ew helbesta ku paş serwayê hatibe, dibêjnê muredef" (Ezîz Gerdî 1999: 162 - 163). Bi vî awayî îşareyeke rohn û zelal jî bo bikaranîna serwa li cem helbestkarên klasîk ên Kurd heye ku wa peyrewî ji vê hunerê kirine, Wefayî jî wekî helbestkarekî klasîk girîngî daye bi paş serwayê û di helbestên xwe de bi awayekî berçav ew huner tê dîtin, dema ku dibêje:

Yar hatewe destî dilî xom girt û be ser çûm

Can qabilî canan nebû, nemzanî be ser çûm

Wefayî: 251

Di vir de Wefayî "Be ser çûm" wekî paşserwa bi kar anîye bo vê beytê û di dawîya her du misre`ian de dubare kirine. Herweha di cihekî din de "Heyatî min" dikete paş serwa ya xwe dema ku dibêje:

Erê xendey demit, aram, dil, kan, heyatî min

Le ser çî zîz debî, rohit dewê hanê heyatî min

Wefayî: 162

3.3.1.2. Kêş

Wek yek ji destûr û bingehên herî sereke ên helbesta klasîk û bi taybet jî qonaxa helbesta sebka Iraqî tê danîn, digel serwa de dibin bi du bingehên sereke û bingehîn ku helbesta vê qonaxê li ser hatîye avakirin, "jiber ku bandoreke mezin li ser pêkanîna mosîqaya helbestê heye" (Erselan Bayiz Îsmail, 2003: 181). Eşkere ye ku kêş û serwa li gora taybetmendiyên vê qonaxa helbest û edebîyatê, pê re derbaz dibe û guhertin bi ser de tê û ji zimanekî ve bo zimanekî din, ji gelekî ve bo gelekî din cuda dibe, lewra hekî caran kêş û serwa wekî du bingehên sereke ên helbestê girîngî pê hatibe dan û helbestkar bi girîngî ve helbestên xwe li ser ava kiribin, eva îro rojê di edebîyata hevçerx de helbestê kunceke din wergirtîye, jiber ku caran pêwendîya di navbera helbest û edebîyatê de li ser bingeha lojîk bû, lê îro rojê zêdetir

girîngî dane wezn û qafiyê ku bandoreke rasterast dike ser derûna xwîner û bîser û pêwendîyeke kûr di navbera mosîqa û helbestê de ava dike, lewra kêş pêk tê ji sistemeke rêkxiraw a dengî û helbest pêve girêdayî dibe, yan bi gotineke din, “kêşa helbestê awazdar e û awaza helbestê jî ji deng ve tê” (Ezîz Gerdî, 2014: 9). Bi vî rengî peywendîya di navbera helbest û mosîqayê, pêwendîyek e li ser bingeha yekîtiya rîtmê û awaza deng, awaz jî “regezeke dîyar û eşkere ya aliyê derve ya helbest û soza hestiyarbûna helbestkar e” (Dilşad Elî, 1998: 86). Wate pêwendîya di navbera kêş û mosîqa pêwendîyeke dilxwaz e û helbest û edebîyat li ser hatîye avakirin, bi vî awayî jî “helbest axavtineke kêş û serwadar e û bas ji wateyê dike” (Xelîl Îbrahîm Mistefa, 2009: 25).

Derheq bi kêşa helbestên Wefayî jî pişka herî zêde ji helbestên wê li ser bingeha kêşa ‘erûzî ya ‘Erebî hatine danîn, bi awayekî ku “kêşa helbesta Wefayî li ser behrên ‘erûzî diçin û li çaw helbestkarên din ên klasîk ên Kurdî kêşên li cem Wefayî zor in” (Marûf Xeznedar, 2010: 370). Kêşên ‘erûzî ên helbesta Wefayî pêk tên ji “Hezec, Remel, Recez, Muzarî’i, Besît, Muctes” herçend ku peyrewkirina van behran li cem Wefayî û di helbestên wî de berçaw dikevin, digel vê yekê de jî bi awayekî berfireh peyrewîyê dikin ji kêşa “Hezec û Remel” û helbestên wî li ser wan hatine avakirin ku du kêşên herî carr di nava helbest û edebîyata klasîk a Kurdî de tene danîn, Wefayî li rex bikaranîn û peyrewkirin ji qalibên kêşên ‘erûzî çend qalibên din wekî “Pêncîn, Pênc xiştekî, Tercî’i bendî” nivîsandine ku pêştir li cem helbestkarên Klasîk ên kirmancî a jêrîn nehatine dîtin, lewra em li jêr de bi awayekî kurt, şeweya bikaranîna qalibên ‘erûzî ên helbestên Wefayî dixin rû ku pêk tên ji.

3.3.1.2.1. Kêşa Hezece

Kêşa hezec wek yek ji kêşên herî carr ên helbesta klasîk û bi taybet helbesta klasîk a Kurdî tê danîn, helbestkarên Kurd bi awayekî gellek zêde peyrewî jê kirine û helbestên xwe li ser ava kirine. “Sedema bilavbûna wê jî di helbesta Kurdî de ew e ku digel xasîyeta zimanê Kurdî de hev digre” (Ezîz Gerdî, 1999: 138). Digel vê yekê de jî ew behre di zimanê Kurdî de çarîn û şeşîn û heştîn heye li çav zimanê ‘Erebî. (Nûrî Faris Hemexan, 2004: 350). Wefayî yê helbestkar jî bi awayekî berçav peyrewî ji vê kêşê kirîye, bi awayekî ku ji koma (148) tekstan (82) tekst li ser vê behrê hatine

avakirin û peyrewî ji (7) qalibên cuda kirine ku bi rêjeya (% 55.405) ji koma helbestên wî ne. Di jêr de bi kurtî mînak ji bo qalibên vê kêşê weha ye:

1. Hezeca Heşt Ya Temam

Ew qalib ji heşt pê (mefa'îlen) bi vî awayî ji (16) beşan pêk hatîye, bi vî rengî (4 + 4 +)

Be xorrayî niye sûtawî rûte 'aşqî şeyda

Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun

U - - - U - - - U - - - U - - -

Le rûtî dîwe cîlwey ateqî ((sîna)) le sîneyda

Wefayî: 41

Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun

U - - - U - - - U - - - U - - -

2. Hezeca Heşt Exreba “Mekfûf” a “Mehzûf”

Ew qalib ji heşt pêyan pêk hatîye, xwe ji (14) birgeyan pêk hatîye, birgeyên wê weha ne: (3 + 4 + 4 + 3).

Lew şare xedengî senemêkim le ciger da

Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îl fe'ûlun

- - U U - - U U - - U U - -

Şoxêke xemî ayînedarî be qemer da

Wefayî: 31

Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun

- - U U - - U U - - U U - -

3. Hezeca Şeş Ya Mehzûf

Xoşe rojê le 'alem derbeder bim

Mef'ûlun mefâ'ilun fe'ûlan

U - - - U - - - U - -

Le nêw ewza'î dunya bêxeber bim

Wefayî: 104

Mef'ûlun mefâ'ilun fe'ûlan

U - - - U - - - U - -

4. Hezeca Heşt Exreba Mefûf Ya Meqsûr(Îmaleya Kurt)

Ey huqqeyî şehd û şekerit abî heyatim

Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlan

-- U U - -U U - - U U - -

Mirdim, be beden bênewe bew abe, heyatim

Wefayî: 108

Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlan

-- U U - -U U - - U U - -

5. Hezeca Heşt Ya Musebbex

Le jêr zulfî sîya rûy xiste der çawî le dunya kird

Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlan

U - - - U - - - U - - - U - - -

Şewî dî, subhdem goya, derî meyxaneyan wa kird

Wefayî: 71

Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlan

U - - - U - - - U - - - U - - -

6. Hezeca Heşt Ya Exreb

Wefayî tenê tekstek heye ku li ser vê qalibê avakirîye, ew yek jî pêwendîya wê heye bi kêmiya mosîqaya helbestê ku di vê qalibê 'erûzî de ye.

Naçête dillim xemzey peyweste keçî demxa

Mefa'îlu mefa'îlun mef'îlu mfe'ûlun

-- U U - - - -- U U - - -

Ew leşkrebê bergeşte her feth û zefer dênê

Wefayî: 327

Mefa'îlu mefa'îlun mef'îlu mefa'îlun

-- U U - - - -- U U - - -

3.3.1.2.2. Kêşa Remel

Ew kêş duyem kêşa 'erûzî ye piştî kêşa hezec ku helbestkarên klasîk peyrewî jê kirine, jiber ku remel kêşeke awazdar e û awaza wê jî sivik e, di zimanê Kurdî de bi

awayê şeş pêngav û heşt pêngav tê dîtin, yek ji wan kêşa ye ku zêde bi kar hatîye û helbestkarên Kurd girîngî danê, jiber ku “kêşeke gellek sivik û xewşe, digel awaz û aheng û rîtma goranî û çepikan de ku gellek rêk û kok e” (Abdulla Xidir Mewlûd, 2010:52). Wefayî jî awazdanerekî behremend bûye, pişka herî zêde ji vehûnandinên wî her bi Goranî hatine nivîsandin, lewra ew kêş li cem Wefayî wekî qalibê duyem ê kêşê ye, bi awayekî ku (44) tekst li ser vê qalibê hatîye nivîsandin ku dike (%29.729) ji koma helbestên wî û xwe di şeş qalibên cuda de dibîne. Bi vî awayî:

1. Remela Heşt Ya Mehzûf

Her ke dî cennet be rûda zulfî pirrtabî şika

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
 - U - - - U - - - U - - - U - -

Tarî sunbul, hurmetî gull, bergî sîrabî şika

Wefayî: 43

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun
 - U - - - U - - - U - - - U - -

2. Remela Heşt Meqsûr (Îmaleya Kurt)

Roh Leser lêwim nefesgîre, le nêw xewf û reca

Fa'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilan
 - U - - - U - - - U - - U U -

Çawerrêy fermanî toyê: çête der, ya bête jûr

Wefayî: 86

Fa'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilan
 - U - - - U - - - U - - U U -

3. Remela Heşt Mexbûn Ya Mehzûf

Mestî ew nêrgse kallem degrîm bo lebî to

Fa'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fa'ilun
 - U - - U U - - U U - - U U -

Şîşe bo camî şerabim kullî giryem le gerû

Wefayî: 189

Fa'latut fe'ilatun fe'ilatun fa'ilun
 - U - - U U - - U U - - U U -

4. Remela Hešta Mexbûn Ya Eslem

Çi telîsmêke? Çi sîhrêke? Çi sewdayêke?

Fa'latun fa'latun fa'latun fa'ilun

- U - - - U - - - U - - - - U

Serî zulfî ke dused çînî be hewdayêke

Wefayî: 236

Fa'latun fa'latun fa'latun fa'ilun

- U - - - U - - - U - - - - U

5. Remela Hešta Ya Temam:

Roj û şew to bûyte qurban şîwen û şînî dllî min

fa'latun fa'latun fa'latun fa'latun

- U - - - U - - - U - - - U - -

Karî bulbul fesllî gull nallîne ta ahêkî mabê

Wefayî: 302

fa'latun fa'latun fa'latun fa'latun

- U - - - U - - - U - - - U - -

6. Remela Şeşa Mexbûn Ya Mehzûf

Qed gull û rû gull û dermanî gull e

fa'latun fe'latun fe'ilun

- U - - - U - - - U - -

Raste emrro gulle xermanî gull e

Wefayî: 238

fa'latun fe'latun fe'ilun

- U - - - U - - - U - -

3.3.1.2.3. Kêşa Recez

Ew yek ji kêşên sivik û awazdaner e, sivik û awazdarbûna wê jî bi sedema vê guherîna carr e ku bi ser pîtan de tê, dikeve bazineya sêyem, Wefayî ê helbestkar jî tenê (6) tekstên wî hene ku li ber vê kêşê dikevin û bi du şewazên cuda derdikevin, ew jî recez a heşt ya tewaw û receza çar ya murefel e. Peyrewkirina vê kêşê li cem Wefayî dike (%4.54) ji koma helbestên wî.

1. Receza Heşt Ya Tewam

Ey dill were hoşyar bbe hza terîqul'aşqîn

Mustefa'îlun mustefa'îlun mustefa'îlun mustefa'îlun

- - U - - - U - - - U - - - U -

Mehuy cemallî yar bbe hza terîqul'aşqîn

Wefayî: 179

Mustefa'îlun mustefa'îlun mustefa'îlun mustefa'îlun

- - U - - - U - - - U - - - U -

2. Receza Çar Ya Murrefel

Nexoş û mestî dû çawî kallm

Mustefa'îlatuun mustefa'îlatun

- - U - - - U - -

Heqim be deste eger bnallm

Wefayî: 122

Mustefa'îlatuun mustefa'îlatun

- - U - - - U - -

3.3.1.2.4. Kêşa Muzarî`

Ew kêş kêşeke lêkdayî ye û ji du pêyan pêk hatîye, herçend ku li çav zimanê ‘Erebî ji alîyê helbestvanên Kurd ve gellek bi kar hatîye. Lê Wefayî bi awayekî kêm mînak hawara xwe birîye ber vê kêşê û tenê (4) tekst li ser qalibê vê kêşê ava kirîye ku ew jî bi du awayên cuda derketine ku pêk tên ji “muzarî` a heşt ya exreb û muzarî` a heşt ya exreba mekfûf” ku bi vî rengî dike rêjeya (%2.702) ji koma helbestên wî ku helbestên wî li ser hatibûn avakirin.

1. Muzarî`a Heşt Ya Exreb

Herçî le ser to gerra şad bû be dewletî rût

Mef'ûlu fa'îlatun mef'ûlu fa'îlatun

- - U - - U - - - U - - - U - -

Zulfî şkiste boyê destî le dament da

Wefayî: 29

Mef'ûlu fa'ilatun mef'ûlu fe'ilatun

- - U - U - - - U - - - U - -

2. Muzarî'a Heşta Exreba Mekfûf Ya Mehzûf

Ey xoş xeber nesîmî seher peykî 'aşqan

Mef'ûlu fa'ilatun mefa'îlu fa'iatlun

- - U - U - U - U - U - U -

Ey qasîdî nyazî her aware wa were

Wefayî: 223

Mef'ûlu fa'ilatun mefa'îlu fa'ilatun

- - U - U - U - U - U - U -

3.3.1.2.5. Kêşa Serî

Ew kêş kêşeke bilez û awazdar e “bi sedema zorêyê, sebebên sivik tê de hene, jiber ku “sebeb” bileztir ji “weted”an têne bilêvkirin” (Yasîn Ayiş Xelîl, 2011: 138). Di zimanê Kurdî de gelek bi kêmî bi kar hatîye, lewra Wefayî tenê yek teksta di qalibê kêşa bilez de heye û bi vî rengî ew yek dike (% 0.675) ji koma helbestên helbestkar.

1. Serî'a Şeşa Mektub Ya Meşûf

Bem rux û leb meylî gullistan meke

Mufte'ilun mufte'ilun fa'ilun

- U U - - U U - - U -

Hetkî gull û xunçeyî xendan meke

Wefayî: 233

Mufte'ilun mufte'ilun fa'ilun

- U U - - U U - - U -

3.3.1.2.6. Kêşa Besît

“Ew kêş, ji kêşên dirêje û ji bo mijarên curbicur bi kar hatîye” (Ezîz Gerdî, 1999: 172). Lê di zimanê Kurdî de kêmtir tê dîtin, li çav kêşên din, lewra Wefayî jî

tenê yek têkst li ser kêşa bilez (besît) avakirîye ku dike (% 0.670) ji koma helbestên wî û xwe di yek qalibî de dibîne.

1. Besîta Heşt Ya Mozal

Dîsan nesîmî behar, nerm nerm hate xwar

Mustefte'îlun fa'îlun musteffte'îlun fa'îlan
 - U - - - U - - U - - - U -

Dunyay zîndû kirdewe be emrî perwerdgar

Wefayî: 76

Mustefte'îlun fa'îlun musteffte'îlun fa'îlan
 - U - - - U - - U - - - U -

3.3.1.2.7. Kêşa Muctes

Vê kêşê çendîn qalibên curbicur ên wê hene û kêşeke nerm û sivik e û ji bo xezel û qesîdeyê bi kar hatîye, lewra helbestkar jî peyrewî jê kirine, lê muctes “di zimanê Kurdî de, bedela çar, heşt tefîlên wê hene û hertim (mustef'elen) li şeweya (mefa'elen) de tê dîtin” (Abdulrezaq Bîmar, 1992: 119). Ew kêş li cem Wefayî tenê di yek mînakî de derdikeve ku dike (% 0.675) ji koma helbestên helbestkar.

1. Muctesa Heşt Ya Mexbûn

Nesîmî baxî gulle ya 'ebîr û 'etre debarê

Mef'ûlun fa'îlatun mef'ûlun fa'îlatun
 U - U - U U - - U - U - U U - -

(tuîy şekru şeknî ya zi zulfê nafe guşayî?)

Wefayî: 298

Mef'ûlun fa'îlatun mef'ûlun fa'îlatun
 U - U - U U - - U - U - U U - -

A	Cureya Kêşa 'Erûzî	Hejmara Qalibên Bikarhatî	Hejmara Tekstê	Rêja Sedî
1	Kêşa Hezec	7 Qalib	82	55.405 %
2	Kêşa Remel	6 Qalib	44	29.729 %

3	Kêşa Recez	3 Qalib	6	4.54 %
4	Kêşa Muzarî`i	2 Qalib	4	2.702 %
5	Kêşa Serî`i	1 Qalib	1	0.675 %
6	Kêşa Besît	1 Qalib	1	0.675 %
7	Kêşa Muctes	1 Qalib	1	0.675 %
B	Deste Pî	Kêşa Birgehî	Hejmara Tekstê	Rêja Sedî
1	8 Birgeyî	(4+4)	3	4.729%
2	12 Birgeyî	(6+6)	2	4.729%
3	7 Birgeyî	(4+3)	2	4.729%
4	10 Birgeyî	(5+5)	1	4.729%
C	Bê Kêş	-	2	1.351%
Giştî	-	-	148	100%

Wefayî herçend helbestkarekî ser bi xwendingeha klasîk e, piranîya helbestên wî li ser kêşa ‘erûzî hatine nivîsandin. Lê digel vê yekê de jî dîyardeyeke nû û cuda li cem wî tê dîtin ku pêştir li cem tu helbestkarekî din ê klasîk nehatîye dîtin, ew dîyardeya jî di bingeha xwe de li cem gelên Îranê hebûye. Wefayî jî di bin bandora wan de helbestên xwe vehûnandine, wate hemû ew kêşên sirûdên di Avesta de bi kar hatine û bûne bingeha kêşa şê`ira folklor û helbest Wefayî. Bi vî awayî jî Wefayî zêdetir li bi ronahîya helbesta folklor û stran û beyt û bendên carr ên Kurdî de helbest nivîsandine û bandora rasterast jî li ser xwîner û bîser hebûye. Wefayî ji koma (148) tekstên Kurdî (7) tekst li ser pişkên xomalî nivîsandine, bi awayekî ku sê tekstên wî heşt birgeyî ne û destpêka wan ji (4+4) pêk hatîye ku dike (%4.729). Herweha (2) tekst (12) birgeyî ne û destpîyên wan ji (6 + 6) pêk hatine û dike (%4.729) bi rêjeya sedî ji koma helbestên wî, ya ku dimîne (2) tekstên din in ku yek ji wan heft birgeyî ne û destpîyên wê ji (3 + 4) pêk hatîye û yê din jî li ser deh birgeyî hatîye avakirin û destpîyên wê ji (5 + 5) pêk hatîye, bi vî rengî dike (%4.729) ji koma helbestên Wefayî.

Lewra bi baldana bi helbestên Wefayî ew yek ji me re eşkere dibe ku ew cureya ladana û dûrketina ji kêşa ‘erûz, li cem tu helbestkarekî din ê vê qonaxê û helbestvanên din ên klasîk nahê dîtin. “Hêmin” di jêrnûsa dîwana Wefayî de derbarê

kêşa yek ji helbestên Wefayî de li jêr navê “Areq rûy dagirt” de dibêje: “Kêşa vê xezelê wisa dixuye ku afirandina helbestkar bixwe be. Di axavtina tu helbestkarekî din de, min wa nedîtîye û nahê bîra min ku di helbesta Farsî de jî tişteke wilo hebe”. Herweha nabe ku ew yek jî ji bîra me here ku Wefayî ê helbestkar xeyrî vê ku peyrewî kirîye ji kêşa ‘erûzî û çend helbestên din li ser beşên xomalî de nivîsandîye. Digel vê yekê de jî du tekstên din di dîwana wî de berçav dikevin ku alozkaw û bêkêş in, ew du tekst jî bi rêjeya (%1.351) ji koma helbestên helbestkar pêk anîye.

3.3.2. Di Xezelên Kurdî Yên Wefayî De Hunerên Rewanbêjîyê

Girîngîdana bi hunerên rewanbêjîyê û derketina wan di helbesta vê qonaxê de yeke din ji taybetmendîyên sebka Iraqî ye, ew girîngîdana helbestkarên sebka Iraqî li çav helbestkarên din ên berî vê qonaxê, zêdetir berçav dikeve, helbestkarên sebka Iraqî cudatir ji helbestkarên berî xwe girîngî dane hunerên rewanbêjîyê û afirandin tê de kirine ku hunera nû anîna nava edebîyatê de. Lewra Wefayî jî di bin bandora van helbestkaran de hem wekî helbestkarekî naskirî yê herêma Mukiryana û hem jî wekî helbestkarekî naskirî ê nava edebîyata Kurdî desteke bilind hebû, di vehûnandina helbestan û peyrewkirina hunera rewanbêjîyê. Bi awayekî ku girîngî daye hunera rewanbêjîyê, heya astekê ku kêma helbestkar hebûye ku destên wan bigihîje Wefayî û bikare peyv û peyvsazî û listikên rewanbêjîyê di helbestên xwe de bi kar bîne. Jiber ku Wefayî helbestkarekî hûrbîn bûye di hilbijartina peyvên û li hevhatina wê digel hunera rewanbêjîyê de. Ya ku di vir de ji me re girîng e, ew e ku em zêdetir wan hunerên raxînin ber çavan ku di helbesta Wefayî de hene û berçav dikevin ku ev in:

3.3.2.1. Rohnbêjî (Beyan)

“Hemû wan tiştan bi xwe ve digre ku di warê guzare de alîyê edebî nîşan didin, yan bîr û bawerîyekê digrin û dixin rû, da ku guhdar yan xwîner bikare bigihîje kok û binetara nerîn û nîyeta xwe û jê têbigihîje” (Ezîz Gerdî, 1972: 18). Mijarên herî girîng ên rohnêjîyê jî ev in:

3.3.2.1.1. Hevrenkirin- Wekandin- Mînandin (Teşbîh)

Hevrenkirin (Mînandin) li ser bingeha daneberhevê hatîye, wate tişteke bişîbhîni tişteke din, yan jî wan berhevdan bikî, bona vê ku di sifetekê de yan zêdetir ji sifetekê de xaleke wan ya hevpar hebe. Ew tiştên ku digel tişteke din didî ber hev ku

sifeta giştî tê de zal e. Ew tiştta ku mijara sereke ya basê ye, dibêjnê “lêçû”, ya ku bo daneberhevê jî hatîye dibêjnê “lewçû”. Herweha sifeta hevpar ya di navbera “lêçû” û “lewçû” jî di warê “daneberhevê”. “Ewzar” jî ew alav û emraz e ku bingeha şibhandinê bi hev ve girê dide (Îdrîs Abdulla 2011: 118). Lewra weha ye “şibhandin wate peydakirin û vedîtina xaleke şibhî hevdu bi armanceke dîyar” (Ezîz Gerdî, 1972: 22), bi vê wateyê ku hunera şibhandinê avakirina wêneyek yan çend wêneyan e ku di encama peydakirina pêwendîya şibhandinê ye di navbera hin tiştan bi armanceke xûya.

Bi vê armancê jî “şibhandin hunereke çalak e di bingedanîna wêneyên helbestan” (Rêyhan Resûl Ehmed 2017: 90). Çalakîya wêneyên helbestê bi vê wateyê ye ku pişka herî zêde ya erk û wezîfeya piroseya bi şê iriyetbûna mijara edebî dikeve stûyê vê hunerê. Jiber ku wêneya helbestê di encama lihev nêzîkbûna komeke regezan pêk tê û her bi vê sedemê ve jî wêneyê helbestê ava dibe. Wefayî jî wekî helbestkarekî hilketî ê di nava edebîyata Kurdî helbestkarekî klasîk û pêşengê helbestkaran tê danîn û desteke bilind hebûye di hilbijartina wêneyên şibhî hevdû. Bo mînak ew dibêje:

Her lehze Wefayî wekû bulbul ke denalê

Kes men î neka ke eşqî (gulendam)î le serda

Wefayî:32

Helbestkar di vê beytê de bi anîna çar bingehên şibhandinê ku helbestkar xwe şibhandîye bi bulbulê, di nalînê de, ew jî bi sedema vê eşqa gulendam ya ku di serê wî de ye. “Wefayî: Lêçû, Weku: Ewzar, Bulbul: Lewçû, Denalênê: Rûyê şibhadinê”. Wefayî di helbesteke din de dibêje:

Qametî to nexlî tûre teletî to nûrî tûr

Dem be dem wa wechî cîlwet mest û heyranîm deka

Wefayî: 46

Bi jêhûrbûna li vê beyta helbesta Wefayî eva bi awayekî gellek rohn û zelal hest bi vê şibhandinê tê kirin ku bejna yar şibhandîye bi dara xurmê, di dirêjî û rêkbûnê de. Herweha rûçikê yar jî şibhandîye bi çîyayê Tûr, di ciwanî û nûranîbûnê de, bi vî rengî karî du bingehên serekî ên şibhandinê di vê beyta helbestê de kom bike ku pêk tên ji “Lêçû û Lewçû” “Qametî to: Lêçû, Nexlî to: Lewçû” “Teletî to: Lêçû, Nûrî to: Lewçû”

Ew botey sewdaserî kirdum be zulfî bê mîsal

Çawxezal, bala nîhal, ebro hîlal, gulwecnete

Wefayî: 211

Di vê helbestê de Wefayî îşare bi vê dike ku şet û şeydayê evîna xwe bûye, şet û şeydaya Wefayî jî vedigere bo vê ku çavên yar tu dibêjî ka çavên xezalê ne, bejn û balaya yar wekî nîhal e, birêyên wê wekî meha yekşewe ye, rûyê wê jî tu dibêjî ka gul e. Bi vî rengî helbestkar kariye wêneyeke şibhandinê bixe rû, di hîlbijartina cureya peyvê û daneberheva wan digel endamên cesteya yar. “Çaw: Lêçû, Xezal: Lewçû”, “Bala: Lêçû, Nîhal: Lewçû”, “Birî: Lêçû, Hîlal:Lewçû”, “Cenet:Lêçû, Gul: Lewçû”.

Perwane sîfet suxteyî şewqî çiraxim

Wek bulbulî şeyda hemû sûtawe demaxim

Wefayî:356

Herweha Wefayî di vê helbestê de du wêneyên şibhandinê avakirîye û di misre`a yekem de xwe di sîfetê de şibhandîye perperokê ku sotîyê yarê ye û di misre`a duyem de cardin xwe şibhandîye bulbulê ku agirê eşqa yar difna min şewitandîye, “M” Helbestkar: Lêçû, Sîfet: Ewzar, Perwane: Lewçû, Suxteyî şewqî çirax: Rûyê şibhandinê”, “M” helbestkar: Lêçû, Wek: Ewzar, Bulbul: Lewçû” .

3.3.2.1.2. Xwaza (Mecaz)

“Curek e ji cureyên hunera rewanbêjîyê û bi wateya anîna navê tişteke ye bo tişteke din, ew yek jî bi sedema veguhastinê ye ji regez ve bo cur, yan ji cur ve bo regez” (Ezîz Gerdî, 2004: 78). Wate bikaranîna peyvekê bedela peyveke din cuda ye ji wê wateya ferhengî ku jê re hatîye danîn, bo avakirina peywendîya di navbera du tiştan di çarçoveya tenê yek peyvî de. Ku wisa bû xwaze “hunerek e ji hunerên rewanbêjîyê, li ser bingeha veguhastina watayekê ji cihê resen a xwe hatibe veguhastin, bo cihekî din, bi sedema hebûna hevparî û pêwendîyekê di navbera her du wateyên resen” (Derya Cemal Hewîzî, 2009: 143). Wefayî dibêje:

Wa xistmî çawî ke be daw zulfî welada

Şew rûyî, beyan berbû, emin her le xewa bûm!

Wefayî:137

Di vir de peyva “Çaw” xwaze ye, wateya wê ya resen ji çavên yar ve hatîye wergirtin ku helbestkar bi vê sedemê ve mest û serxweş bûye, bi vî awayî

hevparêyeke qahîm û bihêz di navbera her du wateyên resen û wateya jê re xwastraw avakiri ye.

Lale serta pê xwênawe, cergî le çend cê sûtawe

Dilî her wek min şêwawe, daxî zolf û rûy yarî girt

Wefayî:57

Xwaze li peyva “Lale” de ye, helbestkar di vê helbesta serwe de sîfeta mirovî bi lale bexşîye, bi vê sedemê ve bi vî awayî karîye wateya wan peyvan ku di bingeh de bo mirov bi kar tên, veguhêzin bo lale û pêwendîyeke qahîm di navbera wateya resen û peyvan ku sifet in bo mirov û wateya veguhastî, ava bike.

3.3.2.1.3. Xwastin (Îstîare)

Hunera xwastin, yekek e ji hunerên rewanbêjîyê û pêwendîyeke bihêz digel hunera lêkçiwandin (şibhandin)ê heye, jiber ku pêk tê ji wê şibhandina ku tenê yek ji du kokên bingehîn ên şibhandinê tê de hatibe, yan bi awayekî din em dikarin bêjin ku xwastin cureyek e, ji hunera rewanbêjîyê, di zanista rewanbêjîyê de û bi berçav rengê hunera şibhandinê dide, lê yek ji bingehên sereke ên şibhandinê veşartî ye û nehatîye baskirin. Lewra xwastin “pêk tê ji bikaranîna peyvekê bo derbirîna watayeke din ji bilî wateya rast û dirust ya peyvê, bi mercekê pêwendîya di navbera wateya dirust û wateya xwaze ya peyvê şibhandin hebe, dibe nîşaneyek jî hebe ku ew armanca ji vê peyvê, wateya xwastrawe ye, nek wateya wê ya dirust” (Ezîz Gerdî, 1972: 69). Yan em dikarin bêjin ku navdanîna li ser tiştê ye bi navê tiştêke din, hekî cih girt. Herweha xwastin li ser yek bingehê disekine, ew jî “lewçû yan lêxwastraw”e, yan jî “lêçû yan bo xwastrawe” (Serdar Ehmed Hesên Gerdî, 2002: 238).

Bingehên sereke ên “xwastin”ê jî pêk tên ji lêçû û lewçû. Bi berçavgirtina van du bingehan jî xwastin dibe du cur, ew jî ya yekem: “Xwasta Eşkere” îstimara tesrîhî “eva ye ku di du bingehên şibhandinê de lêçû û lewçû tenê lewçû mabe û bi êşkere di cihê peyveke din de bi kar hatibe” (Îdrîs Abdulla, 2011: 195), her çî bingeha a duyemîn “Xwasta Dirkawê”, îstimara mekenî. “Ew xwaste ye ku ji du bingehên şibhandinê lêçû û lewçû tenê lêçû mabe û digel peywesteyêke lewçû erkê xwe bi cih anîbe” (Îdrîs Abdulla, 2011: 196). Wefayî di xezelên xwe ên Kurdî de çendîn wêneyên curbicur ên xwastinê ji me re dikêşe.

Mînak:

Şew be tay zulfî şewandim, roj le tawa detsûtandim

Çi xuda le to heldegrê be şew û be roj ezabim?

Wefayî: 96

Di vê helbesta serê de “Şew, Roj” xwastrawe bo “Zulf û Ruxsar” a yarê, peyva bingehê ku lêçû ye ji tu peyveke din nehatîye wergirtin, her çî ew sifetên ku xistine rex van du wêneyan, bi rîya wan sifetan ve bûye ku wa peyva “Şew û Roj” bo wateya wê a ferhengî bi kar nehatine, belkî xwastraw in bo endamên yarê ku kezî û rûçikên wê ne.

Mînak:

Min gutim: Ggirtî hebeş keibey cemalit? Ew delê:

Karwanî mîşke bo sari gul û nesrîn deba

Wefayî: 22

Herweha di vir de “Hebeş” a xwastrawe bo kezîyên yar, bi vê wateyê ku ew sîfeta di reş de ye, di tu peyveke din de nine, lewra helbestkar hatîye sifeta reş jê xwastîye bo kezîyên yarê, pêwendîya di navbera van du peyvên a şibhandin e û bi hatina yek ji bingehên şibhandinê û vêdebirina yek ji wan dibe xwastin.

3.3.2.1.4. Dirke (Kînaye)

“Derbirîna peyv yan riste ye li Rex Wateya bingehîn, mebest jê wateya peywest be” (Muhsin Ehmed Mistefa Gerdî, 2013: 226). Bi vê wateyê ku qîseker peyvek yan hevokekê eyan dike ku bi berçavan tenê watayekê digehîne, lê merem jê, wateya alîyê din ê peyvê ye ku tê famkirin, newatey a wê ya berçavkî, dema ku dibêje:

Zulfî rûy dapoşî, ebrot ereqnake

Rojyan kê kirîme şew bew mah u perwînit

Wefayî: 71

Di vir de bi awayekî nerasterast îşare hatîye kirin bi wê rewşa nebaş ku kezî û birî û çavên wê ku wekî heyvê ne, rastî vê rewşa nebaş bûye û zêde zora wê çûye û roj lê bûne şev, bi vî rengî dirke li “Rojyan lê kirdime şew daye” ew hedê bêdeshilatîya helbestkar e di hemberî yar de.

Wa têmege ezîzim kuştimit û naomîd bûm

Destim eger negeyîyê xwînim le gerdenit da

Wefayî: 30

Di vê helbestê de dirke di “Destim eger negeyîyê, xwînim le gerdenitdaye”, wate helbestkar di derbirîna “Destim eger negeyîyê” de ku di rastî de, nagihîje ya xwe û her bi vê sedemê jî sergêj û bêhêvî bûye, piştî dibêje ya ku xwe ku rûdana her karesatekê li pey yar ku tê serê helbestkar li stûyê wî bixwe ye, ew jî bi derbirîna “Xwînim le gerdenta” de dixê rû, bi van derbirînan helbestkar kariye ku wêneyeke ciwan ya rewanbêjîyê nîşan bide ku xwe di dirke de dibîne.

3.3.2.2. Ciwankarî (Bedî)

“Hunerek e ku dibe sedema zanista ciwankirin û xemilandina gotarê” (Îdrîs Abdulla, 2012: 15), yan bi gotineke din em dikarin bêjin ku “zanistek e ku bi kar tê bo ciwanîywêja, li pey guncandina digel warê pêwîstî a guhdar û xwîner” (Muhsin Ehmed Mistefa Gerdî 2013: 248). Bi vê wateya ku çawan li hitbara ciwanî û xemilandina peyv û wateyan vedikole. Herweha lêkolînê dike li ser du beşên ciwanîyê. Ew jî ciwanîya peyv û wateyê. Digel vê yekê jî dest dike bi cudakirina peyvên ciwan û di axavtina asayî ya rojane de, nazikî ku hitbara ciwanî û nazikîya helbestkarane nîşan dide di axavtina rojane de. Sedemên ciwanîyê jî pêk tên ji:

Ciwankariya Peyvan: Pêk tê ji vê beşa ciwankariyê ku li “awaz û mosîqaya peyvê vedikole û pejwak û dengvedan û awaza peyvan li her du astên asoyî û stonî de bi hev ve girê dide” (Îdrîs Abdulla, 2011: 224). Wate helbestkar dixwaze ku di warê bihêzîya mosîqaya vê helbesta ku derdibre û eyan dike rasterast bandorê li ser alîyê derûnî ê xwîner yan bîser çê bike û helbest bibe cihê balkêşana wan.

3.3.2.2.1. Hevherf- Regezdozî (Cînas)

“Ew e ku du peyv yan zêdetir bîne ku di berçavan, wekî hevdu bin, yan şibhî hev bin, lê ger yek ji wan wateya taybet bi xwe hebe ku cuda be ji wateya beşên din” (Îdrîs Abdulla 2011: 222). Wate ew peyvên regezdozîya tewaw wan digre xwe ku di forma xwe de bê cudahî wek yektir bin û wateya wan cuda be, hekî yek wateya wan hebû, eva regezdozî ava nabe. Bi vê wateyê ku helbestkar di helbestên xwe de “du sê peyv danê ku bi berçav wek yek bin û bi qasî mûyekê cudahî di navbera wan de nebe, lê digel vê yekê de jî wateya taybetî ya xwe hebe û wateya cuda hebe û rûçikê wan wek yek nebe” (Ezîz Gerdî, 1975:7). Bi vî awayî regezdozîya tewaw pêk

tê. Wate helbestkar du peyv an yan zêdetir li rex yektir dadinê ku wek yek bin û digel vê de jî wateya wan ya cuda hebe.

Lê heki “du peyv ku hejmara wan û şeweya rêzbûna pîtan wek hevdu be, lê di yek ji tîpan de cuda bin” (Îdrîs Abdulla, 2012:18). Eva regezdozîya tewaw pêk tê, di bin ronahîya vê pênasayê de, em digihîjin vê ku, ew peyvên ku regezdozîya tewaw wan digre di forma xwe de wek yektir nebin. Wate cudahî tenê li yek ji “hejmara dangan, cura dangan, rêzbûna dangan” hebe û li hev nêzik bin, Wefayî dibêje:

Yar hatewe dest û dilî xom girt û beser çûm

Can qabilî canan nebû nemzanî beser

Wefayî:136

Regezdozî ji peyva “Bi ser çû” de ye ku du caran bi kar hatîye, bi berçav wek hev in, lê di warê wateyê de cuda ne, Bi vî awayî regezdozîya tewaw çê dibe.

1. Bi ser çû: Be ser royîştîm.
2. Be ser çû: Helem kird.

Zerdî rûtim, beçawî to, şîfam bê lêweket nabê

Be heqqî abruy pîrî muxan saqî mey nabê

Wefayî:304

Regezdozî ji peyva “Nabê” de ye ku du caran bi kar hatîye û bi berçav wek hev in, lê di warê wateyê de cuda ne, bi vî rengî regezdozî a tewam avabûye.

1. Nabê: Naguncê û nakrê.
2. Nabê: Kurtkirî û bêhevta û hîlbijarde.

Le mêhnet be sefa nîweyî mahêkî temame

Dil aşiq û sewdaye mahêkî temame

Wefayî:241

Regezdozî ji peyva “Mahêkî temame” de ye ku du caran bi kar hatîye, di warê rûçikê de wek yek in, lê di warê wateyê de cudan e, bi vî rengî regezdozî tewaw dirustbûye.

1. Mahêkî Temame: Mangî çwarde şewe.
2. Mahêkî temame: Heyama mangeke tewaw a sî roje.

Bibarêne gul û nafe be xendey daxî baxane

Serî zulfî ke dem beste le dem beste eme beste

Wefayî:207

1. Dem Best: Wate perjîn kiraw
2. Dem Best: Wate devê xwe girê bide

Karu pîşey em dilem çi bikem xuda her zarîye

Seyrî firmêskim her wekû coge le çawim caîye

Wefayî:289

Regezdozî li peyva “Zarîye, Carî” de ye ku cudahî di cureya dengê “Z,C” de ye û bi vî rengî jî regezdozîya tewaw ava bûye.

Fermû werezim lew xerezey pir merezey ew

Razî merezî çawî ke pirsîm le eristû

Wefayî:194

Regezdozî li peyva “Werez, Xerez, Merez” de ye ku cudahî di cureya dengê (w, x, m) de ye, bi vî rengî regezdozîya tewaw avabûye.

3.3.2.2. Anîna (Redu’l Aciz ala Sedir)

“Pêk tê ji anîna peyvekê li destpêkê, yan li nawerastê yan dawîya misre`a yekem, yan destpêk û nawerasta misre`a duyem û heman peyv, yan peyveke hevgezê xwe di dawîya beytê de jî anîbe” (Îdrîs Abdulla 2011 :241). Ew hunera di helbest û pexşanê de peyrewî jê hatîye kirin. Wefayî jî bi awayên curbicur bi kar anîye, bo mînak, dema ku dibêje:

Ey huqqeyî şehd û şekerit abî heyatim

Mirdim, be beden bènewe bew abe, heyatim

Wefayî:108

Wefayî di vê helbestê de di dawîya misre`a yekem û duyem de, peyva “Heyat” bi kar anîye, her du peyv jî di bingeha xwe de hevşêwe û hevwateren e.

Segekey rêbazî leylê were ser du çawî mecnûn

Çawim ew roje lê rune xakî ber pêy aşna bim

Wefayî:349

Hekî em bala xwe bidin vê beytê, eva em dibînin ku helbestkar di dawîya misre`a yekem de û li destpêka misre`a duyem de peyva “Çav” bikar anîye, her du

peyv di bingeha xwe de hemşêwe ne û yek wata hene, bi vî rengî helbestkar karîye ku hunera anînê peyrew bike.

3.3.2.2.3. Dubarekirin (Tekrar)

“Ewe ku hunermend yan nivîskar peyvekê yan destewajeyekê yan hevokekê bibîne û çend caran jî vê dubare bike, bo çend meremên taybet, bi vê mercê ku wateya hemûyan jî wek yek be û ji carekê ve bo careke din wateya wan neguhere. Wate: Nabe ne bi berçav û ne jî di guzare de, tu guhertinek bi ser wan de bê” (Ezîzî Gerdî, 1975: 47). Ew huner pêk tê ji dubarebûna çend care ya peyvekê yan destewajeyekê û hevokekê, bi mercekê ku hemşêwe bin û heman wateyî bigehînin ku pêştir bi kar hatîye. Wefayî dibêje:

Eger çî new beharim be rengî baxî gul dî

Henarî newresîdem şikaw û xaw û bil dî

Wefayî:366

Helbestkar di vê helbesta serê de du caran peyva “Dî” bi armanca cuda bi kar anîye ku her du caran yek wateya wan heye û di şêwe û wateyê de jî wekî yek in.

Ew dilbere wa bebade be çawan defroşê

Herdem be tebessum lebî xendan defroşê

Wefayî:368

Herweha di vir de helbestkar karê “Difroşê” di dawîya her du misre`an bi armanca cuda bi kar anîye û her du peyv jî di koka xwe de hemşêwe ne. Helbestkar di cihekî din de dibêje:

Yaquttî lebî le'li kewa qûtî rewane

Rû baxî gul û dem gul û qed seruy rewane

Wefayî:348

Di vir de helbestkar peyva “Rewane” du caran bi kar anîye, di dawîya her du misre`an de ku her du caran jî bi armanca cudahîyê bi kar hatine, lê di koka xwe de her du peyv jî yek wate û şêweya wan heye.

3.3.2.2.4. Têkhilkêş (Tezmîn)

Yekek ji hunerên ciwankarîya peyv an e û “pêk tê ji têkhilkêşkirina hevokan û gotina kesekî din, bi vê vehûnandina ku helbestkarek ser ji nû dadirêje, îca ew gotin û hevok ayeteke Qurana pîroz yan emr û keremek, yan şîreteke pêşînan yan jî misre`i

û beyt û vehûnandina helbestkarekî din yan çemkeke me`rîfi yan her tişteke din be” (Îdrîs Abdulla, 201:257). Wate helbestkar bo ciwankirina vê helbesta ku dubare vedihûne hawara xwe dibe ber bikaranîna hevokan û gotina kesekî din yan ayetek û hedîsekê, yan jî şîret û beyt û vehûnandina keskî din di nava vehûnandina xwe de, bi bê îşarekirina bi xwedî û çavkanîya wê. Wefayî ê helbestkar desteke bilind hebû di hilbijartina cureya têkhelkêşan, bo mînak:

Mewcî deryay bêcê û sikûn, kêşamiye gêjawî pîrxûn

(Ina êleyhê raci`on),ya xewsî sanîhîmmetê

Wefayî:314

Helbestkar di vê misre`a duyem de beşek ji ayeta sûreya el-Beqere tevî helbesta xwe kirîye. {الَّذِينَ إِذَا أَصَابْتَهُمْ مُصِيبَةٌ قَالُوا إِنَّا لِلَّهِ وَإِنَّا إِلَيْهِ رَاجِعُونَ (156)}

Min çilon mehrûm bibim ey (rehmetelilalemîn)

Dê seday (la teqneto min rehmetulah) dem be dem

Wefayî:155

Di vir de beşek ji ayeta {وَمَا أَرْسَلْنَاكَ إِلَّا رَحْمَةً لِّلْعَالَمِينَ (107)} ya sureya el-Enbîya tevî misre`a yekem kirîye û di misre`a duyem de beşek ji ayeta {قُلْ يَا عِبَادِيَ الَّذِينَ أَسْرَفُوا { عَلَىٰ أَنفُسِهِمْ لَا تَقْنَطُوا مِن رَّحْمَةِ اللَّهِ إِنَّ اللَّهَ يَغْفِرُ الذُّنُوبَ جَمِيعًا إِنَّهُ هُوَ الْغَفُورُ الرَّحِيمُ } ya sureya (el-Zumer, 53) tevî helbestê kirîye.

3.3.2.2.5. Cotserwa

“Pêk tê ji avakirina helbestê li ser du qafiyeyan ku rawestan e li ser her beytek ji wan du qafiyeyan” (Abdulkerîmê Muderis, 1991:53). Ew cot serwa jî ku helbestkar bi kar tîne, tenê bo ciwankarîya peyvê ye û bi vêdebirina serwaya dervey helbestê jî serwaya navxwe cihê wê digre û dibe serwaya dervey helbestê, Wefayî karîye ku nêzî 55 helbestên xwe de paş serwa bi awayekî bi kar bîne, ew yek jî şîyana Wefayî û deshilata wî derdixe, di avakirina mosîqaya helbestê de, bo vê ku bandoreka rasterast li ser xwîner û bîser hebe, bo mînak:

Esîrî zulfi xawî tom,şehîdî remzî çawî tom

Emin gîrawî dawî tom,le sed cê dil birîndarit

Wefayî:57

Helebstvan di vê helbestê de du serwa danîne, peyva “Fîrquetê, Kewtetê” bi serwa danîye. Herweha peyva “Şerbetê, Hîmetê” kirine serwaya dervey helbestê, lewra bi vêdebirina her yek ji wan serwayan, serwayeke din dibe serwaya helbestê,

wate hekî serwaya dervey helbestê jî, vêde bibin, eva serwa a navxwe cihê wê digre û bi vî rengî awazeke xweş bexşîye helbestê.

Leber nazî Çawbazan ,xurd û xewm xwênawe

Be tîrî tîrEndazan,çi bikem cergim birawe!?

Wefayî:272

Di vê helbestê de helbestkar du serwa danîne, peyva “Çawbazan, Tîrendazan” wekî serwa hesibandîye. Herweha peyva “Xênawe, Birawe” kirine serwaya dervey helbestê, lewra bi vêdebirina her yek ji van serwayan, serwayeke din dibe serwaya helbestê, wate hekî serwaya derve jî em vêde bibin, eva serwaya navxwe cihê wê digre û awazeke xweş dibexşe helbestê.

3.3.2.2.6. Rexnekirin-Kertkirin (Teştîrî)

Ew huner di pexşanê de dibêjnê serwadar, bi vê wateyê ku eva helbestkar xeynî serwa a giştî ya helbestê serawayeke din di nava helbesta xwe de bi kar tîne, Îdrîs Ebdula derheq bi kertkirinê dibêje: “Kertkirin: Pêk tê ji vê serwaya ku xeynî serwaya giştî ya hunraweyê, helbestkar bo tefîle û destewajeyên nava beyt û misre`ên hunraweyê de dadinê” (Îdrîs Abdulla2012:18). Wefayî di xezelên Kurdî de hunera kertkirinê bi kar anîye li cureya kerta çar û şeş û heşt bo mînak:

Xozgem bewey sewdasere,ser ta pa zexmî xencere

Aw bê awir bê xebere,(fanî fî ullah) bê cê û meskene

Wefayî:177

Helbestkar ew beyta helbestê kirîye çar kert, kertkirin jî bi awayekî rêk xistîye ku sê kertên beytê hevserwa bin, kertê çarem serwaya serbixwe heye û digel serwaya giştî a helbestê de yek digre, bi awayekî ku serwaya çar kert a yekem “Ere” ye û serwaya giştî jî ku helbest li ser hatîye avakirin, “Ene” ye. Ew yek jî cureyek ji awazê bexşîye helbestê, lewra bi vê şeweya serwaya nav beytên helbestan, dibêjin “kertkirin”.

Bedrî senaberqî nebû,xerbî nebû,şerqî nebû

Herçîhebû,ferqî nebû,ya xewsî sanihîmmetê

Wefayî:314

Ew beyta serê jî kirine çar kert ku kertkirina wê jî bi awayekî hatîye rêkxistin ku sê kertên misre`a yekem û du kertên misre`a duyem a helbestê hevserwa bin, kerta şeşem serwaya serbixwe heye û digel serwaya giştî ya helbestê yek digrin, bi

awayekî ku serwaya pênc kert, yekem “Bû” û serwaya giştî jî ku helbest li ser hatîye avakirin, “Etê” ye.

Be kesk û sûr, bax derû jûr, pîrbû le nûr, wek kêwî tûr

Leber zuhûr, kewte huzûr, nizîk û dûr, deşt û demen Wefayî: 171

Herweha helbestkar ew beyt kirîye şeş kert, kertkirin jî bi awayekî rêk xistîye ku çar kert ên misre`a yekem a helbestê û kerta yekem jî pêncem û şeşem û heftem hevserwa bin û kerta heşt a serwaya serbixwe heye û digel serwaya giştî ya helbestê yek digrin, bi awayekî ku serwaya çar kert a misre`a yekem û sê kertên misre`a duyem li ser serwaya “Ûr” hatine danîn, her çî serwaya giştî a helbestê jî li ser hatîye avakirin pêk tê ji “En” e.

3.3.2.3. Ciwankarêyên Wateyîyên Xezelên Wefayî

3.3.2.3.1. Dijhev (Tîbaq)

Cureyek e ji hunerên ciwankarîya wateyî û pêk tê ji du peyvên wata û dijhev û berevajîyê yek, îca ew peyvane di ferheng de serbixwe bin yan jî a duyem neyînî a yekê be (Îdrîs Abdulla, 2012:88). Wate girîng nine ew peyvên ku dibin dij û berevajîyê yektir çî cure peyvek bin. Peyvên dijhev di ferheng de dij û berevajîyê hevin yan jî bi neyînîkirinê dibin dij û berevajîyê hevdu, lewra dijhev dibe du cur:

3.3.2.3.1.1. Dijhevîya Ferhengî (Tîbaq el-Îcab)

Ew cureya dijhevîyê di bingeh de peyvên dij û berevajîyê hev in, yan ew dijhevîya ku du peyvên wê di ferhenga ziman de her yek in û regeke serbixwe hene (Îdrîs Abdulla, 2012: 88). Wefayî bi awayekî berçav hawara xwe birîye ber bikaranîna peyvên ferhengî ên dijhev û di helbestên xwe de bi awayekî zor derdikevin.

Mînak:

Be derdê mubtela bûm cahîl û dana ke heyanin

Meger çawî nexoşî tom ne mexmûrim nehoşyarim? Wefayî:114

Di vê helbestê de dijhevîya ferhengî di peyva “Cahîl, Dana” de ye, ew du peyv li ferhenga ziman de dij û berevajîyê yektir in û Wefayî jî lêzanane li rex yektir bi kar anîye û bi vî awayî îstatîkya daye helbestê.

Zulfî lerzand kewte ser rû şadman fewcî dilan

Qet le dozexda ebed nîn, cennetîn ew ummete

Wefayî:210

Herweha Wefayî di vê beyta helbesta serwe de, bi hîlbijartina peyva “Dozex, Cenet” cureyek ji îstatîka bexşîye helbestê, di heman demê de jî, ew du peyv dijhev a çandî ne û di koka xwe de dij û berevajîyê hevdu ne û digel yektir li hev nahên.

3.3.2.3.1.2. Dijhevîya Naferhengî (Tîbaq el-Selb)

“Ew dijhevîya ku du peyv ên wê, yekî din înkâr dike, wate her du peyv di ferhenga ziman de yek reha wan heye, ne du rehên serbixwe” (Îdrîs Abdulla, 2011: 295). Wate hatina du peyvên ferhengî ye ku di koka xwe de yek reha wan heye, lê bi sedema emraza nefikirinê dibin dijî hev. Wefayî di hîlbijartina cureya dijhevîya naferhengî de jî ku bi sedema emraza nefikirinê dibin dijhev, desteke bilind hebûye.

Ey dem û xendet delîlî de `oyî bûn û nebûn

Ey bro û balat beyanî me'nîy nûn û qelem

Wefayî:154

Di vê beytê de helbestkar bi hîlbijartina peyva “Bûn û Nebûn” li rex yektir cureyek ji dijhevîya neferhengî nav bûye, ew dijhevîya jî li ser bingeha retkirinê ava bûye, bi bikaranîna emraza “Ne”, ne eva ku peyv di bingeh de li dijî yektir bin.

Derman meke, hatûme hekîmîhemû derdan!

Derman bike cergim ke hemû konebrîne

Wefayî:266

Herweha di vê beytê de jî emraza nefikirinê “Me” bi kar hatîye ku bi rîya peyva “Derman me, Derman bike” li destpêka her du misre`ên helbestê, dijhevîya naferhengî avakirîye, ew dijhevîya li ser bingeha nefikirinê ava bûye, bi bikaranîna emraza “Me”. Nebe ku peyv her di bingeha xwe li dijî hev bin.

3.3.2.3.2. Beramberî (Muqabelet)

Ew cureya jî yekek din e ji hunerên ciwankarîya peyvê ku waye helbestkar bo xemilandina helbestên xwe bi kar tîne. Beramberî “şêwazeke derbirînê ye, li ser

pirensîpa avakirina dijhevîyê, di peyv û wate û bîr û wêne, bo armanceke rewanbêjîyê û behayeke fikrî bi kar tê”(Îdrîs Abdulla, 2011:95). Bi vê wateyê ku ew huner li ser bingeha dijhevîyê tê, di navbera çend peyv û li hunera dijhevîyê bibandortir û bihêztir e. Bo mînak helbestkar dibêje:

Şew eger to mahtabî, întîzarî ta bekey?

Roj eger to aftarî, boç lehewran naye der?

Wefayî:90

Helbestkar di destpêka misre`a yekem de peyvên “Şew” û “Mahtab” anîye, li hember de di destpêka misre`a duyem de peyvên “Roj” û “Aftar” anîye, peywendîya di navbera wan peyvên de dij bi hev e, dijhevîya peyvên “Şew” li hember “Roj” e, “Mahtab” jî li hember “Aftar” e, bi vî rengî jî beramber ava bûye.

Tabbî serî kulmit bû kewa zulfî be bada

Ya rojî wîsalit şewî hîcranî welada

Wefayî:25

Herweha helbestkar di destpêka misre`a duyem de peyvên “Roj” û “Wîsal” anîye, li hember van peyvên de di dawîya heman misre`a duyem de peyvên “Şew” û “Hîcran” anîye, pêwendîya di navbera wan peyvên de pêwendîyeke dijhev e, dijheva peyvên “Roj” li hemberî “Şew” e, “Wîsal” jî li hember “Hîcran” e. Bi vî awayî hember avabûye.

3.3.2.3.3. Pêçan û Vekirin (Lef û Neşir)

Yekek e ji hunerên ciwankarêyê a wateyî, ew e ku çend peyveka li pey hev bînî û piştê bi qasî wan, peyvên din bînî ku pêwendîya wan bi ên pêştir ve hebe, bêy vê ku dîyar bikî ku kîjan peyv bo kîjan peyvî vedigere. Jiber ku ew yek pêwendîya wê heye bi asta xwîner ve û xwîner bixwe ye ku dikare peyvên vegeerîne bo yektir, pêwîste ew yek jî ji bîra me neçe ku merc ew e ku hejmara peyvên di destpêkê de ku bi kar hatine, digel ew peyvên li hember de bi kar hatine, bi qasî yek bin û ew pêwendîya di navbera wan de jî heye, pêwendîyeke guncaw be, lê digel vê yekê de jî nabe ku pêwendîya di navbera peyvên de hemû dijhev be, jiber ku wê demê dibe beramberî (Îdrîs Abdulla, 2012: 100-101). Wefayî dibêje:

Be goşey çaw û xalî lêw û xakî koy yar nAdem

Eger sed camî cem, abî xidir, ewrengî dara bê

Wefayî:306

Helbestkar di misre`a yekem de peyva “Goşey Çaw, Xakî Lêw, Xakî Koy Yari” li rex yektir pêçane û bi kar anîne, di misre`a duyem de jî peyva “Camî Cem, Abî Xizir, Rengî Dara” li hember de bi kar anîne û vekirin tê de ye, bi vî rengî pêwendîyeke şibhandî (lêkçûyî) di navbera peyvên beyta yekem û duyem de heye, jiber ku pêçan û vekirin jî li ser bingeha şibhandinê dibe, digel vê yekê de jî helbestkar di vê di vê pêçan û vekirinê de îşare bi vê nekirîye ku kîjan peyv li hember kîjan peyvî de bi kar hatîye, belkî wisa zanîye ku xwîner dikare peyvan vegeîne bo yektir.

Ulfetî zulfî çîye qurban legel ruxsarî to?

Xo behîç dînêkî nabê kufr û îman pêkewe

Wefayî:277

Helbestkar di misre`a yekem de peyva “Zulf” û “Ruxsar” bi kar anîye, di hember van peyvan de di misre`a duyem de peyva “kufr” û “îman” anîye ku bi vî awayî lê hatîye, peyva “Zulf” li hemberî peyva “Kufr” e, peyva “Ruxsar” jî li hemberî peyva “Îman” hatîye, bi vî awayî pêçan û vekirineke narêk ava bûye, bi bê vê ku îşareyê bi vê bike ku kîjan peyv li hember kîjan peyvî de bi kar hatîye.

Xariquladatî zulf û xal û xendey zarî to

Mîşk û enber, şehd û şekker, le`l û gewher pêkewe

Wefayî:278

Di vê helbestê de helbestkar di misre`a yekem de peyvên “Zulf, Xal û Xende û Zar” bi kar anîne û di hember de jî di misre`a duyem de peyvên “Mîşk û Enber, Lekker, Le`il û Gewher” anîne, bi vî awayî pêçan û vekirin di navbera “Zulf” û “Mîşk”, “Xal û Enber”, “Xende û Şekir” û “Zar û le`il û Gewher” heye, bi bê vê ku helbestkar îşare bi vê bike ku kîjan peyv li hember kîjan peyvê de bi kar hatîye.

3.3.2.3.4. Xweşbahane (Husnu Tehlîl)

Ev e ku her dîyardeyekê sedemke bo rastî û dirustîya xwe hebe, lê helbestkar bo xemilandinê û ciwankarêyê ya vê helbestê, dîyardeyê dixê gel tiştekekê ku rastî tê de nîye, yan pêk tê ji vê ku edîb bi eşkere yan bi veşartî sedema zanîna tiştekekê piştguh dixê, bêyê vê ku sedemeke ciwanîya edebî bo vê tiştê bîne ku guncaw be digel

ya ku armanca wî ye. Wate ew sedema ku helbestkar bo vê rewşê tîne, zadeyê xeyala helbestkar bixwe ye, ne ya rastîya derdorê (Îdrîs Abdulla, 2012: 108).

Mînak:

Wesl û giryan qurb û hîcrane terîqî aşiqî

Feslî gul boye le serçawan weha aw dêtexwar

Wefayî:84

Hejana “sewl û sinewber” dîyardeyeke xwezayî ye ku bi sedema hebûna ba û boranê tên û diçin, lê helbestkar ew dîyardeya xwezayî vê de daye û dibêje ku di bêdeshilatîya wan de evîndarê gulê bûne ku yara wî ye, lewra ew hejan û çûn û hatina sinewberan bi sedema gulê ve bûye, ne bi sedema ba û boranê.

Dem be dem serû û sinewber wa ke her dên û deçin

Aşiqin sewdaserin meczûbî gul bê îxtiyar

Wefayî:85

Eşkere ye ku demsala buharê demsala avzê ye, demsala şînbûna gij û gîya û teqîna ava kanî û zorbûna çavkanîyên avî ye ku ew yek jî dîyardeyeke xwezayî û gerdûnî ye. Lê Wefayî vê dîyardeya xwezayî dadinê qeraxê û vedigerîne ser yar, dibêje çavkanîya zorbûna avê di vê demsalê de bi sedema terîqeta rîya wesl û hîcrana aşiqan û nêzikî û giryanê ye ku çavkanîya zorbûna avê di vê demsalê de bi sedema vê ye.

3.3.2.3.5. Zêdekirin- Zêderewî (Mubalexe)

Pêk tê ji vê derbirîna ku helbestkar di mêşkê kesê hember de diafirîne, lê ku qiseker axavtina xwe tewaw dike, îca kesê hemberî wê, jê re derdikeve ku şaş bûye û ya ku ew jê têgihîştîye, tewaw berevajîya wan axavtinan e ku guh lê bûye (Îdrîs Abdulla, 2012: 148). Yan bi gotineke din helbestkar zêderewîyê dike di medhê de ku digel aqil û lojîkê de nagunce. Dema ku dibêje:

Ne qend tamî heye qurban, ne gulrêz û ne enber bo

Eger carêk be xendey bêy, serî zulfîrî be dem badey

Wefayî:337

Di vê helbestê de helbestkar zêde ji hedê xwe wesf û stayışa yar kirîye ku digel pêkenîna yar qend tama xwe ji dest dide û digel kezîyên yar de enber bêhna wê

namîne, ne gul jî ew qedrê caran dimîne, ew cureya medhê ya zêde ji qas ku digel aqil û lojîkê de nagunce, lewra ew beyt diçe qalibê şaşkirina kesê hember.

3.3.2.3.6. Nezanîya Bizanîn (Tecahu'l el-Me`arif)

Yekek e ji hunerên ciwankariyê, helbestkar bo xemilandina helbesta xwe peyrewîyê jê dike, “pêk tê ji, xwe şaşkirina helbestkar li hemberî vê tiştê ku pirsyarê lê dike jiber ku baş dizane ku rastî çî ye, yan çawa ye, lê bi mebesteke taybet bi vê şêweyê xwe şaş dike” (Îdrîs Abdulla, 2011:327). Bo mînak:

Serwe ya şimşade? Yaxo`erere, ya narewen?

Ya çinare ya ke tûbay qametî dildarîye?

Wefayî:290

Helbestkar di beyta serê de jî dubare pirsyar derheq bejn û bala yar kirîye, bi awayekî ku xwe ji rastîyan vedizîye, xwe şaşî kirîye, li hember ya ku dizane, piştê jî her bixwe hatîye û bersiva pirsan da ye ku eva dibînin gula bejna yara mine.

Serî zulfit çîye`Omrî dirêjm, tûlî amalim!

Qedî berzit çîye? Seruy çemen, rohî rewanî min!

Wefayî:168

Di vir de helbestkar bi awayekî pirsên xwe kirine ku bixwe di rastîyan de şaşî kirine, lê piştê her bixwe hatîye û bersiva pirsan daye, bi vî awayî ku di misre`a yekem de pirsê kezîyan kirîye û bixwe şaş kirîye, her çend ku dizane ku kezîyên yar wekî temen û hêvîya wî a dirêj e, di nava misre`a duyem de bixwe şaşî kirîye û pirsyar derbarê bejna yar kirîye. Piştê her bixwe hatîye ku bersiv daye û bas ji bejna yar kirîye, piştê her xwe hatîye bersiv daye ku bejna bilind ya yarê, di bilindîyê de wekî dara nav çîmen û derûna helbestkar dizane.

3.3.2.3.7. Vegêran (Terdîdu)

“Ew e ku peyvek yan hevokek yan destewajeyekê bibînî ku girêdayî watayeke taybetî ve be, piştê dubare heman peyv yan hevok yan destewajeyê bîne, lê vê carê pêwendîya wê heye bi tiştê ve” (Ezîz Gerdî, 1975:42). Bi vê wateyê ku eva vegêrana her yek ji peyv û hevok û destewajeyan li sînoren beytekê de bin û bi heman şêweya pêşîn, bi watayeke cuda bê vegêran. Bi mercekê ku vî peyv û destewaje û hevokane, di destpêkê de bi watayeke taybet ve girêdayî be û piştê ku dubare bûn, bi tiştê din ve bêne girêdan. Wefayî dibêje:

Wenewşe û gul lebaxan bû, le baxan şew çiraxan bû

Meger darûy nesaxan bû, be rûda zulfî tatakird

Wefayî:73

Di vê helbestê de helbestkar du caran peyva “Le Baxan bû” ku her carê wateya peyvê bo tişteki veğerandîye, bi awayekî ku cara yekem bo “Benewşe û Gul” bi kar anîye, cara duyem jî, bo “Şew Çiraxan” bi kar anîye, bi vî rengî kariye wateya vê peyva ku dubare kirîye, her carê bo tişteki veğerîne. Ew yek jî di cihê rewanbêjîyê de dibêjnê hunera veđeranê.

Beşîrîni ke can bexşî, be mehbûbi kedil kêşî

Eto her abî heywanî, eto her mahî kenanî

Wefayî:325

Di vê helbestê de peyva “Eto” du caran bi kar hatîye ku helbestkar ew peyv her carê veđerandîye ser tişteki, cara yekem bo “Aba heywan” û cara duyem jî bo “Mahî ken`an”.

3.3.2.3.8. Pêncîn

“Pêk tê ji perçe helbestekê li ser kêşeke ‘erûzî ku bi ser çend beytek yan beşek de hatîye parvekirin, her bendek jî pêk tê ji pênc misre`ên helbestê, hemû misre`i jî di benda yekem de li ser yek qafiyeyî ne, her çi bendên din in jî, çar misre`ên yekem li ser yek qafîye dibin ku ew qafîye a misre`a yekem a beyta helbestê ye, misre`a pêncem di hemû bendan de, li ser qafîyeya benda yekem dibe”(Marif Xiznedar, 1984: 184). Eşkere ye ku eva pêncîn zêdetir bo mijarên dirêj bi kar tê. Hemû ya yek helbestkarî ye û Wefayî jî roleke berçav hebûye, di darêtina pêncînê û çendîn pêncîn nivîsandine.

Mînak:

Ke zulfî kewte ser rû hemû xetay be çîn da

Xeramî tawusaney be seruy nazenîn da

Sifîdeyî beyanî be baxî yasemîn da

Fenayî pir beqa bû demî le pêkenîn da

Sed afetî le dîn da, şîrîn teşî derêşê

Wefayî:365

Herweha di pêncîneke din de dibêje:

Kutim ey şay dilnewazan mang û rojn muşterîy rût

Dilî çakî pakî bazan pê be dawî zulfî cadût

Le xemî wîsalî rûy to cger ûhenawî min sût

Xoş bû ew demey gul pişkût şeker debarî le yaqût

La delêm Wefayî deykut: Yo geda min şa bot nabim

Wefayî:350

3.3.2.3.9. Lêkkirin (Tefrîqa)

“Pêk tê ji avakirina cudahîya di nava du tiştên li yek cureyê de, îca her du jî medh û pesn bin, yan xeynî vê yekê jî bin” (Îdrîs Abdulla, 2011: 314). Bi vê wateyê ku wa helbestkar radibe bi danîna cudahîyê di navbera du tiştan de, yan du sifetan de, êdî cuda mehtkirin be, yan alîyekî din ê ... hwd.

Mînak:

Min delêm: Yaqût û reyhan xettî kamyar xoştire?

Ew be `eyyarî îşarey le'li xendanim deka

Wefayî:46

Di vir de helbestkar ser vê bawerîyê ye ku herçend ku di yaqût û mercanê de îlham heye, lê hêştî nagihîjine lêw û devê yar, helbestkar peyva “Yaqût û Mercan” pêkve anîne û cudahî xistîye di navbera wan de û ew jî li xetxweşîyê de karîye hunera lêkvekirinê peyrew bike. Yan di cihekî din de dibêje:

Min be dil,zulfî beser, kewtuyne ber pêy rehmît

Ey umêdî mu`imîn û kafîr be halim nezzerê

Wefayî:320

Wefayî bi komkirina peyva “dil û zulfî ser” ku her yek bi cureyekê ketine ber rehmêtê ku bi vî rengî cudahî xistîye di navbera peyvên de.

3.3.2.3.10. Pêkve Guncan (Mura`at el-Nezîr)

“Pêk tê ji çavdêrîkirina du hevweneyan ku ewe xwedîyê gotar û ew tiştên ku wek yek in, bi rêkî û nek li dijî narêkî, kom bike û bixe rex yek” (Mela Abdulkerîmî Muderis, 1991: 8). Wate helbestkar yan nivîskar du peyv, yan du destewajeyan li rex yektir dadinê. Bi mercekê ku her du peyv yan destewaje pêkve guncaw bin û li dijî yek nebin.

Mînak:

Qîble gorawî (Wefayî) aşiqî sadiq nebî

Bê sefay dil `omrekem, ew se`îye her derdîsere

Wefayî:222

Di helbesta serê de helbestvan îşareyê bi eşqeke heqîqî dîke, eşqek ku bo gihîştina bi vê, hewcehî bi dil û derûn safkirin û tekoşîna di pêxemê de heye, lewra helbestkar kariye peyva “Sefa û Omr”. Herweha “Se`îy û Qîble” li rex yektir de kom bike ku pêwendîya pêkve guncanê di navbera wan de heye. Bi vî rengî jî hunera mura`ata nezîrî peyrew kirîye.

Lew rasteyî bazare çî naden be dilî min

Her merhemetî toye xirîdarî eyaxan

Wefayî:158

Di vê beytê de Mura`ata nezîr di navbera peyva “Raste, Bazar, Xerîdar û Eyaxan” de heye û bi vî rengî ew yek bi sedema hebûna pêwendîya guncan û lihevhatinê di navbera peyvan de bûye.

3.3.2.3.11. Mulemmeh`i (Mulemeh)

“Pêk tê ji helbestekê, yan çend helbestan ku bi zêdetir ji zimanekê hatine nivîsandin, bi mercê bikaranîna her zimanekê bo kêmtir ji misre`ekê yan risteyekê ku nehatibe kurtkirin, îca bi her du zimanên muleme`ê hatine nivîsandin, yan bi sê ziman, yan çar ziman, herweha dibe hemû helbest jî ya helbestkar bixwe be, ne tiştek ji helbestkaran wergirtibe”(Îdrîs Abdulla, 2011: 268). Wefayî mulemmeh bi zimanê Kurdî û Farsî heye, bi cureyekê ku dibêje:

Bo lebî canan –be çawit– min ewa bûme kebab

((Dustan saqî koca ta derdehed camê şerab))

Sew be roj alawe ya sunbul le dewrî bergî gul?

((Ya perîşan geştê ber ruyê tu zolf por zi tab))

Ta bizanin roj û şewn herdû le layek dêne der

Zolf û ruyê xud eyan kon ber fîken bendê niqab))

Wefayî:52

Xeynî vê ku mulemmeh a Kurdî û Farsî, Wefayî mulemmeh a Kurdî û ‘Erebî jî heye û bi awayekî gellek şareza ew yek dariştîye dema ku dibêje:

Seyrî afaq û enfusî, behsî le sefhey dil nûsî

Ga bethayî ga quddûsî, rehrewu bêpê, xoş xû bêten

*Fî zîqet eşbahina saret yehwa erwahina
La yefteriq ecnahina kelteyir yeşwa lilweten
Xozgem bewey sewdayîye, serxoşî şîn û şayîye
Pîr û şêx û Wefayîye sakin salêk le her weten
Ya sah fenzor halek min malek mima leke
Tqwa û êla u êlek û ebî leke minel 'eden*

Wefayî:178

3.3.2.3.12. Cihguherîn (Eks)

Pêk tê ji vê derbirîna ku tu beşekê pêş bixî û piştî vergerînî, bi awayekî ku ya te pêş xistîye, paş bixî û ya ku te paş xistîye pêş bixî, bi vê wateyê ku ew peyv û girê û hevokên ku di goteyekê de rîz dibin, di nava wan de, yên ku di destpêkê de hatin e bixî paş û yên ku li paş hatine bixî destpêkê de û tenê cihguherînê bi wan bikî. (Îdrîs Abdulla, 2011: 305-306). Wefayî dibêje:

Melên: Bulbul menalêne kewa gul gulşeni çol kird

Dil aramî nema çi bika? ke aramî dilan royî

Wefayî:334

Helbestkar di vê helbestê de hunera cihguherînê peyrew kirîye, bi awayekî ku guherîn li pey hatina peyvan kirîye, di misre`a yekem de peyva “dil” a pêş peyva “Aram” xistîye, lê bo cara duyem hatîye vergerînkirîye û peyva “aram” a pêş peyva “Dil” xistîye.

((Bê çeşm eşkbarem 'eks ruy û muyê canan bîn))

Şew û roj roj û şewherdû lenêw eqdî sureyyada

Wefayî:28

Herweha helbestkar di vê helbestê de hunera cihguherînê peyrew kirîye û bi awayekî ku guherîn li şûna hatina peyvan kirîye û di misre`a yekem de peyva “Şew” xistîye berî peyva “Roj”, bo cara duyem hatîye û vergerandinkirîye û peyva “Roj” xistîye berî peyva “Şew”.

3.3.2.3.13. Bibîranîn/Têlnîşan (Telmîh)

Eva jî yekek din e ji hunerên ciwankarêyê û “pêk tê ji amajekirina bi ayeteke Qurana pîroz, yan fermûdeyekê, yan şîreteke pêşînan yan bûyereke dîrokî...hwd” (Îdrîs Abdulla, 2012: 137). Wate helbestkar di nava helbesta xwe de îşareyê dike bi ayat yan fermûdeyekê, yan pend û şîreteke pêşînan, bûyereke dîrokî yan her tişteyê

din, bêy vê ku li ser îşareyê bisekine û rohnkirinê li ser bide, belkî her bi vê bilezîya ku bi ser re derbaz dibe, îşare pê kirîye.

Mînak:

Uleyman xatimî win bû le qudret mawe neyfermû

Sibila sexrey be awdAdem bila asec le deryakem

Wefayî:148

Di vir de helbestkar îşareyê bi nave hezretê Silêman kirîye, ku eva neqîma gustîlka wê lê winda bûye, ezê sexerî cînî be av didem û seffî wezîrim bixene awewe, belkî nek karesatey be ezmûnî xuda zanîwe, lewra em dêre telmîheye ya çîroka hezretê Silêman û giroftarbûna wê bi dest dêwan.

Be mînhacî xelîlî heq, be mî'racî rsul allh

Debêher bêtecê emr û îradey heq tealakem

Wefayî:150

Îşare bi heqê te`ala kirîye û telmîhe ye bi ayeta(5) ya sureta el- Qeses: { وَتُرِيدُ أَنْ تَمُنَّ عَلَى الَّذِينَ اسْتُضِعُوا فِي الْأَرْضِ وَتَجْعَلُهُمْ أُتْمَةً وَتَجْعَلَهُمُ الْوَارِثِينَ }.

3.3.2.3.14. Rohnvekirin- Şîrovekirin (Tefsîr)

“Ew e ku huner yan nivîser pêştir qiseyekê bike, yan bas ji tiştekekê bike, îca piştî qiseyê zelal bike û lêk bide û ji xwîner re eşkere bike”(Îdrîs Abdulla, 1957: 105). Wate êhelbestkar yan nivîskar piştî vê ku bas ji mijareke dîyarîkirî dike, bo têngihîştina xwîner her bixwe pirsyaran dike û piştî her bixwe jî bersiv did. Wefayî dibêje:

Îşarem kirde zulfî rû be ebro bo çîye ?fermûy:

Be qîblem no musulmanêke zengî zadeyî rûme

Wefayî:247

Di vê beytê de helbestkar rû li yar kirîye û daxwaza ronkirinê jê kirîye û dipirse: Çima kezîyên wê ketine ser birêyên wê de? Her bi xwe jî bersiva yara xwe raxistîye ber çawan ku kezîyên yar rengê nû ê misilmanbûnê ye û xelkê Romê ye, lewra rû li birêyên yar kirîye, jiber ku dixwaze ku îbadeta xwe di mîhraba birêyên yar de bike.

Çawekant serxuşn, qurban kutm: mayl be çîn?

Eksî zulfî xste ser herfî mudewwer yanî: Dem

Wefayî:1156

Herweha helbestkar di vê beytê de ku daxwaza rohnkirinê lê kirîye ku çavên wê wekî çî ne, lê bixwe jî her bersiv dide ku kezîyên ser rûmetên wê, ew yek nîşan dan ku ew herfa xir wate “dev” ê yar, rengê herfa mudewer dide.



ENCAM

Lêkolînerên li ser wêjeya sebkên wêjeya Farsî, bi giştî wek çar qonaxên serekî dabeş kirine. Ewan jî sebka Xorasanî, Iraqê, Hîndî û sebk Qonaxa Guhaztinên pêk tê. Her yek ji van sekban jî bi awayekî dibin temamkerê sebkê berî xwe ku helbest û wêjeya Farsî li ser hatîye avakirin. Bi vî hawî helbestkarên navdeng ên helbest û wêjeya Farsî jî peyrewîya yek ji van sekban an yek ji sebka van qonaxan kirine. Bi vî hawî helbestkarên klasîk ên Kurd jî bi liberçavgirtina sîma û taybetmendiyên van sekban û di bin bandora edebîyata Fars û helbestkarên navdeng ên berî xwe de avêtina ber stara van sekban de. Di nav wan helbestkaran de jî Wefayî di bin bandora helbestkarên Fars û cih û war û erdnigarêyê de de karîye yek lûtkeya herî bilind a helbestkaran be û ew ezmûna helbesta kurmancîya jêrîn biguhêzîne Mukrîyanê. Bi vê jî Wefayî dibe şagird û nûnerê dibistana Nalî li Mukrîyanê, karîye li wir dibistana helbesta Mukrîyan damezrîne û bibe serdesteyê helbestkarên vê dibistanê, bi vê jî peywerîya sîma û taybetmendiyên sebka Iraqê bike.

Sebka Iraqê bi şeweyekî giştî ji sê taybetmendiyên herî girîng pêk tê ku taybetmendiyên “ziman, hizir û edebî” ne, xislet û sîmaya herî zimanê bikaranîna zimanekî têkilhev ji peyv û Farsî, ‘Erebî û Tirkî ye. Taybetmendiyê her berbiçav ê zimanê sebkê Iraqê ku şa’irên wê qonaxê bi nirixdayîn li wan nihêrtine zêdetir pişt a xwe bikaranîna zimanekî têkilhev girê dane û peyvên Farsî û ‘Erebî û Tirkî bikar anîne ku ew bi xwe têkilhevîyek a xelkê Îrana ‘Ecem bû bi ‘Ereban re. Di pişt giringîdayîna zanistan û bikaranîna têngînên zanistî û zanistên îslamîyan vê karanîna bêje û peyvên bîyanîyan jî bandoreke rasterast li ser şa’irên Kurd kirîye. Di bin vê ronîyê de jî şa’ir Wefayî jî bi şopandina van sîma û taybetmendiyên zimanî yê sebka Iraqê ve.

Helbestkar Wefayî jî bi peyrewîya vê sîma û taybetmendîya zimanî re, be rêjeyekî zêde peyv û bêjeyên bîyanî yên weke ‘Erebî û Farsî bikar anîye. Tew bi bikaranîna vî zimanê têkilhev re ji çarçoveya peyv û destebêjêyên ‘Erebî û Farsî jî derketîye heta giştîyê wê deverê ku helbestkar çend helbestên wî bi zimanî ‘Erebî jî hebin û tevî gelek xezelên bi zimanî Farsî ku wek (107)parçe şî’ir binîne. Ev tişt bi berawirdîya bi zimanî Tirkî re tişteke wisa dernakeve. Herweha tevî vê jî, Wefayî di pişt giringîdayîna zimanekî têkilhev ji bêjên bîyanî, giringîyekî zêde daye têngînên

zanistî û têngînên îrfanî û soffigerîyan û zanistê îslamîyan. Vê jî wisa kirîye ku Wefayî zêdetir nêzî sebka Iraqê bibe, ne ku sebkên din.

Her çî yê alîyê fikra sebka Iraqê ye, ew berawird bi qonaxa berî xwe guherîn bi ser de hatîye. Babeta berbiçav a nav helbesta wê qonaxê encama wê rewşa tevlihev ku civaka Îranê ketîye navde. Di vê qonaxê de derwêşgeh û medreseyan zêde dibin û tesawif û îrfan dibin babeta herî girîng a nav komên civatê de. Bêhêviy girîngîdana kesetîyê û vegeyîyana nav dilê xwe qîmêt tê dayîn. Di pişt vê de jî babeta eşq û pevgihiştinê û meqamên me'sûq û gelek babetên din di çarçoveya babeta eşqê de diçe û tê û dibin babeta herî berbiçav nav helbesta wê qonaxê de. Ev babet gişt di encama komek faktorê hatine spartin derketine holê; ku derveyî daxwaz û îradeya gel derketîye. Bi vî hawî sîmayên fikrî yê helbesta vê qonaxê bandor netenê li ser deverê bi giştî li ser tevahîya welatên der û ber û bi taybet li ser helbest û wêjaya Kurdî çêkirîye. Rengvedana vê bandorê rasterast di helbesta Wefayî de bi awayekî eşkere derdikeve holê. Beşa herî zêde ya xezelên Wefayî li dora naveroka îrfanî û soffigerî de dizivire, bi awayekî ku babeta eşq û wîsal û hîcran û bilindbûna ast û meqamê me'sûq, babeta herî berbiçav a nav helbestên Wefayî de ne. Di heman demê de siruşıtiya wîjdanî û xemgînî di nav piranîya helbestên Wefayî de bi babetên din re xuya dikin. Tevî van jî Wefayî babetên curbicur jî di nav xezelên xwe de karîye bicih bike.

Li ser sîma û taybetmendîyên wêjeya vê serdemê jî ev ji me re zelal dibe ku qalibê berbiçav ê helbesta wê qonaxê de xezele, helbestkar bi hêzekî pir xurt hewl dane di xezelên xwe de baş rêzbandê bikar bînin û di helbestên xwe de balê bikişînin ser şopandina bikaranîna hunerî nû yê rewanbêjîyê. Ji ber hindê Wefayî tekane helbestkarê serdema xwe ye ku karîye dahanên nû di helbestên xwe de pêk bîne. Bi wê jî girîngîyeke zede daye hunerên rewanbêjî û peyrewîya gelek hunerên din bike ku berê di helbestên helbestkarê Îranî de nehatibin dîtin. Vê jî wisa kirîye ku Wefayî bibe serdesteyê helbestkarên herêma Mukrîyanê. Tevî vê jî Wefayî wek hevşeweya helbestkarên sebka Iraqê karîye fikra xwe di piranîya helbestên xwe de vebêje û bi vê rêyê wek mamosteyê ahenga muzîk were naskirin. Wefayî di pişt girîngdayîna hunerên rewanbêjî de karîye nasnava helbesta xwe di beyta dawîyê de yan ya berî dawîyê de bikar bîne. Bikaranîna hunerên curbicur piştî serwa jî yek ji taybetmendîyên xezela sebka Iraqê ne.

Wefayî jî yekemîn şa'irê de vera Mukrîyan e ku çendîn berhem û nivîsên wî hene û karîye bi du zimanê wek 'Erebî û Farsî hûnanên xwe binivîse. Ku dikare xezelên xwe di du nerînan da wek eşqa heqîqî û mecazî ve lê were meyzandin û helbestê xwe li dora lava ji Xwedê û pêxemeber û stayîşa pêxember û qencan û şêx û pîrên terîqet û helbestên soffigerî û îrfanî dizivirîne. Ji ber wê wek helbestkarê dildarêyê tê naskirin. Tevî wê jî Wefayî di hunera helbesta “pêncîn, tercî', telmî' û tesmî't” de xwedî roleke pêşeng e. Bi dahênana hebestên xwe ve wisa kirîye di lûtkeya pêşengîya helbestkarên dibistanan Mukrîyan de be. Ji ber ku dahênana helbestan û ew hunerê rewanbêjîya ku Wefayî dest avêtîyê di helbestkarên berî wî de naxwîyên. Tevî vê jî Wefayî yekem helbestkarê Mukrîyan e ku karîye xwe li milê û navdengîya Nalî bide û xezelên wî têkilî pênc xişeyên xwe bike, hêz û behreyên xwe bi hebestvanên navdeng ên Fars qîyas bike. Di pişt vê de herweha murîdekî serhişk ê Ebdulahê Nehrî ye û heyamekî dirêj di derwêşgeha şêx û li cem şêx dimîne û çendîn helbest li ser şêx û dûrîya ji şêx hûnandine. Di dawîya temenê xwe de wexta ku diçe ferza xwe ya hecê pêk bîne di beyabanên (çolên) Hîcazê de koça dawî dike û her li wir dispêrin axê.

ÇAVKANÎ

- Arî Subhî Ehmed (Sal Nîne). *Xezel û Qesîdekanî Hacî Qadrî Koyî Lejêr Tîşkî Lékollîneweda*, Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.
- Aryana Îbrahîm Ehmed (2010). *Şêwaze Edebiyekanî Rojnamey Xebat (2003 2006)*, Hewlêr: Name, Zankoy Selahedîn, Kolêjî Ziman.
- Bîr Cîru, Munezîr 'Eyaşî (1994). *el-Uslub wel-Uslubîyet*, Beyrut: el-Merkez el-Qewmî.
- Derya Cemal Hewêzî (2009). *Wêney Rûnbêjî Le Komelle Helbestî (Şehîd Be Tenya Pîyase Dekatî) Qubadî Celîl Zade Da*, Silêmanî: Çapxaney Kemal, Çapî Yekem.
- Dilşad 'Elî (1998). *Binyatî Helbest Le Honrawey Kurdî Da*, Silêmanî: Çapxaney Renc, Çapî Yekem.
- Ebdulla Xidir Mewlud (2010). *'Erûz Ya Kêşnasî*, Hewlêr: Çapxaney Pak, Çapî Yekem.
- Ebdurrehman Bîlaf Berezncî (2019). *Şêxî Sen'an Le Deqewe Bo Tesewif*, Hewlêr: Çap û Bilawkirawekanî Nawendî Fêrbûn, Çapî Yekem.
- Ebdurrehman Şerefkendî (Hejar Mukiryani), (1391). *Ferengî Kurdî Hembane Borîne*, Tehran: Çapxaney Sîruş Lîtugrafî, Çapî Heştem.
- Ebdurrezaq Bîmar (1992). *Kêş û Mosîqay Helebestî Kurdî*, Bexdad: Çapxaney Dar Elhuriyet, Çapî Yekem.
- Elaedîn Seccadî (1952). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bexdad: Çapxaney Me'arif, Çapî Yekem.
- Erbelî Rezayî (1382). *Wajegan Tewsîfî Edebiyatî Îngilîzî - Farsî*, Tehran: Ferhengî Me'aeyir.
- Eristo (2004). *Hunerî Helbestî û Helbestî Nasî*, (Wergêranî: Ezîz Gerdî), Silêmanî: Dezgay Çap û Pexşî Rênma, Çapî Yekem.
- Erselan Bayz (2003). *Sîmay Helbestî Kurdî Dway Raperîn (1992- 2002) Be Nimûne Helbestekanî Rojnamey Xebat Kurdistanî Nwê*, Silêmanî: Çapxaneydezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapî Yekem.

- 'Ezîz 'Ebdulla Ehmed Gerdî (1994). *Kêşî Helbestî Klasîkî Kurdî Be Berawirdkirdinî Legel 'Eruzî 'Erebî û Kêşî Helbestî Farsî*, Hewlêr: Master Name, Kolêjî Adab, Zankoy Selahadîn.
- 'Ezîz Gerdî (1972). *Rewanbêjî Le Edebî Kurdî Da*, Bergî Yekem (Rûnbêjî), Bexdad: Çapxaney Dar Elcahiz, Çapî Yekem.
- 'Ezîz Gerdî (1975). *Rewanbêjî Le Edebî Kurdî Da*, Bergî Duwem (Ciwankarî), Hewlêr: Çapxaney Şarewanî, Çapî Yekem.
- 'Ezîz Gerdî (1979). *Rewanbêjî Le Edebî Kurdî Da*, Silêmanî: Çapxaney Kakey Felah, Çapî Yekem, Bergî Sêyem.
- 'Ezîz Gerdî (2014). *Kêşnasî Kurdî*, Hewlêr: Çapxaney Narîn Bo Çap û Belawkirdinewe, Çapî Yekem.
- Fazil Nîzameddîn (2017). *Ferengî Şîrîn*, Silêmanî: Çapxaney Şivan, Çapî Çarem.
- Gewhir Rostemî Nejad (1388). “*Meqayese Mî û Me'suq Der Sebka Xorasanî û Iraqî*”, Şapurxast: Xermî Abad.
- Gîw Mukiryânî (1999). *Ferengî Kurdistan*, Hewlêr: Dezgay Aras, Çapî Yekem.
- Gîw Mukiryânî (2012). *Ferengî Mehabad*, Hewlêr: Dezgay Aras, Çapî Duwem.
- Heme Nurî 'Umer Kakî (2012). *Şêwazî Helbestî Nwêy Kurdî, Kirmancî Nawerrast (1920- 1970)*, Silêmanî : Çapxaney Rûn, Çapî Yekem.
- Hîwa Nuraldîn 'Ezîz (2016). *'Erûz Nasî Helbestî Klasîkî Kurdî*, Hewlêr: Pertûkxaney Soran Bo Çap û Belawkirdinewe, Çapî Yekem.
- Hisên Aqa Hisenî, 'Ebas Nîk Bext, 'Ilmî Pejoheşî (1390). “*Cayeganê Îstî'are Der Xezlê Sebka Iraqî*”, *Neşrîye Edeb û Ziban*, Danîşkedeye Edebiyat û 'Ûlum Însanî, Danîşgahe Şehîd Bahunur Kirman, Dewreyê Cedîd, Jimare 30.
- Îbrahîm Ehmed Şiwan (2001). *Sofîgerî (Helbestî Aynî û Sofîgerî Le Helbeste Kurdîyekanî Mehuyda)*, Hewlêr: Çapxaney Wezaretî Perwerde, Çapî Duwem.
- Îbrahîm Ehmed Şiwan (2010). *Ferhengî Sofîyaney Dîwanî Cezîrî û Mehwî*, Hewlêr: Çapxaney Hacî Haşim, Çapî Yekem.
- Îdrîs 'Ebdulla (2013). *Şêwazgerî Ladan*, Silêmanî: Çapxaney Lerya, Çapî Yekem.

- Îdrîs 'Ebdulla (2011). *Layene Rewanbêjîyekan Le Helbestî Klasîkî Kurdî Da, Be Nmûne Himdî û Hacî Qadrî Koyî*, Hewlêr: Çapxaney Hacî Haşm, Çapî Yekem.
- Îdrîs 'Ebdulla (2012). *Ciwankarî Helbestî Nwêy Kurdî*, Hewlêr: Çapxaney Hêvî, Çapî Yekem.
- Îdrîs 'Ebdulla (2012). *Şêwaz*, Hewlêr: Çapxaney Minare, Çapî Yekem.
- Kazim Şêx Husên (2018). *Ciwanînasî Îrfanî Le Helbestekanî Şêx Nûreddînî Birîfkanî Da*, Silêmanî: Çapxaney Kenc, Çapî Yekem.
- Kerîm Şareza (1984). *Nalî û Zimanî Edebî Yekgirtûy Kurdî*, Bexdad: Lêkolînewe.
- Marûf Xeznedar (1984). *Le Babet Mêjûy Edebî Kurdîyewe*, Bexdad: Çapxaney Dar el-Muesese el-Iraqîye We el-Tabî'et, Çapî Yekem.
- Marûf Xeznedar (2010). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Hewlêr: Çapxaney Dezgay Aras, Çapî Duyem, Bergî Çarem.
- Mela Abdulkerîm Muderîs (1991). *Bedî' û 'Erûzî Namî*, Bexdad: Çapxaney Dar el-Cahîz, Çapî Yekem.
- Mela Ebdulla Zêwer (1985). *Gencîney Merdan*, (Amadekar: Mela 'Ebdulkerîm Muderîs), Bexdad: Çapxaney Edîb, Çapî Yekem.
- Mela 'Ebdulkerîm Muderîs (1983). *Yadî Merdan*, Bexdad: Çapxaney Korî Zanyarî Kurd, Çapî Yekem, Bergî Duwem.
- Meryem Zîbayî Nejad, Necef Cukar (1387). “Negrîşî Ber Tehuyl Bunyadî Te'bîrat û Yêtlahatî Îst'arî (Sebk Xorasanî Be Sebk Iraqî)”, *Neşîrye 'Ûlumî Pejoheşî Guhir Guya*, Salê Dûyem, Jimare 7.
- Mihemed 'Elî Qeredaxî (1984). *Dîwanî Wefayî*, Bexdad: Çapxaney Dar el-Huriyet, Çapî Duwem.
- Mihemed Heme Baqî (2010). *Bîrewerêyekanî Wefayî (Tuhfetylmirîdîn)*, Silêmanî: Belawkirawey Bingehî Kurdolojî, Çapî Yekem.
- Mihemed Se'îd Necar (Aso) (1389). *Dîwanî Wefayî*, Sine: Çapxaney Kurdistan, Çapî Sêyemîn.

- Mihemed Xula Merzayî (1391). *Sebkişnasî Helbestî Parsî Ez Rudekî Ta Şamîlu*, Tihiran: Neşrî Camî, Çapî Çarem.
- Mihemedemîn Mîsrî (1344). *Dîwanî Wefayî Mehabadî*, Mehabad: Întişaratî Seydayan, Çapî Duyem.
- Mistefa Seyid Mîne (2007). *Payey Wefayî Lenaw Şa'îranî Sedey Nozdehemî Kirmancîy Xwarû Da*, Hewlêr: Nusîngey Tefsîr Bo Belawkirdinewew Rageyandin, Çapî Yekem.
- Muhsîn Ehmed Mistefa Gerdî (2003). *Beharî Rewanbêjî (Watanasî Rûnbêjî Ciwankarî)*, Hewlêr: Çapxaney Narîn, Çapî Yekem.
- Nûrî Fars Heme Xan (2004). *'Erûzî Kurdî*, Hewlêr: Çapxaney Dezgay Aras, Çapî Yekem.
- Perêz Êabîr (2005). *Rexney Edebî Kurdî û Meselekanî Niwêkirdinewey Helbest*, Hewlêr: Dezgay Çap û Belawkirdinewey Aras, Çapî Yekem.
- Pexşan 'Elî Ehmed (2009). *Şêwazî Helbestî Goran*, Silêmanî: Çapxaney Renc, Çapî Yekem.
- Rêhan Resul Ehmed (2017). *Şîwazî Helbestî Herîq*, Soran: Master Name, Zankoy Soran, Kolêjî Adab.
- Rizgar 'Ebdulla Ehmed (2015). *Renganewey Taybetmendîyekanî Sebka Iraqê Le Helbestekanî Safî Da*, Soran: Master Name, Fakeltî Adab Zankoy Soran.
- Se'di Faruq Îwsif Şêx Bizênî (2011). *Binyatî Hunerî Le Helbestî Ehmed Muxtar Begî Caf Da*, Hewlêr: Çapxaney Roşnibîr, Çapî Yekem.
- Selîm Reşîd (2012). *Şêwaz Le Kurte Çîrokî Kurdî Da*, Hewlêr: Çapxaney Rojhelat, Çapî Yekem.
- Serdar Ehmed Hesên Gerdî (2002). *Binyatî Wênay Hunerî Le Helbestî Kurdî Da*, Silêmanî: Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapî Yekem.
- Serdar Ehmed Hesên Gerdî (2004). *Bînatî Wênay Hunerî Le Helbestî Kurdîda (1970-1991)*, Silêmanî: Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Çapî Yekem.
- Sîma Dad, (1387). *Ferheng û Îstîlahatî Edebî*, Tehran: Merwarîd, Çapî Çarem.

- Sîrus Şemîsa (1378). *Kulliyatî Sebkişnasî*, Tehran: Merawrîd, Çapî Duhem.
- Sîrus Şemîsa (1382). *Sebişnasî Helbest*, Tehran: Çapxane Ramîn, Çapî Nehem.
- Sîrwan Cebar Emîn (2014). “Rengdanewey Sebka Iraqê Le Helbestekanî Mehwi Da”, *Govarî Ekadîmyay Kurdî*, Hewlêr: Çapxaney Hacî Haşim, Jimare 30.
- Şe'ban Şe'ban Ehmed (2002). *Şêwazî Helbestî Cezîrî*, Hewlêr: Master Name, Zankoy Selahedin, Kolêjî Adab.
- Şêx Emîn Şêx 'Elaeddîn Neqîşbendî (2015). *Tesewuf Çîye*, Silêmanî: Çapxaney Çarçira, Çapî Sêyem.
- Şîyaw Reşîd Ebubekir (2008). *Şîwaz Le Romanî (Dwahemîn Henarî Dunya) Îbextiyar 'Elîda*, Hewlêr: Master Name, Kolêjî Ziman, Zankoy Selahedin.
- Umêd Aşina (2009). *Pîremêrd û Pêdaçûneweyekî Jiyan û Berxemekanî*, Hewlêr: Dezgay Çap û Belawkirawey Aras, Çapî Duwem, Bergî Yekem.
- 'Usman Deştî (2009). *Helbestî Nawçey Mukiryay*, Silêmanî: Çapxaney Renc, Çapî Yekem.
- 'Usman Deştî (2013). *Ezmûnî Helbestî Mukiryay û Şiwênî Le Mêjûy Edebî Kurdî Da (Nîwey Duwemî Sedey 19 û 20)*, Hewlêr: Çapxaney Hacî Haşim, Çapî Yekem.
- 'Usman Deştî (2019). *Dîwanî Wefayî*, Sine: Întîşaratî Kurdistan, Çapî Duwem.
- Xelîl Îbrahîm Mistefa (2009). *Helbestyetî Deq Benmûne Helbeste Kurdîyekanî (Mehwî)*, Hewlêr: Mastername, Kolêjî Ziman, Zankoy Selahedin.
- Yasîn Nadir (2019). *Çemkêk Le Îrfanî Mewlanay Rûmî*, Silêmanî: Çapxaney Kenc, Çapî Yekem.
- Zeyneb Celîl Xelîl (2011). *Rengdanewey Sebka Iraqî û Hîndî Le Helbestekanî Nalî Da*, Hewlêr: Mastername, Zankoy Selahedin, Kolêjî Ziman.



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



09/09/2019

Tez Başlığı / Konusu

**DI XEZELÊN WEFAYÎ YÊN KURDÎ DE RENGVEDANA
TAYBETMENDÎYÊN SEBKA IRAQÎ**

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 112 sayfalık kısmına ilişkin, 09/09/2019 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından % 1 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % 1 (Yüzde Yedi) dir.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

09/09/2019

Ameer Nasih AHMED
Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı : Ameer Nasih AHMED
Öğrenci No :17950001007
Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Programı : Örgün Eğitim
Statüsü : Y. Lisans Doktora

DANIŞMAN
Doç. Dr. Kemal EROL

09/09/2019

ENSTİTÜ ONA N
UYGUNDUR

09/09/2019

Doç. Dr. Nesrin SONMEZ
Anabilim Dalı Başkanı

